

DENG

AYLIK SİYASAL VE KÜLTÜREL DERGİ

İçindekiler

Naverok

Kemal Burkey

2-6

Li Ser Xebat û Ifyana Cegerxwîn

Eskerê Boyik

7-25

Çend Fikir Li Dor Helbestvanîya Cegerxwîn ya Welatparêzîyê

Cankurd

26-35

Welat li ha Cegerxwîn

Mehmet Eren

36-38

Cegerxwîn Li Diyarbekirê Hîşyar Bû

Arjen Arî

39

Ez Şagirtê Te Me

Rejep Dildar

40

Cegerxwîn Kirine Tenekeye Vela

Serkeft Botan

40

Ew ji bo Kurdan ferhengokek e

A. kadir Çaxer

41

"Xwedê wî ji dergavê xwe avêt"

Yucel Daxtekîn

41

Nasandina Cegerxwîn ne hes e

Mahmûd Çetin

42

Rola Weşanên Dengê...

Songul Keskin

42

Cegerxwîn bûye Sembolêk

Haluk Ozturk

43-44

Çapkirina berhemên Cegerxwîn û Weşanên Roja Nû

Ji Pêşgotinên Pirtûkên Wî...

45-71

Evin Turizm İnşaat ve Yayıncılık
Ticaret Limited Şirketi Adına Sahibi
Sorumlu Yazı İşleri Müdürü
Hukuk Müşaviri

Zozan Sezen
Memet Aslan
Av. Erhan Aslaner

Yazışma Adresi

Tarlabaşı Cad. No: 95 Kat: 1 Beyoğlu - İstanbul

Tel: 0 (212) 292 66 26 / 292 66 27

Fax: 0 (212) 292 66 35

Avrupa

Postfach: 131831, 42045 Wuppertal/Almanya


Tel: 0049 202 283 23 39

Fax: 0049 202 758 34 79

Baskı: Yön Matbaası

ISSN: 1302-7964

Li Ser Xebat û Jiyana Cîgerxwîn




• **Kemal Burkay**

Ev nivîs di sala 1984 da, piştî murîna Cîgerxwîn hatîye nivîsandin û di Organa Partîya Sosyalîst "Rîya Azadî", hejmar 30 da derketîye.

Seydayê Cîgerxwîn di 22'yê Çarîya Pêşîn da emrê xwe temam kir. Ew merivê jîrek, bawermend, dilgerm ji jîyanê weda kir. Lê mirov nikare bêje Cîgerxwîn mirîye. Ew bi laşê xwe vegerîya axê, lê bi şîerên xwe, bi bîr û bawerî û têkoşîna xwe di dilê gelê Kurd da, di xebat, dîrok û çanda gelê Kurd da wê her bijî. Cîgerxwîn bi xebat û efrandinên xwe zora mirinê biribû, merivên wek Cîgerxwîn nemir in.

Divê em bi dû Cîgerxwîn şînê nekin. Wî emrê xwe vala derbaz ne kir; wî çî ji dest hat kir, karê xwe pêk anî û di emre-kî kamil da çû. Divê em bi wî serbilind bin; qîmeta wî, mezinahîya wî baş biza-nibin û ew bibe rêberek baş di jîyan û têkoşîna me da nah şunda jî.

Hin Rûçikên (wefên) Seydayê Cîgerxwîn



Mezinahîya Cîgerxwîn ji çi pêk tê? Gelek rûçikên mirovî yên bilind di şexsê Seyda da kom bûbûn: Wek jîrekî, fidakarî, bawermendî, nefspîçûkî.

Seyda jîrek bû. Wî emrê xwe yê 81 salan bi xebat û têkoşîn derbaz kir. Heya roja mirinê dev ji kar berneda. Heya roja mirinê jî nivîsand, qise kir, ji der û dora xwe ra, ji hêzên welatparêz û şoreşger ra rê nîşan da. Ew di rojên dawî da jî di civînan da, di meşan da bi me ra bû. Ew bi kar û xebat şa dibû, serfiraz dibû.

Seyda merivek fidakar bû. Wî jîyana xwe, kar û xebata xwe da bo rizgarîya gel û welat, da bo rizgarîya bindestan. Tucar ji vê poşman ne bû.

Seyda merivekî bawermend bû. Di emrê xwe da şikestina gelek serhildanên Kurd dît. Gelek kesan di nivê re da dev ji kar berdan. Wî di dîroka gelê me da wek mêrxwaşî û berxwedanê, nimûneyên sistîyê, bêqîretîyê û îxanetê jî gelek dît. Wî ji dijmin gelek teda û zordestî dît; gelek caran hat girtin, malbata wî gelek feqîrî û cefa kişand. Kevneperestên Kurd jî pircaran ew êşandin. Dîgel vê hin caran, merivên ku Seyda bo wan şer dikir, bindestan jî guh ne dida gotinên wî, tê ne digîhîştin. Lê bawermendîya Seyda bi van tiştan ne şikîya, dilê wî tucar sar ne bû. Wî dev ji şer berneda, di rîya xwe da ajot.

Çima hin kes şer nivçe dihêlin? Çima hin kes di nivê rê da diwestin, dev ji xebata welatparêzî û şoreşgerî berdin û heya dawî nameşin? Sedem ev e ku, ew kes, himber êrîşên dijmin di-yax nakin, himber teda û zehmetan sist dibin. Sedemek dinê jî ev e ku, ew kes ne xwedî bîr û bawerîyek xurt in. Qanûnên civakî baş nizanin. Waxta dijmin li wan zor dike, waxta serhildanên gel dişkên, bê hêvî dibin.

Lê merivên ku dîrokê û qanûnên civakî baş dizanin hêvîya xwe winda nakin. Ew dizanin ku zordestî ne bê dawî

ye. Duweroj, bibê nebê ya bindestan e.

Seydayê Cîgerxwîn çawa dîroka gelên dinê û ya gelê Kurd baş dizanibû, her usa jî felsefa materyalîzma dîrokî baş tê gihîştibû. Bawerîya wî bi sosyalîzma ilmî hebû. Hosteyên materyalîzma dîrokî êşkere kirin ku her tişt diguhure û ber bi nujenîyê diçe. Duweroja însanîyetê ya karkeran e, ya bindestan e. Piştî sazûmana sermîyandarî sosyalîzm wê bê û hemû insanan rizgar bike, zordestî û zêrandinê yekcar rake.

Şoreşa Oktobrê li Rûsîya û şoreşên piştî wê ev yek ispat kirin.

Seydayê Cîgerxwîn nefspîçûk bû. Çawa xelk dibêje, mezinan ra mezin, piçûkan ra piçûk bû. Pozbilindî, quretî li ba tunebû. Ji her firsendê îstîfade dikir, bîr û bawerîyên xwe belav dikir, dixwest insanan bigihîne. Bona vê yekê jî insanan jê hez dikirin, jê ra hurmet dikirin.

Hin kes hene jîr in, jêhatî ne, lê pozbilind in. Pozbilindî merivan mezin nake, piçûk dike. Merivên han insanan, dostan, heval-hogiran li dora xwe nacivînin, lê direvînin.

Ew rûçikên han ku li Cîgerxwîn kom bûbûn, dibûn nîşanên mezinahîya wî. Tevgerên gelan hewcedarî merivên usa ne: merivên jîrek, fidakar, bawermend û nefspîçûk. Di rêyên dirêj û çetin da ew kesena dikarin rêberîya gel bikin.

Seyda Kurdekî Xas Bû

Seydayê Cîgerxwîn insanan me, rabûn û rûniştina gelê Kurd, adetên gel baş nas dikir. Di dema feqîtiyê da gund bi gund li Kurdistanê gerîya bû. Bona vê yekê baş têgihîştibû zmanê gel, gotin, kilam, çîrok û hemû dewlemendîya wê.

Her usa jî Seyda derheqa dîrok û edeba Kurdî da gelek xwendibû. Ew ji nivîskarên me yên kevn û hêja ra wek Elî Herîrî, Melayê Cîzîrî, Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî û yên din ra, ji merivên mezin wek Selahaddîn Eyûbî ra, qeremanên gel wem Rîstemê Zal û Guhderz ra xwedî derket, di şîerên xwe da cîyekî bilind da wan. Bona vê yekê şîerên

Seyda tesîreke baş kir li ser gelê me, bîr û bawerîyên welatparêzî xurt kir. Ew bi rîya şîerên Seyda bi dîrok û çanda xwe hişyar bû û serbilind bû. Propagandeya dijmin di derheqa dîrok û çanda me da şikîya, pûç bû.

Seyda Xwe Nuh Dikir û Pêşva Dibir

Seyda adet, zman, çand û dîroka gelê me çawa baş dizanibû û bi tiştên hêja ra çawa xwedî derdiket, her usa jî hin adetên kevn û pûç ku êdî bûbûn bendek li lingê gel û ne dihişt. Yn gelê me bi alîyê civakî pêşva biçe, di jî wan derdiket.

Olperestî di dest kevneperestan da bende-kî usa bû. Kolidarên ku gelê me bi bend kiribûn, mîr, axa û şêxên ku li ser pişt gel rûniştibûn û ew dizêrandin, ne dixwestin gel hişyar be, ne dixwestin karker û gundî çavê xwe vekin. Ewana ol (dîn) jî dikirin hevcarek ji bo xapandina gel. Ewana erd bi çoyê zorê, bi neheqî ji dest gundîyan girtibûn, lê digotin xwedê ev erd daye mîr û axan. Ewana xebatkar tazî dikirin, birçî dihiştin, lê digotin dewlemendî jî, xizanî jî bi destê xwedê ye.. Ewana hemû xirabîyên xwe nîşan didan wek karê xwedê.

Seyda dijî derewên wan derket. Wî bi camêrî perdê derewan çirand û rastî eşkere kir. Seyda rîya diristîyê, qencîyê, aşitîyê nîşan da.

*Mebe olperest ey hevalê delal
Bi herkes re rast û dirist be heval*

*Çi tiştên derew bin tu dîrî here
Were em bi hev re herin pêş, were!*

*Çi tiştê neqenc bî şerê wî bike
Heçî qenc e, herdem tu her wî bike*

*Nebe dostê xwar û peyayê neyar
Timî dost û yar be ji bo ê hejar.
(Zend-Avista, r.120)*

Seyda dijî zordestî û neheqîya li ser jinan bi xurtî derket. Wî nîşan da ku eger jinên Kurd jî wek mêran di karên civakî da cîyê xwe negrin, tevî karên siyasî nebin û bo azadîya gel û welat tevî

mêrê xwe şer nekin, hêza me nîv nîvê wê kêmbê.

Tesîra jinan li ser zarokan zêdetir e. Ew dikarin zarokan bielîmîn bo armancên baş û bilind, bo azadî û serfirazîya gel. Bona vê yekê divê ew jî hişyar bin, di nav xebatê da bin. Jina nezan pir caran dibe asteng li pêş mêrê xwe û karê wî jî sist dike.

Bona vê yekê, wezîfeyek gelek girîng e bo welatparêz û şoreşgerên Kurd ku ew bend û qeydên han ê şaş bişkînin, bi xwe pêşengî bikin, jinên Kurd bînin nav kar û barên civakî, tevgera siyasî.

*Jin û mêr bi hev re di nav kar de bin
Derê dewlemendî li me dê vebin*

*Qerêja hezar sal û kevneperist
Di fro ji bo me meke mal û rist
(Zend-Avista, r. 108)*

Cîgerxwîn berê xwe gihande bîr û bawerîyên welatparêzî, dijî dîlî û bindestîya gelê kurd derket û dengê welatparêzîyê bi xurtî bilind kir. Pir ne borî, Seyda xwe gihande bîr û bawerîyên sosyalîzmê. Seyda di jiyana xwe da gelek serhildanên Kurdan dîtin. Her usa jî wî di çaxê xwe da Şoreşa Oktobê ya Mezin û şoreşên dinê dîtin, piştî Şerê Duwemîn. Wî baş fêmkir ku rizgarîya netewî tişteki giranbuha ye, gelek hêja ye, lê ne bes e. Bi avakirina sosyalîzmê gel dikare ji bindestî û zêrandinê bi temamî xilas bibe, serfiraz be.

Seyda da ser şopa Marksî-Lenîniyê, bû şervanekî xurt bo rizgarîya karker û cotkaran.

Welatparêzî û Înternasyonalî

Di şîerên Seyda da welatparêzî û înternasyonalî, herdu jî bi xurtî xwe nîşan didin, bi hevra kelîyane.

Hin kes îro ji pêwendîya welatparêzî û înternasyonalîyê, pêwendîya şerê rizgarîyê û sosyalîzmê baş fêm nakin, evana ji hev dûr dibînin. Xasima kesên bûrjûwa, xudî sermîyan, kesên dewlemend ku dijî sosyalîzmê ne,

dîwarekî dikin navbera welatparêzî û sosyallîstîyê. Lê ji bo xebatkaran ne usa ye. Xebatkaren hişyar baş dizanin ku ev herdu bi hevra bi xurtî girêdayî ne. Ji bo rizgarîya welat û azadiya gel, divê şerê rizgarîyê bi serkeve, pêşva biçe, bi sazûmanek sosyallîstî temam bibe.

Kesên bûrjûwa û kevneperest gelan ji hevdu ra wek dijmin nîşan didin. Lê rastî ne usa ye. Dijminahî bi destê kolidaran, kevneperestan dikeve nav gelan. Bi rastî gel dostê hev in. Karker û cotkar ne dijminê hev in. Li çar alî dinê mafê wan yek e, dijminên wan li her derê axa û sermîyandar in, hukumetên wan ê zordest in. Divê karker û cotkar, divê hêzên pêşverû li çar alî dinê piştgirî û alîkariya hevdu bikin. Cîgerxwîn bi vê yekê gelek hişyar bû.

Cîgerxwîn hozanekî şoreşger bû. Dengê wî bû dengê şoreşê, dengê serhildanê. Her usa jî Cîgerxwîn mirovhiz (humanîst) û aşitîxwazek xurt bû.

Ew di şîerên xwe da gelek behsa şer dike. Behsa tîfing û topan, teqîna dinamêtê dike. Ev şerê rizgarîyê ye, heq e, hewce ye bo azadiya gel. Wekî din bend û qeydên kolidaran, nîrê zordestan nayê şikandin. Lê Cîgerxwîn her usa jî mirovhiz e, aşitîxwaz e. Ew di navbera gelan da, di navbera reşik û sipîyan da ferq nabîne. Dixwaze ew hemû azad bin û bi hevra wek xwîşk û bira bijîn.

*Ez xweş mirov im
Ne hîrç û hov im
Lê çibkim bê şer
Dijmin naçî der*

Cîgerxwîn Di Karê Sîyasî Da Gihîştî Bû

Yek ji wesfên Seydayê Cîgerxwîn ê hêja jî ew bû ku Seyda, di warê sîyasî da gihîştîbû. Ev yek dibe ku bala kêman kesa kişandibû. Seyda çawa xwe gihande bîr û bawerîyên welatparêzî, dest pê kir di karê komelawetî da cî girt.

Wî bi gelek salan di Partîya Demokrati Kurd li Sûrî da (Partîya Demokrat û Pêşverûyên Kurd li Sûrî) xebat kir. Seyda hozanekî bi nav û deng bû. Pir kesan jê ra digotin: "Seyda, hemû welatparêz ji te hez dikin, tu di partîyekê da nebî çêtir e..., Lê seyda guh ne da gotinên han. Wî baş dizanibû ku gelê me bi xebata sîyasî dikare zora dijmin bibe, bi serkeve. Bo xebata sîyasî jî partî hewce ye.

Seyda usûl û erkanên xebata sîyasî baş dizanibû, baş guh dida wan. Bi nav û dengê xwe tucar pozbilind ne bû. Eger raya wî cudabana jî, guh dida biryarên organên partîyê, di 80 salê xwe da jî bi tore û dîsîplîn kar dikir.

Seyda di gelek şîerên xwe da behsa girîngîya xebata sîyasî û rêxistinî dike. Di şîera xwe ya bi navê "Partîzanî,, da usa dibêje:

*Bibe partî û hem bibe partîzan
Eger serbilindî dixwazî, bizan*

*Nikarî bibî serbilind, navgiran
Heta ko di şer nehî wek beran
(Zend-Avîsta, r. 57)*

Cîgerxwîn Li Pêş Me Rêberê Hêja Ye

Merivên wek seydayê Cîgerxwîn di nav milletan da kêman dighên. Divê em qedr û qîmeta wî baş bizanibin. Ji jîyana wî, xebata wî, bawermendîya wî dersê bistînin. Em bawer in ku welatparêzên Kurd, şoreşgerên Kurd, nah şunda jî ji Cîgerxwîn gelek tiştan wê hînbîn, wî ji xwe ra bikin rêber di jîyan û xebata xwe da.

Seydayê mezin rojên azadiyê bi çavên xwe ne dît. Lê tucar hêvîya xwe winda

ne kir. Digot, eger ez nebînim jî zarokên min, nebîyên min wê bibînin. Wî di şer da para xwe bi xurtî bi cî anî. Dilê wî rehet bû û ew dikare di gora xwe da bê xem razê. Law û keçên Kurd doza wî wê bibin heya serî. Ewê kurdistanê rizgar kin, ber bi pêş bibin.

Û di vî şerî da Cîgerxwîn wê tim di dilê me da be, bi me ra be.

Em wî ji bîr nakin.


CÎGERXWÎN

*Cîgerxwîn, çinarê mezin,
Di erdeke hişk û hol da toveki xas
Dengê azadîyê
Bayê seherê ya hêvîyê
Dibe ku tu xwe wek mirîyekî
/ dibînî*

*Lê çiqas jîndar î,
/ bi jîyanê têr û tijî
Di ava çeman da, di
/ dengê bê da tu yî
Di têla tembûrê da, di
/ rengê gula sor da
Di her dileki bi êş
/ û şawat da
Di her kilameke
/ xemgîn da heyî
Li rûyê her kesekî
/ têkoşer, bi ken
/ û bextewar da*

Kemal BURKAY

Çend Fîkîr Li Dor Helbestvaniya Cegerxwîn ya Welatparêziyê



• Eskerê Boyîk

Bi bawariya min helbestvaniya *Cegerxwîn* ji **HEWAR**ai nav û deng dest pê dibe.

Kovara **HEWAR** rêça xwe, ya kûr û dûr di nav çanda gelê Kurd da hîşt û çiqas dem derbas dibe, ew rêç bêtir ferih û ronayî tê xanê. **HEWAR** bû medrese, bîngehek, rênîşek ji bo pêşxistin, dewlemendkirin û xwenaskirina mejûyê rewşembîriya Kurdî. Bû kanîyek, ji wan kanîyên çiyayên Kurdistanê, yên gur û avxweş, pirav û avzelal, ji kîjana çem û cew kişyan, bûn Erez, Dicle û Ferat, herikîn berbi warên welêtê perçekirî, ketin dilê her însanekî netewa Kurd. Li ser rîya gel, ya bi zemetê dijwar, ji bo xweparastin û xwenaskirinê bûn ruh, ronayî, kel û hêvî... Û niha jî, rewşembîrên Kurd bi ava wê kanîyê tîbûna xwe ya çandî, zanistî, ruhî dişkênin, jê hîn dibin û dema dikevin tengasiyên zanistîyê, ber bi **HEWARê** dibezin...

Wî halê Kurdistanê yê teng da, dema dagerkiran bi zulm û xezeva xwe, welatê Kurdan ji gelê Kurda ra kiribûn zindan, siyasîya tune kirin, kokbirkirinê dimeşandin, li ber çavê cihanê her dewlemendiyên gelê Kurd: dirok, ziman, çand, heta nav û heyîtya wî jî înkâr dikirin, **HEWAR** hate hewara gelê xwe...



Ji pey qewimandinên Sivêrê û Lozanê yên dîrokî ra, Kurd bi nemamî hatibûne xapandin. Welatê wan perçe – perçe bûbû, nerazîbûn û serhildanên Kurda li nav xûnê da hatibûn pelçiqandin, welat wêran kiribûn, xelk li nav tengasiyên aborî, civakî û bin nîrê neheqiya miletçiyên dagerkir da bûn. Kurdistan, xasîma ya Bakûr, li bin zulma kemalîzmê da bûbû cîyê girtin, sirgûnî, kuştin, rev - bez, xelayî û nexweşîyan.. Asîmîlekirin û ji holê rakirina gelê Kurd bûbû armanca dewleta Tirka ya sereke û eşkere...

Civaka Kurd jî yekrû nî bû. Li nav eşîr û qebîlên fêodal da yekîti, tifaq, hevgerî tune bû... Gel nexwendî, cahil, feqîr û şûndamayî bû. Piraniya zane, rewşembîr û dîndarên Kurda jî, çawa bi dewr û zemanê usa jî wê demê bi çand, ziman û ruhê dagerkiran hatibûne perwerdekirin û mîna wan difikirîn. Yên welatparêz, pêşewitî û pêşverû jî yan darda kiribûn, yan hebs û zindana da dizêryan yan revîyabûn xerîbîyê. Payê serekeşîr û dîndaran jî ji bo kara şexsî, malbetî xwe didan alîyê dagerkiran... Dagerkiran jî, ne bi tenê ruhî lê bi fîzîkî jî armancên ji holê rakirina gelê Kurd danîbûn pêşya xwe.

Welatparêz û pêşewitîyê netewa Kurd tê derdixistin, ku wê demê hêz, yekîti û qewata Kurda, ya anegor jî tune, ku pêşîya wê tofana neheq bigrin. Ronakbîrê mezin Mîr Celadê A. Bedirxan, digel birayê xwe Dr. Kamîran A. Bedirxan kovara xwe **HEWAR** va, mîna helbestvanê Kurdî mezin Ahmedê Xaniyî, rahîştinê pênûsê, bi rîya rewşembîrîyê, zanîstîyê sekinîn dijî wê zulma dagerkiran û gotin: “Em hene, Kurdistan heye, Kurdistan welatê me ye...Em in xweyê wî welatî, wê çandê, wî zimanî, dîrokê, miletîyê...” **HEWAR** bû zanîngeh, zîyareta Kurdewarî, ya heyîtiya gelê Kurd.

Kê li wê zanîngehê ra derbaz bû, ji kanîya wê, ya zanîstî av vexwer, kê li ber wê zîyareta Kurdbawerî bi zarê dayka xwe due’a kir, bûn sondxwarîyê parastina navê gelê xwe, bi bîr û bawariyê here bilind jiyana xwe pêşkêşî azadiya gel, welêt û pêşxistina çanda wê kirin. Bawerkî teva jî, xerîbîyê da,

tengasî, zor û zemetê jiyanê dîtin, hebsa û sirgûnîyê da zêryan, bextewariya şexsî jî para wan neket, lê tucar jî wê rîya pîroz derneketin: *Cegerxwîn, Osman Sebrî, Qadrîcan, Nûredîn Zaza, Qedrî Cemîl Paşa, Ehmed Namî, Hesên Hîşyar*... Navne qedirgiran û hizkirî li nav netewa Kurd da...


Gelo ev navdarên Kurd li dora Celadê Bedirxan necîvyana, jêra nebûna alîkar, **HEWARê** bibya ew xizna rengîn û zengîn? Yan ew rewşembîr mekteba **HEWARê** derbas nebûna, wê bigîhîştana wê zanestîyê, bawariyê, bilindayê, welatparêziyê û naskirinê? Dijwar e mirov wê bersîvê bide... Mîr Celadê Bedirxan mîna sêrbazkî bi şivka xwe ya qudretî ew ruh û ronayî, ew kel û agir tev gîhandin hev û mora xwe, ya heyîtiya gel li dîroka me, sed sala bîstan xist...

Dr. Nûredîn Zaza di derheqa Osman Sebrî da gotîye: Şagirtê zimanzan û ronakbîrê Kurd Mîr Celadet Bedirxan bû, li ber destên wî hînî zimanê nivîsandinê bû û ji ber zimanê axaftinê baş dizanî, zû jî hînî zimanê nivîsandinê bû. (Kovara PIRS, hej. 6. 1998)

Bi texmîna min evê fikirê mirov kare derheqa wan rewşembîran tev û usan jî di heqê *Cegerxwîn* da bêje.

Cegerxwîn yek ji wan sê helbestvanên Kurdê mezin bû, yên bi zaravê kurmançî dinivîsîn (ew, Osman Sebrî û Qadrîcan), ku ji **HEWARê** dest bi gavavîtinên xwe yê helbestvaniyê kirine û li nav edebîyeta gelê xwe da gîhîştin bilindaya neteweyê...

Cegerxwîn gelek helbestên xwe diyarî **HEWARê**, xweyê wê Mîr Celadê û hevalên xwe, yên wê demê kiriye, qîmetekî bilind daye karê wan. Ew **HEWARê** nav dike “gulîstana zarê me”, “bîstanekeî berxweş û zûgiha” û di helbesta Jî



HEWARÊ RA (Kitêb I, rû. 141) derheqa xweyê wê da wa dinivîse:

*Li ber wê heye baxçevanek mezin,
Şahişah û paşa ye ew xwendekar.*

*Serefîraz û comerd e ew baxçevan
Didî her kesî wî berê abidar.*

*Qelen kêr û erzane pêsed qirûş,
Bixwazin ji Alî Celadet bi xar.*

Helbesta **PÊNCİKA MÎN Û ZİBÊRÊ KURD** da (Kitêb I, rû. 162) derheqa Celadet Beg da wa dinivîse:

*Ey şehê alîcenab,
/ wey hakim û bextiyarê Kurd,
Wey Şerefîxanê cihan,
/ wey bîngê hewarê Kurd,
Kawîşê zêrînkulah,
/ wey Rîstemê serkarê Kurd,
Serwerê alîcenabê qewmê Kurd,
/ xemxwarê Kurd,
Baîşê fexrê gerohe mîletê xembarê Kurd.*

Kovar halekî aborîyê yê pir dijwar da di-hate weşandin. Helbestvan bang li gel dike ku kovara xwe xweyî derkevin:

*Hewar e hey hewar e, çîman wusan dinalî,
Seyd heyf û seyid mixabîn bê zîv û zêr û mal î...
(Kitêb I, rû. 144, ji helbesta **JÎ KÎRYARÊN HEWARÊ RE**).*

Her demê rewşenbîr û rewşenbîrîya Kurdî li nava halê aborîyî dijwar da karê xwe meşandine. dewlet tune bûye, gel kesîb, nezane û nexwende bûye. Yê hevî zane jî bi zîmanê cînara hatibûne perwerdekirin, kur-mancî nizanbûne... Hindik xweyî kovarê derneketine. Li wî halê dijwar da jî **HEWARÊ** bi rewşenbîrên dora xwe va, bi rêvabîrîna xweyê dûrbîn û zanyar va gelê Kurd ra bûne ronaya geşe heta hetê...

Cegerxwîn helbestine delal dîyarî herd helbestvan, hevkarên xwe yê **HEWARÊ Os-**

man SEBRÎ û Qederî CAN kiriye, qîmetekî heja daye helbestvaniya wan. Wan jî bi helbest û nivîsarên xwe da poêzya hevalê xwe bilind qîmet kirine

Ez dijî wan lêkolînvanan me, ku ji alîyê bilindaya helbestvaniyê da qîmetê mezîniyê didine ji wan yekî yan yê din. Her yek ji wan di warê xwe da, alîyên tebyetmendîyên xwe yê helbestvaniyê, bîr – bawerî, cûre, kûrayî, teqil û bi hêzbûna gotina xwe va helbestvanê cuda ne û dijwa re efrandinên wan himberî hev bê kirin. Lê tiştek eşkere heye û tu kes nikare înkare bike, ku nav û deng, berhemên *Cegerxwîn* zefîr li nav gelê Kurd da belabûyî û naskirî ne...


* * *

Dema mirov kovara **HEWAR** vedike û rûpelên wê dinêre, dibîne ku kovar bi helbestan dagirtî ye. Navê pir helbestnivîsan, li nav wan da usa jî navên navdarên me yê wek *Osman Sebrî, Qadrîcan, heta Celadet û Kemûran Bedîrxanan* jî bi xurtî kovarê ra derbaz dibin... Lê nav û berhemên wan tu kesî ewqas di nav gelê Kurd da bela nebûne, nehatine naskirin û hiskirin, çiqas yê *Cegerxwîn*.

Çima gel *Cegerxwîn* bi carekê va hemêz kir? Sebeb çî bûn?

Cawa pîrsê pir rehet e û li ber çava ne. *Cegerxwîn* lawê gel û sondxwarîyê azaya wê bû. Ji dilê evdên zêrandî diaxivî, kul û derdên wan distira, destê xwe danî bû li ser birîna gel, bû dengê Kurd û Kurdistanê, hiz-kiriyê xwendevana.

*Nalînek tê guhê min,
/ lê wînda û nihan e,
Agir berda dilê min,
/ tev bû pêt û dûxan e,
Barek da ser mîlê min,
/ lê barekî giran e,
Dane ser hev kulê min,
/ hemî derd û bela ne.
Dengê kê ye dinalî,
/ nalenala welat e,
Dikî gazî, dikalî
/ rabin çaxê xebat e,*



*Kurd û zaz û celalî, tev de çêkin civat e,
Kes xwe nedin vî alî, îro roja felat e.*

*Xortên Kurdan şîyar bûn,
/ guh nadin van nemerdan,
Bav û kalê me rabûn hemî mirin ji derdan.
Derdên li wan giran bûn,
/ îro li me çî ser dan.
Ne wek bav û bira bûn,
/ yara xwe ji dest xwe berdan...*

(Kitêb I, rû. 18, ji helbesta **DESGÛRTÎYA XORTAN**).

Gelo evdekî Kurd hebe ku ev peyv, ev xet û fikir nêzikî dilê wan nîbin... Helbestvan bi dilovanî û welatperwerî hestên gelê xwe, yên here nazik ra axivî.

*Ji bona her kesek yarek heye ê min
/ welat yar e
Belê, çî bikim di destê dijminê
/ xwînxur û xeddar e*

*Çiqas pesnê giran bêjim,
/ nikarim ez bidim zanîn
Çeleng û nazik û şeng û şepal û
/ şox û cebar e*

*Evê soza min û dilber eger
/ bimirim di vê rê de*

*Ji vê dinya xweş û şêrîn
/ Cegerxwîn jî, ne bê par e.
(Kitêb I, rû. 300, ji helbesta **EVÎNDARÊ WELAT ÎM**).*

Cegerxwîn di kûrma agirê tevgera gelê xwe da mezin bû, gîhîşt. Sekinî alîyê xelqê bindest û zêrandî, bi helbestên xwe yên bi hêze zelal nîşan da sebebên xizanî û bindestîya wan. Her xetêke helbestên wî bang in ji bo hişyarbûnê, xwenaskirinê, şerkariyê, azadbûnê dijî zordarên der û hundur.

*Ey dil li qiraxê çemê Amed rûnê sergerdan,
Rind çevên xwe veke, tamaşa ke
/ welatê Kurdan.
Li bajarê Amed çikandine çend sêpî,*

Bi wan ve daliqandîne cindiyê zazan.

*Li alîkî tac û teylesan bê xwedî ne,
Li alîkî kolosên kevej ketine bin lingan...*

*Ji berîka xwe destmalekê derxe û çevên xwe,
Paqij ke, ji wan hêstirên xwe
/ wek tav û baran.*

*Ax birano, ez nexweş im,
/ nexweşê welatê xwe,*

*Derdê min jana zirav e, serxwebûn derman.
(Kitêb I, rû. 64, ji helbesta **DE BÎGRÎ LÎ SER TAC Î SERA**).*

Li nav wan rewşenbîr û welatparêzên ku dora komela **XOYBÛN** û kovara **HEWARÊ** civyabûn *Cegerxwîn* yê tek û tenê bû, ku ji nav gelê sade, maleke gundîyê kesîb derketibû, zor û zemetîyê jîyanê, birçîbûn, tezîbûn, zordestîya hukumdarên der û hundur dîtîbû, sêwî mezin bûbû. Hevalên wî yê qelemê tev lawê axa, bega, serokeşîra, dîndarên dewlemend bûn. Rast e, halê wan jî wê demê ne tu hal bû, ew û malbetên xwe va jî ji alîyê dewletê va hatibûn sirgûnkirin, zêrandin, pelçiqandin, li nav tengasîyê aborî, sîyasî û civakî da bûn, lê ew usan hatibûn perwerdekirin ku nikaribûn mîna *Cegerxwîn* bi hêsanî biketana li nav civaka evdên sade, pale, cotyar û rêcber ra: kul û derdên wan bizanbiyana, pîrsgirêk û nakokî bidîtana.

Cegerxwîn bi xwe li nav wê civakê sade da bû. Dema kete medresa olî ew civak, bi tengasî û pîrsgirêkên xwe va li ber wî bêtir ronayî bû.

Cegerxwîn êdî xortekî têngîhîştî bû, ku medresa olî da dest bi xwendina xwe kir. Di wan medresan da feqeh tevî zanebûnên dinê îslamê usa jî cem melayên welatparêze zane, dîroka gelê xwe ya dijar ra dibûn nas, li nav bîr-ba-



werîyên Kurdewarîyê ra derbaz dibûn, berhemên helbestvanên Kurde mezin û nîrxên helbestvaniya gelên rojhilatê re dibûn nas. Gerekê bi heqî bê gotin gelek medresên Kurdistanê merkezên zanistîya ziman, dîrok, edebîyat û medenîyeta Kurdî bûn, cîyê Kurdayetîyê û welatparêzîyê. Şêxmûsê feqeh efrandinên *Melayê Cizîrî, Feqihê Teyran, Melayê Bateyî, Ahmedê Xanî* û gelek helbestvanên Kurdên berî xwe, di wan medresa da mihand, ji wê kanîyê av vexwar û li ser mîrata wane dewlemend qesra helbestvaniya xwe ava kir... Lê ew çiqas pey tiradîsyayên helbestvanên meye kilasîk çû, emê paşê li ser wê pîrsê rawestinin..."Melayê Cizîr deryak bû, ku min tasek av jê vexwariye",- helbestvanê mezin paşê bi xwe nivîsyê.

Salên xwendina medresa da ew bi temamî ket nav cihana zargotin, erf- edet, rabûnrûniştandinê gel, civaka dîndaran nas kir... Dît, ku ew civak jî, çawa dîrva tê xanê warêkî ewqas jî paqij nîne. Li rex mela û seydayên zane, welatparêz, nezan, cahil, sextekar û heval - alîgirên hukumdarên zalim jî kêr nînin. Wan salan ew bawerkî temamîya Kurdistanê gerya. *Celadet Alî Bedirxan* derheqa wan salê *Cegerxwîn* da wa dinivîse: "Gelek neketin navê ew Şêxmûsê sêwî û şivan bû feqeh Şêxmûs û çevên xwe li dinîya zanistîyê vekir."

"Herwekî di Kurdistanê de adet e. Şêxmûs her û her medreseyên xwe diguhestin. Piştî ko medreseyên deştê de xwend, çû welatê Soran û jê gihastîye heta deşta Lêhîcanê, di nav Kurdistana ecem da."

"Şêxmûsê sêwî yê ko bi revê bû, bû feqeh êdî gihastî bû rada seydatiyê. Wî seydaê ko piştê di nav Kurda de bi navê *Cegerxwîn* deng bidaya." (Kitêb I, rû 15, ji pêşgotinê).

Dema *Cegerxwîn* peyayî meydana helbestvaniyê bû di dîroka gelê Kurd da wextekî pir bi aloz û bi qewimandinan dagirtî bû. Herba cihanê ya yekemin, hilweşîna împêratorîya Osmanîyê, ji nû va bi hovîtî perçekirina Kurdistanê, bi alîkarîya axa, beg û dîndarên Kurda hatina kemalîzma miletçî li

ser desthilatdariya Tirkiyayê, gulvedana pantûrkîzmê, panîslamîzmê, înkarkirina maf û navê gelê Kurd, serhildanên Kurda yê li nav xûnê da pelçiqandî, serok, axa, beg û dîndarên welatparêze dardakirî, halê gelî nemir – nejî... Yekî mîna *Cegerxwîn* nikaribû bi rehetî bisekinya û halê gel û wlatê xwe binhêriya...

Di helbesta **HEY QEHREMAN MÎLETÊ KURD** (Kitêb I, rû. 278) da dibêje: *Hey qehremanên milête Kurd şerme tu razî Meydan bidî dijmin û li qada te bibe zî*


MÊRANE RABÎN XORTÊN KURDNSTAN (Kitêb I, rû. 275) da dinivîse: *Mêrana rabîn xortên Kurdistan Dijmin tev girtin ev bax û bustan.*

Helbesta bi nav û deng **KÎME EZ?** (Kitêb I, rû. 9) da êdî hewar û gazîya wî ye:

*Kîme ez ?
Kurdê Kurdistan
Tev şoreş û vûlqan
Tev dînamêt im
Agir û pêt im
Sor im wek êtân
Agir giha qepsûn
Gava biteqim
Dinya dihejî
Ev pêt û agir
Dijmin dikuji
Kîme ez?*

*Ez im rojhilat
Tev bîr û kelat
Tev bajar û gund
Tev zinar û lat
Ji destê dijmin
Dijminê xwîn xwar
Xurt û koledar
Ji rom, ji fireng
Di rojên pir teng
Bi kuştin û ceng
Parast, parast
Parast min ev rojhilat
Kîme ez ?*

Şorişa Oktyabîrê li Rûsyayê, ji



alîyê bindest, qarkir û gundîya va hilşandina qesrên padşatî û desthilatdarîyên kevnare zordestîyê, bîr û bawarîyên sosyalîzmê, ku mîna hewake xweş dihatin, digîhîştin Kurdistanê jî, nêzikî ruhê helbestvanê azadîhiz bûn...

Van hemya agirê welatparêzîyê yê gur û gewre di dilê Şêxmûsê feqeh da vêxistin, ew kirin **CEGERXWÎN**, deng, îsaf û wîjdan, leşkerê azadîya Kurd û Kurdistanê.

* * *

Çawa tê zanîn dîroka helbestvaniya gelê Kurd kevnar e û ji kûraya dewrana tê (*). Hê di sedsalên 11 – 12 – an da li nav Kurdên êzdî da helbestvanên xurt, yê wek *He-sedê Al Tewrî, Xidirê Zênde, Pîr Reşê Heran, Pisê Cemî, Şêx Fexrê Adîyan* hebûne û berhemên wan heta roja îro jî wek qewl, beyt, due'a, dirozgeh, bi gilîkî têkstên pîroz yê ola êzdiyatîyê tene parastin û jîyana dindarî û civakî da tene kêranîn.

Ew berhem bi çap, serecem, teqil û kêşeya xwe Kurdewarî ne, bi serkêşa pêncaya (tilya) xumarî hatine nivîsar ji helbestên erebî û farizî yê dema xwe cuda dibin. Rast e di wan da bîr û bawarîyên dinê êzdiyatîyê, yê dema Şîxadî û pey ra hatine dayîn, lê bi mijar, felsefe, cure, teql û naveroka xwe va berhemên edebî yê giranbiha ne.

Ev berhemên giranbiha nikaribûn hema usa, cîyê vala bihatana efirandin. Usa ne berî wan jî helbest û helbestvanî li nav Kurda da pêşketî bûye.

Dîroka dûr û dirêj da gelê Kurd gelek tiştê xwe unda kirine, pir tişt ji bêxweyîyê hatine bîrkirin, gelek tişt ji alîyê ola nû û dîndara va hatin heramkirin û tunekirin, gelek jî li nav tarîya dîrokê û kelefên bêxweyî da veşartîne.

Ji ber sedemên êşkere, ne ku tenê tiradîsyayên helbestvaniya Kurda yê kevnar, lê usan jî berhemên helbestvanên jor gotî û tiradîsyayên helbestvaniya zerdestîyê, helbestvanên Kurde sedsalên navîn ra bi fikira temainî nebûn hîm, ruh û çavkanî... Helbet, helbestvanên Kurde sedsalên navîn ji hinek bîr û bawarîyên gelê xwe yê kevnar jî nika-

ribûn xwe xilazkin. Gelek tişt jî ji derîya zargotina gel hildan, lê ew jî bi cure, teqil û naverokê va bi ruhê dema xwe veguestin, bîr û bawerîyên ola nû kirin li nav wan...


Kurdzana rûse eyan M. V. Rûdênko dema derheqa destana Selîm Silêman "**ÛSIB Û ZELÎXA**" da dinivîse, fikireke wa dibêje: "Eva gişk nîşan dide, ku edebîyeta Kurdî di peydabûna xwe da bi adebîyeta erebî, farzî, tirkî û folkilora kurdî va girêdaye." (M. V. Rûdênko, *YÛSÛF Î ZÛLÎXA*, kûrd-ska lîteratûrnaya vêrsî, M. 1973. avtorêfêrat dok. dîs.)

Belavbûna ola îslamê ra zimanê erebî, ji bo ew zimanê kitêba pîroz QURAN bû, gelên ne erebe musulmanbûyî ra bû yê olî û resmî. Gelek ziman di bin giraniya erebî da hatin pelçiqandin, bîrkirin. Ne ku tenê ziman lê gelek gel û medenîyetên berî îslamê yê kevnar jî bîrûmet û bêqîmet unda bûn...

Çiqas jî bi sedsalan giraniya erebkirinê li ser Kurdan bi dijwerî hate meşandin, lê ji bo îslambûna Kurda pir dirêj kişand û dibe ew bû sedem, ku Kurdan mîna gelek gelên din ziman û netewa xwe unda nekirin. Pêra jî li nav mîr, hakim û dîndarên Kurd yê welatparêz da bere – bere hişyarbûna hestên netewî meydan hazir bû ji bo pêşdabirina çanda netewî.

Helbestvaniya Kurda, ya kilasîk, çawa bûyareke dîrokî di sedsalên navîn da di medreseyên oldar û qesrên mîr û hakimên Kurde welatparêz da dest pê kir û li ser hîmê helbesta îranî û helbestvaniya ereba ya hevgerî ava bû.

Ew helbestvaniya kila-sîk, warê kîjanê hîmlî Îran û Erebiistan bûn, edebîyeteke pir bilind û ecêb bi hunerî bû. Hostatîya helbestvanan digîhîste rada here bilind. Bi zimanê biljare, zimanê maqûl û hakima, hukumdar û giregira di-



hate nivîsar. Helbestên wan koçik û serayên şah, padşa û sultana, medreseyên şêx û mela da dihatin xwendin û ew dixemilandin.

Wê dewrê sertacên edebîyetê yê nemir xuliqîn, efrandinên usan ku qesra edebîyeta cihanê niha jî dixemilînin. Wê helbestvanîyê hemû gelên rojhilatê navîn kire bin bandora xwe. Kurd jî, ku xelkekî wê heremê bû û musulman bû, xwendin-nivîsandina wê erebî, farizî û osmanî bû, pêra jî bi xurtî zimanê xwe diparast, nikaribû jî wê bandorê der bima.

Rast e li nav dewrana da gelek ewledên gelê Kurd bi zimanên desthilatdaran efrandîne, ji bo wan xebitîne, dîroka wan xemilandine û hîmlî nav wan da helyane, hatine bîrkirin. Lê hineka jî zimanê dayka xwe, kurmançîya xwe, ya şîrin li ser her tiştî ra girtine û bûne rûmet, serfînyazîya gelê xwe.

Rûpelên diroka helbesta kurmançî ya kîlasîk xemilandine: *Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Melayê Bate, Ehmedê Xanî, Smayîlê Bayazîdî, Şeref Xan, Mûrad Xan, Sîyêhpûş, Axayok, Mewlana Xalid, Hacî Fetahê Hezroyî, Mela Yêhyayê Mizûrî, Mela Xelîlê Sêrtî, Şêx Evdîlrehmanê Taxê, Şêx Nûredînê Berfîkanî, Mensûr Gergasî, Bekir Begê Erzî, Pertew Begê Hekarî, Şêx Mihmedê Hadî* û gelekên din.

Bi texmîna min edebîyeta Kurda ya kîlasîk hê bi edebîyetzanîya zanyarî û xurt nehatiye lêkolînkirin, analîzkirin û qîmetkirin, her helbestvanekî cîyê xwe, yê layîq li nav dîroka edebîyeta gelê xwe da negirtîye. Xebatên edebîyetzanîyê da tek navê hineka tene bîranîn. Ya lape baş, çend peyv derheqa cîyê dayîkbûn û jîyana wan da tê nivîsar, lê kar û berhemên wan çî bûye, çî kirine, ew cîya vekirî û vala dimîne, ji bo wê karê jî pir kêr xwendevan haj berhemên wan hene.


Di nav navên berî CEGERXWÎN, yên jorgotî da, (yên bi zaravê kurmançî nivîsîne) hostên helbestê yên here mezin, nav û berhemên kîjana mirov kare bê şik dayne li rex helbestvanên rojhilatê yê here bi nav û deng, *Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Mela Batê û Ehmedê Xanî* ne...

Ji van her yekî rêça xwe ya xisûsî li nav edebîyeta Kurda ya kîlasîk da vekiriye û ewlêda ra hîştîye. Qîmetê mezinî layîq ne ku tenê edabîyetzanîya Kurda daye wan, lê ji aliyê zanyarên bîyanîya va berhemên wan bilind hatine qîmetkirin. Mînak, rojhilatzanê dinê eyan, Kurdzan Î. A. Orbêlî dema derheqa Ehmedê Xanî da diaxive, li nav diroka edebîyeta rojhilatê navîn da sê nava ji bîr tîne: **Firdewsîyê Faris, Şota Rûstavêlî yê Gurc û Ehmedê Xanîyê Kurd**, wan hersek bilindayê helbestvanîya rojhilatê dide rex hev.

Avakirina helbestê li cem Melayê Cizîrî digîhîje pêlka here bilind. Helbesta wî da rîtmovka der û hundur, ewaz, reng, teqil û întonasya bi lîrîzma evînê, ya bêqisûr li hev tene hûnandin û dibin yekîtîke suruştî. Helbestên Cizîrî cûre û serecemên xwe va hevgirtî û bêqisûr in, xezna peyv, dîdem, nexş û nîgaran e. Ew dengbêjê evînê ye, li cem wî evîna paqije here bilind, evîna Xwedê ye. Zimanê wî yê koçik û serayê padşa û hakim, medresê şêx û mela ye.

Helbesta Feqiyê Teyran jî mina ya Melayê Cizîrî hevgirtî, xemilandî û kûr e, lê tê bêtir bêzîkî za dikeve û ruh dide dîdeman, reng û nexşan. Huba wî îsanî ye. Zimanê wî sivik e, nêzîkî yê gel e. Ewe menî, ku helbestên wî li nav gel da gelekî bi zar belav bûne... Hostatîya helbestvanîyê da ji Cizîrî dadixe.

Melayê Batê bi **MEWLÛDA** xwe ya kurmançî va eyan e. Ji aliyê helbestvanîyê, felsefê, xwedenasîyê, zanyarîya Îslamê da Mewlûda wî efrandîneke giranbiha ye. Bi texmîna min meznayîke vî helbestvanî jî ew e. ku dewsa mewlûda erebî, mewlûda kurmançî anî meydana, bi wê xweyî zimanê gelê xwe derket. Zimanê Mewlûda kurmançî zimanê gelê sade ye...



Ehmedê Xanî yekem ronakbirê Kurdî mezin bû, ku bindestî û feqîrîya gelê xwe li nav dorpêça gelên musulman da texmîn kir û gîhîşte zanyarîya xwenaskirina mîletîyê. Fikira sazkirina dewleteke mîletîyê bi zimanê Kurdî, pêşxistina Kurdewarîyê pêşda kişand, pêwîstîya "padşakî" Kurd seva gelê xwe dît.

Celadê Alî Bedirxan derheqa Xanî da wa dinivîse: "Xanî ew mirov e, ko gava xelkê Ewropayê hevûdin ji bo dozên mezhebî dukuştin, li mîletê xwe hişyar bûye, dil kirîye û xebitiye mîletê xwe jî hişyar bike û wî bigîhîne azadî û serxwebûnê." (**HEWAR**, N 33, rû 9; sal 1941.)

Xanî filosof, felsefa wî kûr û pirqet e, ya jîyan, evîn û heyîtyê ye. Evîndarê cemal û cîwanîya Xwedê ye. Helbestvanîya wî bi çap û pîvanên hunermendîya bilind û bê qîsûr hatiye hûnandin. **Mem û Zîna** wî bi temamî Kurdewarî ye. Zimanê wî bi peyvên kurdî, erebî, farizî hev vegirtî pir giran e... Bawerkî zimanê tu helbestvanekî Kurd ewqas giran nîne çiqas yê Xanî, xasma di destana **Mem û Zînê** da.

Xanî jî tesewûfê da mîna helbestvanên Kurde jorgotî sofîkî musulman e.

Dîroka helbestvanîya gelê Kurd, xazma ya kurmancî nîşan dide ku berî *Cegerxwîn* helbesta Kurdî rêke dûr û dirêj derbaz bûye. Ji pey wan heçar helbestvanên gewre yê sedsalên navîn ra, meydana helbestanîya Kurdî heta niha jî vala ne maye, gelek helbestvan hatine – çûne, lê di nav wan da *Cegerxwîn* helbestvanê herî bi nav û deng bû, ku mora xwe helbestvanîya Kurdî ya sedsalê bîstan xist û eva bawerkî ji heftê salî zêdetir e li ser zarê gelê xwe bûye kilama xwenaskirinê, berxwedanê, azadîyê, bûye îsaf û vîjdanê gelê Kurd.

* * *

Ehmedê Xanî bi dûrbînîya xwe, di dema xwe da zordarî û neheqîya herd împêratorên dagirker, yên welatê wî li nav xwe da pare vekiribûn, li ser gel û welatê xwe dît, qezya li ser ruh, ziman û çanda netewa Kurd texmîn kir û bi temamya hêza xwe rabû dijî wê

neheqîyê. Dît, ku ewledên gelê Kurd, yên zane û xwendî ziman, çand û medenyeta xwe ya netewî bêxweyî hîştine, xelqê ra xizmet dikin. Banga azayê kir, pêwîstîya padşa û dewleta Kurda, çekirina Kurdistanek serbixwe pêşda kişand.

*Gerdî hebûye me padşahêk,
Layîq bidîya xwedî kulahek,
Tafîn bibûya ji bo wî textek
Zahir vedibû ji bo me bextek.*

Ewî qelsî û kêmasîya xelkê xwe, sedemên bindestîya Kurdistanê texmîn dikir, ku ev gelê kevnar, xweyê dîrok û çanda mezin, ev gelê mîrxas eger tifaq, hevgirtin û yekîtiya wî hebe Rom, Erebb û Ecemê jî jêra «xulamtiyê» bikin. Yanê çawa gelê Kurd wan ra xizmetê dike, usa jî wanê xizmeta Kurda bikira.

*Gerdî hebûya me îttfaqek,
Vekra bikira me inqiyadek,
Rom û Erebb û Ecem temamî
Hemyan ji me ra dikir xulamî.*

Lê gelî nezan û nexwendîye, tarî û xewa dewrana da ne, bêtifaq û bêserî ye, ziman û çanda wê jî ji alîyê dagirkerên ruhî va hatine bîrûmet û bêqîmetkirin, ew dewa pêşxistina zimanê Kurdî, gulvedana çanda gelê xwe dike, alîgir e, ku li nav gel da tevî edetên olî usa jî cejin, eyd û erefatê Kurdî yê netewî, kevnar neyêne bîrkerin, bîr pîkanîn. Gelo **MEM û ZÎNA** nemir da nîrandina cejna **NEWROZê** û bîr xistina gelek eyd û erefatên Kurda yê kevnar şedetiya wê fikirê nînin? Ew mîna gelekên din efrandinê xwe bi zimanê dagirker û serdestan nanivîsî, bi kurmancîya xwe nivîsî, ku xelk nebêjin Kurd «**bê esil û bê kitêb in**».



*Da xelk nebêjin ku Ekrad
Bê merîfet in, bê esil û binyad,
Envayî mîle xudan kitêb in
Kirmanc tenê dibê hêsbîn
Hem ehlî nezer nebûn ku Kurmanc
Eşqî nekirin ji bo xwe armanc.*

Lê gelo çima ew bîr û bawariyên ronak-
birê mezin li nava xelkê Kurd da bela ne-
bûn, bi sedsala hatine bîrkirin? Çima li bin
toza nezanîyê û perda olê, ya dewrana yê gi-
ran da man? Çima heta dawîya sedsala 19 –
an û destpêka sedsala 20 – î jî kes negihîşte
kûraya fikirên wî?

Xanî bi dûrbîniya fikirandina xwe weke
çend sedsala ji mîr, hakim, dîndar û rew-
şembîrên Kurde dewra xwe dûr didît. Heta
helbestvanên Kurdên berî *Cegerxwîn* jî tê-
negihîştin fikirên helbestvanê nemir.

Wan teva ji nikaribûn ji qalibê biratiya
musulmanîyê, çarçova sofîzmê û ji nav dî-
warên helbestvaniya berê derên, xilazbûna
gelê Kurd ji belengazîyê, mezlûmîyê û bin-
destîyê di heyrana Mehmed pêxember da di-
dîtin.

Cegerxwîn mîna bahoze kete li nav hel-
bestvaniya Kurdî (kurmancî), qeyd û ben-
dên dewrana, yên eşkere û veşartî şikênand,
avît alîkî. Di qalibê helbesta kîlasîk da, ne
tenê rîya *Xanî* berdewam kir lê li nav hidû-
dên helbestvaniya berî xwe da nema, dînda-
rîya mizgevt û jîyana cîyê germe, rehet qe-
bûl nekir, nebû rewşembîrêkî li nav çar dî-
waran, dengbêjê hakim, axa û began, derket
kolana, gihîşte civaka evdên karkir û mez-
lûm, bû leşker, şervanê rîya azadarîyê, bû
seydayê gelê xwe...


Seyda ji *Xanî* fikira azadîya gel û welatê
xwe hilda, ku xelk jê fem bike felsefa wî ya
kûre pirqet û zimanê wî yê giran da alîkî, ji
Mele Batê jî zimanê wî yê xelkê yî sade hil-
da, dewsa methê Pêxember nav û azadîya
Kurdistanê danî.

Ji berî *Cegerxwîn* helbestvanê Kurd, pa-
yê pirê, mîna rewşembîrên gelên din, yên
musulmane ne Erebi, xwe ra kiribûn xeyset
efrandnên xwe da, bi fireyî cî didan peyvên

Erebî û Farsî.

Çawa *M. Emîn Bozarslan* dinivîse: “Wan
bauer dikir, ku kêranîna peyvên Erebi reng
û rû dide nivîsarên wan, rûmeta nivîsaran
bilind dike û nivîsarên wan alîyê edebî da
digihîjne radeke bilind”. *Cegerxwîn* dawî
wî xeysetê nerast jî anî, helbestên xwe, ku
alîyê hemiya va bîr femkirin bi zimanê xel-
kê nivîsî û hewil da bere – bere bigihîje pa-
qijaya zimanê Kurdî. Wî ne ku tenê guh da
zimanê (kurmancîya) nivîsarên xwe, lê usa
jî lêkolînên zimanzanîyê, yên giranbiha ki-
rin: **DESTÛRA ZIMANÊ KURDÎ** û du bi-
rên **FERHENG** nivîsî û weşand.

Eger, çawa me berê jî got, dema *Xanî* da
xelkê Kurd li nav nezanîyê û xewa olê da
amade nî bû dengê helbestvanê welatparêzî
azadîxwaz bibihî, fikira wî femke, lê dema
Cegerxwîn di alîyê dîrokî va cuda bû. Bûye-
rên hişyarbûna gela, yên mezin û bingeîn
çawa li cihanê, usa jî li Kurdistanê da qewi-
mî bûn. Şerkarîya gelan ne ku tenê dijî da-
girkeran bû, lê usa jî civaka bindest dijî zor-
dar û kedxwarên hundur nava têkoşînê da
bûn. Şorişa Firansîyê ya bûrjûvazîyayê pêk
hatibû, nêzikî hidûdên Kurdistanê, li Rûsya-
yê da şorişa Oktyabirê alt kiribû, karkir û
gundyan nîrê padşatîyê û zordestîya hakim,
dewlemend û milkedaran hedimandibûn,
bûbûn xweyê îrada xwe. Gelek gelên bin-
dest gihîştibûn serbestîyê. Ji pareke Kurdan,
ku wî welatî da (Welatê Sovyêtê) dijîtin gî-
hîştibûn hinek mafên miletîyê, jî wan den-
gên xweş dihatin. Kurdistanê
da jî serhildanên mezin dijî
dagirkeran çê bûbûn. Xelkê
Kurd li ser xwe didîtin ça-
wa zulma dagirkiran,
usa jî zordestîya axa,
beg û şêxên netewa
xwe. Didîtin, ku
payê axa, beg û
dîndarên wan, yên
pirê ji bo berjewe-
ndîyên xwe, yê sexsî
û malbatî alîyê da-
girkeran disekinîn.
Helbestvan sekinî



alîyê xelkê Kurdî bindest û bi qelema xwe ya tûj derket ne tenê dijî dagirkirên welatê xwe, lê usa jî dijî zulma axa, beg û dindaran:

*Şêx û beg û axa dijmin in, xweş mêrin
Bindestê xelkê ne, ji we ra wek şêrin,
Bêşê we distînin, serê we dişkênin,
Gund û mal ê wan, hûn birçî, ew têrin.*

Dema derheqa helbestvaniya *Cegerxwîn* da tê axaftin, lêya axlêvê, ya li çîyan dikeve bîra min. Ji pey berf, bager, sur û seqamên zivistana dijware dirêj ra, nişkêva bîna biharê tê, tav dûrva diqijilîne, germ dikeve tamarê erdê, werzeba ji germistana tîn, berf û cemed teyax nakin, dihelin û jorda dişiqitin. Bi xwe ra her tiştî diherifînin, tînin. He-ta zinarê mezin jî li ber teyax nakin... Car-na hinek tiştên pêwîst jî li ber hêza wê xirav dibin... Û lêyî bi guregur berjêr tê, kilama azaya çîya distirê, li nav kilamê da car-na awaz û peyvên ecele jî hene, peyvên ne cî da... *Cegerxwîn* ji usa hat, mîna lêya gur, mîna bahozê, mîna vûlkanê, da pêşîya gelê xwe û rîya dijwar ra, berê wê da ber bi bahara jîyanê.

*Şoriş im, bahoz û mij im,
Pijqîn û gij im, hewîr dirijim,
Diteqim, dipeqim dijmin dikujim,
Pêt im, agir im xwe ranagrim,
Kuştin û talan, firmêsk û giryan,
Halan û şewat ketim rojhilat,
Diqurijim dijmin dikujim.
Agir im
Venamirim: agirê dilê dîya,
Dilê sêwîya, dilê hejara,
Dilê bêzara, dilê birçîya,
Bi pêşve diçim diqurjim.
Şoriş im
Şorişa Kurd im, bi ah û derd im
Ew Kurdên gernas cengawer, mêrxas,
Destê xwe dan hev xencer tiving
Hawir dibazin bi halan û ceng,
Weke şêr, wek piling.
Dijmin dikujim,
Şoriş im
(Kitêba Î, rû. 69, ji helbesta **ŞORIŞ ÎM**,*

AZADÎXWAZ ÎM).

Ji pey “zivistana” dîroka xwe ya dirêj ra gelê razayî şiyar bûbû, jê ra dengbêjekî wek *Cegerxwîn* pêwîst bû, şorişvanekî sondxwerî, yê bê tirs. Û gel dengbêjê xwe dît, jê hiz kir, peyvên kilama wî ji dilê gel dihatin... Ji bo wê jî helbestên wî mîna lêyê Kurdistan dane ber xwe, zû bela bûn.

Helbesta KÎME EZ? (Î – 9) da dibêje:


*Ezim ew Kurdê serhişk û hesin
Îro jî dijmin ji min ditirsin.
Bîna barûdê
Kete pozê min,
Dixwazim hawir
Biteqim ji bin
Dîsa wek mêra
Bikevin çîya,
Naxwezim bimirim,
Dixwezim bigirim
Kurditana xwe
Axa mîdîya
Kîme ez?*

Helbestên wa, ku bang in, hewar û gaz-yê serhildanê, şerê azadyê ne li cem *Cegerxwîn* pir in. Mirov kare bi dehan nimûna bîne. Helbesta **PARTÎZAN** (Kitêb Î, rû. 54) da meremê xwe dîyar dike, dinivîse ku bi dil û zanebûn ji xwe ra ew rê bijartîye:

*Min daye ser vê rê ji dil
Zanîbe partîzan im ez,
Nabim xulamokî kesî
Da zanibî rêzan im ez...*

*.....
Destê xwe bavêjim tiveng,
Li ser çîyan qêrîn û ceng,
Pêş de hrim halan
/ û ceng
Zanim ne pir
/ arzan im ez.*

Helbestên
**ZÎNCÎR JÎ
GERDENÎM
ŞIKEST (Î – 73),
XABÛRÊ (Î –**



88), **FIDAKARÊ WELAT ÎM** (Î - 193), **FORT Û PORT** (Î - 202), **FERAT ÎM - KÊFERAT ÎM** (Î - 215) û gelek helbestên din da tê xanê, ku helbestvanê şoreşger ji bîr û bawarên xwe, ji sonda xwe paşda venakişe, wê her tiştî rîya bijartî da bide rihîna gel û welatê xweyî hizkirî. Helbesta **KURDÎSTAN** (Î - 34) da dibêje: "*Heçê kesê te bixwezî (Kurdistan, E. B.) divê canê xwe bi tedî*". Û bi rastî ji wê oxirê da ewî tu tişt nehêvîşand, çi ji destê wî hat bi şîrhelalî kir.

Evîna welêt li cem wî digihîje rada here bilind:

*Camek ji çirava kanyên welatê xwe
Nadim bi ava Zemzem û Heyat û Kewser.*

*Himek ji kevirên zinar û latên xwe
Nadim bi elmas û yaqût, zêr û gewhar,*

*Keç û bûk û pîrên Kurdistan
Nadim ji hor û suruştên bûhiştê yekser.*
(Kitêb I, rû. 414, ji helbesta **WELAT ŞÊRÎN E**)

Helbestên **KURDÎSTAN** (I - 121), **KÎME EZ?** (Î - 9), **BÊ TE HÊÇ ÎM WELAT** (Î - 28), **KURDÎSTAN** (Î - 34-), **EZ Û YARÊ** (Î - 93) û gelekên din da nîşan di-de ku welatê wî tev xêr û bêr e, baxçê gula ne, derdê dila ne, buhuşt e, kana meden, zîv, zêr e, welatê şêr, piling, pelewana û xweşmêra, xweyê medenîyet û dîroka kevnar maye bin destan:

*Welatê min digote min birazî
Li nezmê guh bidêre ger dixwazî,
Cegerxwînî, kurê min tu ji derdan
Silavan zû ji min bigihîne kurdan.*
(Kitêb I, rû. 273, ji helbesta **GOTÎNA WELAT**).

Yan:

*Ax birano, ez nexweş im,
/ nexweşê welatê xwe,
Derdê min jana zirav e,
/ serxwebûn - derman.*

(Kitêb I, rû. 64, ji helbesta **DE BÎGRÎ LI SER TAC Û SERA**).

Helbestvan ji bo azadîya Kurdistan

xwe banga serhildanê dike. Ew rind zane, ku wê dorpêça dagirkira da, wî halê welêtî sinifî û cihana bi berjewendîyan dagirtî da, azadî û rizgariya welatê wî pir dijar e û belê mezî dixwaze.

Helbesta **LÎ SER ÇÎYAN KETÎM** da dinivîse:

*Heval megrî çîya herdem
Çîyê xweşmêr û şêra ye,
Dîwarê serxwebûna Kurd
Ji laşê xurtemêra ye,
Serfirazî bilind e, lê
Bi xwîn û kotek e û zor e*

*Gelek şerme ku em sax in
Û dijmin hê di nav bax in.*

Xweş hatiye gotin.

Seyda qîmetê mezîna dida xwendin û zanebûnê. Sebebekî mezîna yê bindestîya gelê Kurd û halê welêt cahilî û nezanîya gel da didît:

*Dijminê meztir ji van bê xwendin
/ û nezanî ye,
Korî û neyektî û bêbextî zanim sêser e.*
(Kitêb I, rû. 45, ji helbesta **RÎYA RAST Û DÎRÎST**).

*Xwendin nebî kes naçe pêş,
Peyda dibin pir derd û êş,
Her dem dibin destê neyar,
Em dê dibin xûkî û bêş.*


*Ev tac û şewket xwendin e,
Ev dîn û dewlet xwendin e,
Ev serbilindî xwendin e,
Ev dewlemendî*

/ xwendine.

(Kitêb I, rû. 430, ji helbesta **XWENDIN**).

* * *

Dema meriv berhemên Cegerxwîn ra dibe nas, ew mîrata dewlemend, ya wî li



pey xwe hîştîye dixûne, tê derdixê, ku wî helbestvanê gewre karekî çiqas mezin ji bo pêşxistina çanda gelê xwe kirye, karekî usa, ku ji qewata evdên sade (normal) dere. Û wî ew hemû bi xwûdan û xebata xwe, bi hizkirin û zanebûn kiriye, zanibûye, ku dewse tu karê nastîne, xêncî çarkirina nexwaz û neyara.

Aqilbendekî gotiye: «Evd heye cihan daye pişta xwe. Evd jî heye rabûye li ser pişta cihanê rûniştîye. Yê, ku cihan li piştê, wî karî borcê xwe hesab dike, kere - ker borcê xwe diqedîne, mineta wî tu kesî tune. Yê li ser pişta cihanê rûniştîye, xweyê hukum û dewlemendîyê ye, li ber sifra tije rûniştîye... Ew him ji sifra cihanê pir dixwe, him ji pir gazin e... »

Cegerxwîn, bi rastî jî, cihana Kurdî, ew cihana bi pirsgirêk, kul û derdan dagirtî, ew cihana giran, ew birîn û derdên bê derman, di temamîya jîyana xwe da, da pişta xwe û bi serfînyazî pêşda bir.

Wî halê welatî dijwar da, bû şervanê azadîyê, ne ku tenê kilama rizgarîya gelê xwe stira, banga şorişê û serhildanê kir, lê bi şexsê xwe jî, bi kar û bar û jîyana xwe jî ji bo azadîya Kurdistanê xwe rêyên çareserîyê gerya.

Celadê A. Bedîrxan wa dinivîse: «Piştî temamkirina xwendina xwe, Şêxmûs melatîya gundan dîkir... Vê jîyanê jî gelek dom nekir. Cegerxwîn dev ji melatîyê berda û dest bi cotkarîyê kir. Di gel kurmancan du gund ava kirin. Navê gundê ko bi xwe tê de rûdinişt kiri bû Ceheneme. Seyda ji bo Cehenemê digot, ma ji xwe ne welê ye: mîletê ko ne bi ser xwe ye ma sekana wî ne cehe-neme ye".

"...Cegerxwîn wextê ko dev ji melaîtya gundan berda bergehê xwe jî guhert. Cib û şaşik avêtin, riha xwe a dirêj û çar kenar ediland û dawîyê kete qelefata xortên vî zemanî...."

".... Seyda şûrê xwe jî ji kalên kişandî bû, bera pûl û latên îtiqadên batil û xurafeyan dida, şerê neyarê hundur dîkir, li kur-mên darê li kurmên ko dar dixwerin diger-

ya. Ew kurmên ko seydayê Xanî berî sê sed salî pêş me kirine."

"Seyda rast bi rast bela xwe da bû mîr û heg û axa û şêxan. Ji lewre ji xwe re di-minê xurt û dijwar peyda dîkirin. Carna cîh lê teng dibû: lê seyda, bê perwa, şûrê xwe di ser serê wan re vediweşand û êşkere digote wan, ez dikim bi vî şûrî serê we jê-kim..." (Kitêb I, rû 13-14)

Osman Sebrî jî, halê Kurdistanê yê heta salên sîyî, tîne li ber çavan û tesîra wî halî li ser seyda wa dinivîse: "Şêx Sêîdê remetî di şerrê serxwebûnê rabû bû. Lê mixabin ku bêbextî û dilreşîya şêx û axan nehîşt ku ew xebata welatî bigê serî, Şêx Sêîd bindest û dîl, gelê Kurd jî şerpeze û bê rûmet kete berdest û lingê neyar. Ji bo çavşikandina mil-lê Kurd, kuştin, bi agir sotin, serjêkirin, ji welêt derxistin, heps û nefî kirin, di vî warî de herçiya ji Tirkên hat, derheqa milletên Kurd de tesîr nekirin. Van kirin neyar, ruhe-kî nuh di seydayê me de hişyar kir û hizki-rina Kurd û Kurdistanê xiste dilê wî."

"Berî istandina îcazê Cegerxwîn bi feqetî çû bû Kurdistanê Îraq û Îranê. Vê gerra han jî di canê Seyda de şopeke çak û ronak hîştibû. Derdê millet hêdî - hêdî bîr dibir. Millet jî nezanî û bêtifaqîyê dîl û bindest mabû: şêx û mela, heg û axa ji van kê-masîyan herpirsyar bûn. Ji lewre berê xwest şêx û melan ji wecibê wan hişyar bi-ke. Lê dema dît, ku wan çav dane xwarina malê millet û bindestîya wî, û dest dane destê neyaran û xulamîya wan: xîreta Seyda qebûl ne- kir ku di nav wî refê bêbext û bêrûmet de bimîne, rabû cibbe û şaşik avêtin û wek camêran destên xwe vemalan û da- ket qada xebata welêt." (Kitêb I, rû; 267-268).

Cegerxwîn se- bebên bindestî-fe- qîrîya welat û gelê Kurd ne ku tenê li



nav hukumdarîya dagirkirên zalim, lê usan jî şexsiyeta axa, beg û şêxên xulamê dagirkira da didît, nezanî û cahiltîya gel, bêtifaqîya di navbera eşîra û qebîla da didît. Helbestvan texmîn dikir ku bêy tivingê welat ji dagirkira rizgar nabe. Banga serhildanê dikir.

Hukumê şoreşa Oktyabirê û herba cihanê ya duda da altindarîya welatê Sovyêtê li ser wî pir bû. Îdêyayên sosyalîzmê û komûnîzmê yê hûmanîstîyê, ku wê demê cihan dabûne ber xwe û zû bela dibûn, nêzikî dilê wî bûn. Ewî xilazîya gel û welatê xwe li rîya sosîyalîzmê û markisîzmê da didît. Helbestvanê me sekinî alîyê xelkên bindest, zêrandî, alîyê karker û gundîyan, biratî û tifaqa wan sitira. Xewna wî bû Kurdistanek bi wekehevîya hemû evdan...

Çawa rîya wî ya helbestvaniyê, usan jî jîyana wîye şexsî û malbatî li nav dijwarîyên aborî, siyasî û alozyan ra derbaz bû... Ji bo mîaserkirina bîr û bawarîyên xwe ew ke te li nav komela, partîya, rêxistina, karê siyasî kir. Dema Kurdistanê Başûr da bîna bayê azadîyê hat, çû Bexdayê zanîngehê da dersên zimanê Kurdî da, demeke kin derket çîya digel pêşmerga tevî şorişa Başûr bû, ji bo bîr û bawerî, kar û barê welatparêzîyê dewleta Sûryayê çend cara ew girtin, kirne hebsê, çû Lîbnanê, dawîyê da mecbûr hate welatê Swêdê...

Kuda jî çû, çî cefa jî kişand, Seyda tu cara ji îdêyên xwe, ji sonda xwe paşda nese kinî. Azadîya Kurdistanê xwe bîr nekir.

* * *

Me berê jî got, ku *Cegerxwîn* hema di gavên helbestvaniya xwe, ya ewlin da bû dengbêj û şervanê azadîya gel û welatê xwe. Mîna lêkolînavanekî şeraza wî kul û derd, nexweşî û pîrsgirêkên civaka Kurd, sebebên bindestîyê, xizanîyê û perçebûnê gişk derxistine li ber çavan, "elek û bêjîng" kir û li rîya çareserîyê gerya.

Hiskirina wî berbi welêt ewqas pir bû, xwestina azadîya gelê Kurd dilê wî da ewqas mezin bû, ku tu tişt, yê li ser rîya hişyarbûn, xwenaskirin, azadî û serxwebûna gelê Kurd bûbûn asteng, qeyd û bend nehê-

vişand, li ber tu tiştî neket, nese kinî rûmet û sîyanetên berê, qesrên hevgirtina eşîrtîyê-olperestîyê, yê fêodal, heta hinek bawerîyên civakê yê kevnare pîroz jî di helbestên xwe da hedimand, vejend, kevir li ser kevir nehişt û ziyana wan yek bi yek derxist, raxist li ber çavê xwendevana...

*Ev bûye sed salên we
Kûçik duxun malên we
Keşe û şêx û mela
Li we dikin teşqela.*

*Axa û mîr û paşa
Wek hirça û gornepaşa
Ew tev beg û efenî
Lê wî jî wan ra gundî.*

(Kitêb Î. rû. 372, ji helbesta **JÎ XWEDÊ DÎVÊN Û EM FÎRÎNGA DÎDÎN**).

*Olperest û êlperest
Navên Kurd bibî serbest.*

(Kitêb Î. rû. 300 ji helbesta **HOVÎTÎYA DÎJMIN**).

*Qata Kurdên xwedî mal
Bi dijmin ra bûn heval.*

(Kitêb Î. rû. 349, ji helbesta **ALEQEMŞE**)


*Dijmin ku em derxin bi zor
Avên çeman em bibin jor
Zaz û Hekar û Bext û Lor
Pir xweş bikin vî warê min.*

(Kitêb Î. rû. 296, ji helbesta **KÎ HÎLGIRÎ VÎ BARÊ MÎN**).

*Dewlemenda kodik xistîye
/ nav lingên xwe,
Guh nadêrin ka
/ belengaz çima nal-nal in*

*Ji dijminan ra egîd
/ û comerd û nandar in,
Ji xwe ra parsek û
/ bêmîrê û pergal in.*

(Kitêb I. rû. 24 ji helbesta **XEWA BÎRÇÎYAN NAYÊ**).



Bi texmîna min dest ji karê dindariyê berdana wî jî, ji meremê xwe ji kap û bendên civaka cahil xilazkirin e, ku serbest bîkaribe diji kevneperestiyê û kelemên li ser rîya azadiya gel sekinî şerکاریya xwe bimeşîne. Seyda di wê rê da pir pêşda çû û gihîştê fikirdarî û femdarîke usa serbest û fire, ku bi zanîna min heta niha jî tu nivîskar, hunermend, rewşembîr û siyasetmendarê Kurd negihîştîye wê bilindayê.

Helbestvanê mezin usa xwe dîyarî xilazbûna gelê xwe kiribû, ku heta hunermendîya xwe ya helbestvaniyê jî, ku bê şik pir bilind bû. Ji bîr û baweriyên xwe: azadiya Kurd û Kurdistanê ra kire qurban.

Sebebên bindestî û xizaniya Kurda ewî di nava nezanîyê, bêtifaqîyê, "êlperestî û olperestîyê" da didît:

*Kurmanc hemî axa û beg û mîr û mela ne,
Hikmet ev e her dem ko belengz û gedu ne.*

*Axa û began destê sitem daniye ser wan,
Talanker û diz û keleş û bê ser û pa ne.*

*Şêxan û melan xişt û def û xayet û Enwar
Wek gurzê giran dane milan, şêrê Xuda ne.*
(Kitêb I, rû 21, ji helbesta **JÎ BER DêRDÊ EWAN**).

Helbesta **DESTÊ ŞÊX MAÇÎ MEKÎN**
(Kitêb I, rû, 26) da dibêje:

*Destê şêx maçî mekin ew şêx
/ ne qutbê razî ye,
Tac û şewket tev xebata destê sar û tezî ye.*

*Ev ne din e, dîn mebe, dîn serxwebûna mîlet e,
Ser mebe ber lingê şêx, kengê Xwedê jê razî ye.*

Çawa hemû destanên Seyda, usan ji **ZEND-AVÊSTA**, kîjan bi raya min tomerîbûna bîr û baweriyên wî ye, bi helbest û fikirên wa dagirtîne. Vîra da ew bi ol û baweriyê ne ku mîna Mela Batî berê xwe dide Pêxember, lê ol û bawerîya xwe azaya welatê xwe hesab dike. D

Helbesta **OLPERESTÎ** (Kitêb II, rû. 122) da bi dîr û dirêj li ser olê, baweriyê di-sekine û dinivîse:

*Meger ko ereb bûne bindest û jar
Bi ola xwe dîsa li me bûn siwar*

*Zimanê xwe xistin cihê zarê Kurd
Çiqas ez bibêjim hemî jan û derd*

*Hinek bûne şêx û hinek bûn mela,
Welatê me talan kirin teşqela.*

*Bi kurtî dibêjim belam pir dirêj
Serê me şikandin bi rojî, nimêj*

*Bes e zû şiyarbe ji vê rê ve ger
Gelek pîs û xwar e, tu bes pê de her*

*Tu ola xwe dayne welatperwerî
Xwedî rîstevan û xwedî rêberî*

Helbesta **MÎHEMED NEÇÛYE EZ-MAN** (Kitêb II, rû. 173) fikira xwe bêtir hûr dike û bawerîya xwe da dîr diçe. Dema derheqa Mihemed pêxember da dinivîse wa dibêje:

*Mehmed ne çûye, ne jî karibû
Xema mîletê xwe ewî xweribû*


*Mezin bû, giran bû gelek birêwer
Ku Quran wî çêkir bi zêr û zeber*

*Di îro tu bawer bike vê ji min
Mihemed mirov e seza û mezin*

*Belam xweş bizane ne pêxember e
Şahîşah û zana û xweş rêber e*

*Bi zanîn mezin kir
/ welatê ereb
Li pey wî belavbûn
/ li rast û li çep*

Li wê demê gotina fikirên wa, ew jî civakeke mîna civaka Kurd, ya cahil da, tiştêkî laqirdî nî bû û culetê mezin va girêdayî bû. Lê helbestvanê me sondxwarê



azadiya gelê xwe bû û tu tişt, çi ku zîyan di-
da gelê wî nedihêvşand.

Îdeayên sosyalîzmê û komûnîzmê, ku li
welatê Sovyêtîyê şorişa Oktyabirê da li ser
ketibûn, û cihan dabûn li ber xwe zû bela
dibûn nêzikî dilê wî bûn. Helbestvan bi ba-
werîke xurt azadiya gelê xwe di wê rê da
didît. Helbesta **MARŞA ŞÊWRÊ** (142-2)
da ji bo serhildanê bangî karker û gundîyên
Kurd dike:

*Mêrê çê bin, piştta me ye yekîtiya Soviyat
Çare nîne dê bi mênî her ji bo ne ev welat...*

Li cîyên din wa dinivîse:

*Li jor me Sovyat, serbilind hunermend
Piştîmêr ji bo me, bû kela, bû derbend.*

(Kitêb I, rû. 61, ji helbesta **SERSALA
SALA** - 1959).

Kurdo serê xwe rake,

/ dostê me ne Hind û Çîn,

Kela mêra li pişt me, paşmêrê me Stalîn.

(Kitêb I, rû. 332, ji helbesta **DESTÊ
ÎSMÊT ŞIKANDÎN**).

Ew di helbestên xwe, yên **EZ NÎZA-
NÎM ÇI BÊJÎM** (Î - 304), **PARTÎ ME** (Î
- 49),

PORT Û ŞÎRET (Î - 149), **EY KURD
ÇI KESÎ TU** (I - 322), **KÎ DÎVÊ ŞER, KÎ
DÎVÊ SELAM** (I - 335), **MÎHRÊCANA
BÊRLÎNÊ** (I - 333), **ÎHLAM JÎ ŞAÎ-
REKÎ ERMEN** (I - 342), **PEYMANA
ETLASÎ** (I - 343), **EZ MIROV ÎM** (IV -
136) û gelek - gelek efrandinê din da welatê
Şovyetê, welatê karker û gundiyan, dost û
alîkarê gelên bindest divînê, biratîya gelan,
aşîtiyê, dostaniyê distirê û şerê împêralîstên
şerxwaz dike...

Ji pey altindariya yekîtiya Sovyêtê di
herba cihanê ya duda ra baweriyên Seyda
ber bi wê dewletê bêtir xurt û qewîn bûn.

Welatê xwe elam dikir piştovanê gelê
bindest û zêrandî, pêşîkarê karkir û gundî-
yan, alîkarê şerkariya wane azadariyê, ala
wekhevî, biratî û azadiya hemû gelan, dijî
dewletên rojava / Împêralîst / sekinîbû, dîr-

va gelên mîna Kurda yê bindest ra bûbû
sîmbola xilazbûnê. Ne tenê *Cegerxwîn*, lê
bawerkî temamiya komele, partî, rewşem-
bir û şexsiyetên Kurdan, yê pîrî hindikî hiş-
yar ew dewlet ji bo gel û welatê xwe piştova-
van, guman û heval dihesibandin. Di rîya
Şorişa Sosyalîstîyê da azadiya Kurda didî-
tin. Pir helbestên Seyda da ev fikira bi den-
gekî bilind tê gotin. Em mînakekê bînin:

Ev riya dirêj me hinek kin kir

/ xweş bi çûna xwe

Li çûna esfîlt me ev rê raxist

/ tev bi xûna xwe

Ev riya Markis, ev riya Lênîn me jî daye ser

Ey nesilê hê bê, ji bo te me hişt

/ çend şop û eser.

Ilham dan me kuştina Qayser,

/ kuştina Hêtlêr

Bi zor em gihan rêza mênên çê,

/ pale û karker.

Ilhama mezin (Şêwr Oktobir) inqilaba sor


Deng daye dinya, hişyar kirin kerr,

/ ji çav kirin kor.

(Kitêb I, rû. 342, ji helbesta **ÎLHAM JÎ
ŞAÎREKÎ ERMEN**).

Li nav civaka Kurd da, hinek nivîskar,
sîyasetmedar, partîvan ewqas "pêşda çûn",
ku pîrsgirêkên Kurd û Kurdistanê ji bîr ki-
rin û çawa întêrşîonalîst, ketin li pey biratî-
ya gelan, pîrsgirêkên gelên mayîn, tevgerên
wan. Di dema *Cegerxwîn* da helbestvanên
Kurde usan hene, ku efirandinên wan, ba-
werkî payê pirê dîyarî tev-
ger û şerkariya gelên Vîyêt-
namê, Koryayê, Kamboc-
yayê, Afrîkayê, Asya û
Amêrika Latînî hatine
kirin. Eva jî çepîtke
çewt bû di dîroka
azadîxwaziya gelê
me da.

Lê bi rastî gere-
kê bê gotin, *Ce-
gerxwîn*, derheqa
çi da jî nivîsî pîrs-
girêkên gelê xwe



ji bîr nekir, ew çewtî tê derxist, rast nêzîkî
pîrsê bû:

*Rêça me ya rast û durust,
Ez nadim ser rêça kesî,
Ez dijminê kevneperest,
Rêça me ye xweş Markisî.*

*Lê Markisî çend perçe ne
Yek rast e, yên mayîn derew,
Ji wî yekî pir hizdîkim,
Çibikim bi nanê garis ?*

(Kitêb IV, rû. 53, ji helbesta **EZ NADÎM
SER RÊÇA KESÎ**).

Helbesta **EZ MIROV ÎM** (Kitêb IV, rû.
36) fikira xwe zelaltir dike:

*Markisî me, dixwazim,
Li her derî dibezim,
Kûbî me - serfiraz im,
Berî her tiştî Kurd im.*

*Sofyêt im birêwer,
Emrîkî me divê me şer,
Asyewî me bê tevger,
Berî her tiştî Kurd im.*

.....
*Lê ez Kurd im marksî,
Kara xwe nadim kesî,
Naxum nanê bi tîsî,
Berî her tiştî Kurdîm.*

*Ez Kurdekî dilbirîn,
Li nav dînan bûme dîn,
Hetta ciger me kir xwîn,
Berî her tiştî kurdîm.*

Fikirên sosyalîzmê û komûnîzmê, ku
Kurda jî wek gelek gelên bêmafê, bindestê
dîn, jê bawer dikirin û pey diçûn, îdêayên
pîroz, yê hûmanîstîyê, mirovhizîyê, azadî-
hizîyê û wekehevîya evda bûn. Wana ew
hemû di Yekîtiya Sovyêtê da didîtin û ew
dewlet ji xwe ra piştovan, alîgir û pismamê
herî amin hesav dikirin, rêyên xilazbûna
xwe hevaltî û piştovanîya wê va girê didan.

Pêşîrojê nîşan da, ku ew usa nîne. Gotin

û kirinê wê dewletê ji hev nagrin. Li ber
perdê tişteki dibêje, li pişt perdê lap tişteki
din dike.

Gelê Kurd ra ew dewlet tu cara nebû
piştovan û alîkar. Wê li bazara sîyaseta
xwe, ya rojhilata navîn da Kurd çawa perê
hûr dane xebatê. Cîyê ku kara wê dixwest
derxist meydanê, cîyê din bi nemamti pišta
xwe dida wan ew difirotime zulmkar, dîk-
tator û dagerkirên rojhilatê.


Bûyerên serhildana Araratê, Komara
Muhabadê, şerkarîya Barzanîya şedê wê
yekê ne. Ew welatê giva "piştovanê gelê
bindest" dijî Kurda hevaltî û alîkarî heta
dîktator û miletçîyên wek Kemal Atatürk û
Sedem Huseynê xwînxwar ra jî kir. Eger
Yekîtiya Sovyêtê niha jî hebya dijwar bû,
rêjîma Sedemê neîsanîyê li Îraqê da bihata
hedimandin.

Rast gotî Yekîtiya Sovyêtê dawîya salên
sîyî êdî ji rîya sosyalîzmê dûr ketibû, bûbû
welateki dîktatorîyî dergirtî. Li wur tu dê-
mokratî nema bû, mafê evdan bi hovîti di-
hate pelçiqandin. Dîktatorîya komûnîstîyê-
ye berk, xêncî zordestî û hukûmê xwe, tu
edelet, qewl û qanûn nas ne dikir. Salê da-
wîyê ew dewlet bûbû cîyê dizîyê, xiravîyê,
berdîla, miletçîtiyê, mafîyayê.

Û ji bo wê yekê jî fikirên sosyalîzmê,
ew îdêayên pîroz, yê wekhevîti, biratiya ev-
dan, azadî û gulvedana civakê, şerkarîya di-
jî neheqîyê, kedxwar, koledar u dagirkeran
bi mînakê wê dewletê, ya xwe ra digot "
sosyalîstî ", di çavê gela da
herimîn.

Usa ew îdêayên, ku
şexsiyetê wek *Cegerxwîn*
diparastin û derheqa

wan da nivîsarên de-
lal dinivîsîn xiyal,
bîr û bawerîyên
wan şexsiyeta bûn.
Ji bo li wê dewleta
dergirtî da her tişt
dizî va û veşartî,
ew jî pir berk ve-
şartî dihate kirin.



Heta evdên wê dewletê jî nizanbûn li dora wan çi diqewime, haj kar û barê dewletê tune bûn.

Propaganda qelpe derew, dûrva ew dewleta canawire bê wîjdan çavê xelqên dilsax da kiribûn merkeza heqiyê û rastîyê. Bi texmîna min helbestên Seyda yên bi wê nave-rokê nivîsî, (usan jî ewê pesnê STALÎNÊ dîktator wan da tê gotin) gerekê bi vê zanebûnê bêne lênehêrandin û lêkolînkirin.

Seyda hûmanîst û merivhizekî mezin bû. Efrandinên wî da fikirên delal hene derheqa rê û dirbên şerkarîya gela ya miletîyê – azadarîyê, rizgarîya evdên bindest ji kedxwar, koledar û dagirkiran, bi rîya xwendin, zanebûn û xwenaskirinê hişyarbûna gelan, şerkarîya dijî kevneperestîyê, miletçîtîyê, olperestîyê, êlperestîyê, bi rîyên biratî, wekhevîya evdan, aşîyê û hev-femkirinê, çêkirina civaka azad, saxlem û hwd...

Ew di helbesta xwe, ya bi sernivîsa **ALEQEMŞE** (Î – 349) da dibêje, ku gundî û karkirên Tirk jî mîna yên Kurd bindest in "qata" kedxwar, ya axa, beg, kapîtalîstan da dizêrin. Bi raya wî gerekê hêzên azayîxwazê herdu gelan bivin yek û şerkarîyê bikin ji bo azadîya xwe.

*Qatê jêrê tirk û kord
Tev birçî ne, tev zigûrd.
Dîvê ew dest bidin hev
Xebat bikin roj û şev,
Bixin destê xwe ew der,
Herdu bibin xwedî pat.
Yanî bibin du dewlet,
Dostê hev bin du millet.*

Di helbesta **ÇAVSORYA DÎJMÎN** (Î - 319) da dinivîse:
*Bibin bi dost û heval
Xwedî zêr û xwedî mal,
Destûr bibî dêmoqirat
Dêmokirata Rojhilat
Qad û xwendin tevayî
Wekehevî û birayî.
Derheqa olperest û êlperesta da dibêje:
Kurd nexwendî, perîşan
Dimirin ji bo gezek nan*

.....
*Em li jêrin, ew li jor
Li me dikin zilm û zor.*
.....

*Olperest û êlperest
Navên Kurd bibî serbest.*

(Kitêb Î, rû. 300, ji helbesta **HOVÎTÎYA DÎJMÎN**).


Ez difikirim, eger *Cegerxwîn* Kurd nî bûya, pişt û mecal wî ra jî çêbûna, salên efrandarîya wî yên gur da derxistana meydana cihanê... Wê ji Nazim Hîkmêtê tirk û gelekên din kêmtir nav û deng qazanc nekira.

Dibe ev alîkî da jî xêre, ji bo niha kes nikare bêje, ku Seyda ji bo kara şexsî ketîye tora berjewandîyên hêzan, dewletan, yan sîyasîyan. Ewî çî kir ji bo azadîya Kurd û Kurdistanê kir. Ew sondxwarê azadîya gelê xwe bû û heta dawîya jîyana xwe jî tu gav paşda navît.

* * *

Bi tam û ji her alya va lêkolînkirin, analîzkirin û qîmetkirina helbestvanîya *Cegerxwîn* karekî dijwar e û xebata edebyetzanîyê, ya demdirêj û berfire dixwaze. Lêkolînkirina her berhemeke wî cude-cude (kîjan ji bo qîmetkirina helbestvanîya wî pêwîst e), kare lêkolînvane ne ewqas pîspor bike li nav gêjgeringekê û ew bikaribe ji wê xaosa fikira xwe xilazkirin pir çetin e. Berhem pir in. Him pircûre û pirserecem in, him jî bawerkî her heyşt dîwanê çapkirî da helbestên bi fikir, gotin, heta çapê û naverokê va jî nêzikî hev pir in. Helbesteke wîye nû dixûnî helbesa berê di-keve bîra xwendevan...

Cegerxwîn ji alîyê avakirina helbestê, têxnîka nivîsarê, kêşeyê, teqlê, li hev anîna bend û rêza, bi texmîna min ji qalibê helbestvanîya kilaşîk ya rojhilatê ewqas jî dûr neketiye.



Hinek helbestên wî, yê evîndariyê hene, ku helbestên *Melayê Cizîrî û Feqîyê Teyran* tînin bîra xwendevanan.

Tebyetmendîyên cihana helbestvaniya Seyda jî pir in:

- Helbestvanên rojhilatê yên klasîk di avakirina helbestê, teknîka li hev anîna rêz û benda, yên hundur û dawîyê, bijartin û kêranîna peyvan, kûraya fikrê ya dîyar û bînxet va digîhîjin hunermendîya here bilind. Eger ji wê nivîsarê bixwazî xetekê yan peyvekê derxî yan ji cî biguhezî, helbest seqet dibe, xirab dibe, dişkê, bi hewas nayê xwendin.

Cegerxwîn çiqas jî hostayê avakirina helbestê bû (xet û malikê avakirina helbestê, yên pir ecêb û xweş cem wî hene) ewqas jî guh nedaye wê zêrkeriyê, ji bo wê zêrkeriyê mecal nedida helbestvan, ku fikirên xwe di nava wî qalibê teng da bîne ziman. Wî ji bo azadiya welat û gelê xwe dixwast ecele gotinên xwe gel ra bêje, gel hişyar ke, rake serhildanê, şoreşê... Û ku tev ji wî femkin, bawerkin gotina xwe pir sade û zelal digot.. Ew şervanê azadiya welatê xwe bû, şoreşger bû, dema wî tune bû bikeve pey wê zêrkeriyê, kîjanê ra kar û dema dûr û dirêj pêwîst bû...

- Cihana helbestvaniya Seyda mîna deriyakê ye, pir ber û fire ye, ji pêra jî şivêta çemê ji çiya tê gur û hur e...Lê kûr nîne. Helbestvan fikirê xwe, nêst û meremên xwe heta dawîyê hûr dike, derdixe li ber xwendevana radixe, di bin xetê da ji bo fikirandinê xwendevanê xwe ra tişteki veşartî nahêle. Bi texmîna min ev rê Seyda bi zanebûn bijartîye, ji bo rind zanibûye dereca xwendevanê xwe...Carna helbestekê da fikirên xwe dubare, sêbare dike û astengîyê navbera xwe û xwendevanê herî sade da jî nahêle...

- Helbesta *Cegerxwîn* siyasî ye. Rind tê xanê ku helbestvan di kîjan tebyê da sekiniye, kara kê xweyî dike û li pey kîjan hêza siyasî diçe. Ew bi bîr û baweriyên xwe wê siyasyê va girêdaye, sedî- sed bi bawer e ku bi wê rê welat û gelê wî wê bigîhîjine azadiya xwe. Ferih tê femkirin, ku helbestvan ew rê ji bo karê şexsî, nav û rûmetê,


yan ji bo kara civakeke teng ne bijartîye. Ew pir rind haj qezya û tengasiyê wê rê jî heye, lê bi zanebûn, bi culet dide ser wê rê, rîya azadî û rizgarîya gelê xwe ... Li rîya siyasî da ew piraktîk e, tîorêtîk nîne. Siyasya wî, şerkarîya wî jî ne tenê seva perçêkî Kurdistanê ye, lê seva temamiya gelê Kurd û hemû gelê bindest e.

Siyasya wî jî hişk, bêruh, yekalî û bê kompromîs nîne. Siyasa helbesta wî da di tev hestên welatparêzîyê, merivhiziyê, rastîyê û heqîyê bi hostatîya bilind hatiye hûnandin, bi nexş-nîgar, teqil û ewazên gelêrî, yên Kurdewarî hatiye xemilandin, helbest kirye bûyereke nû li nav dîlana helbestvaniya Kurdî da.

- *Cegerxwîn* helbestvanê gelêrî ye. Hidûden helbesta wî û zargotina gelêrî pir nêzikî hev in û carna usa dibe, ku ew hidûd namînin. Mirov tirê ew helbest efrandinên gelêrî ye sedsala ne. Gelek helbestên wî bi xwe stiran in. Dema mirov dixwîne, tê bêjî xwendinê ra ewaz û mûzîka wan jî tê bihîstin. Tê xanê Seyda dengbêjekî pir mezin bûye û eger bilind jî nestira ye, dilê wî timê jêra stiraye. Ew şurêta helbestvaniyê, ya pir mezin e, ku Xwedê dide kêma helbestvana,

- Helbestên Seyda bi gotinên pêşîya va dagirtine. Bawerkî tu helbestvanê Kurd ra weke wî li hev nehatiye usa şeraza, cî da û bi nêta tomerî helbestê da gotinên pêşîya bixebitîne. Ku xwendevanê herî nezan jî jê fem bike, ew bi cûrekî rehet, sade, zelal, di cî da, kîjan di avakirina helbestê da pispoya bilind dixwaze, gotinên pêşîya kêr tîne û bi wan bawerîya fikirên xwe li nav xwendevana da xurtir dike.

- Zimanê wî yê xelkê sade, yê karker, şivan û cotkaran e. Tu astengî, tengasî, hidûd, pirsgrêk alîyê zimên da navbera



wî û xwendevana da namîne... Ji bo wê jî efrandinên wî di heçar perçê Kurdistanê da û ji welêt der zû hatin naskirin û hizkirin.

- Helbesta *Cegerxwîn* hizira evîna welatê bindest e, banga serhildanê ye, qîrîn, he-war û gazî ye ji bo xewa dewrana hişyarbûnê, temî ye ji bo yekbûn û tifaqê, zanabûn û xwenaskirinê, bihêzbûn û rêxistinbûnê, kilama biratîya xelkên cihanê yê bindest e, gazina eşkere ye dijî hukumdar û kedxwarên mirovatîyê... Bona wê karê jî helbestên wî siloganên şoreş û serhildanên azadîyê ne, rêklamên kolana, gazîyên mîting û şevên eyd û şaynetîya ne, gerekê bilind û bi his bêne xwendin. Helbestên usan gel ra dibin rêniş, al, silogan û bi milyona evdan pey xwe dibin şêr ji bo azadîyê...

Dijwar e du helbestvanên cuda himberî hevkin, lê bi texmîna min çawa helbesta Mayakovskî ya bi hêz bû seva prolêtarên Rûsyayê di dema şorişa Oktyabirê da, ûsa jî helbesta *Cegerxwînê* Kurdistanê ra, di roja helbestvaniya wî ya ewlin da heta roja îroyîn...

Bi tomerî *Cegerxwîn dengê gelê Kurd* e, qîrîna wê ya azadîxwezîyê ye, dengê gelê bindest e. Tu şayîr û nivîskarê Kurd di nava gelê xwe da, li heçar perçê Kurdistanê usa nehatiye naskirin û hizkirin, çiqas *Cegerxwîn* e. Helbestê wî bûne kilam, bûne gotin li ser zimanê her kesî jî şivana girtî heta dewlemenda, nexwendîya girtî heta zanyara, atêîsta girtî heta bawermenda, musulmana girtî heta êzdiyan. Her qatên civakê Kurd *Cegerxwînê* helbestvanê xwe hesav dikin û berhemên wî hiz dikin... *Cegerxwîn* helbestvanê temamîya gelê Kurd e!

* * *

Ji bo lêkolînê min ev herçar kitêbên Seyda kêr anîne, ku jî alîyê Weşaxana DENG da neşir bûne. Nimûne jî min ji helbestên wan kitêban anîne.

1. CIGERXWÎN. Şiêr – I, DÎWANA YEKEM, (1 – 266), ŞÊWRA AZADÎ, (267 – 268) Weşana DENG, Stembol, 1992.

2. CIGERXWÎN, Şiêr – II, KÎME EZ, (1 – 281), RONAK, (282 – 443). Weşana DENG, Stembol, 1993.

3. CIGERXWÎN, Şiêr – III, ZEND – AVÊSTA, (1 – 178), ŞEFAQ, (179 – 335). Weşana DENG, Stembol, 1997.

4. CIGERXWÎN, Şiêr – IV, HÊVÎ, (1 – 234), AŞÎTÎ, (235 – 454), Weşana DENG, Stembol, 2000.

(*) Gilî derheqa helbesta Kurdi ya bi zaravê Kurmanci da ne. Baba Tahîrî Uryan ku sedsalên 9-10 a da jiyaye, rubayiyêt xwe (Çarin) eyan e. Wî bi zarave Lori nivîsiye. Helbestvaneke rojhilatê yê mezin e.



Welat li ba Cegerxwîn



• Cankurd

Kaniya hozanvaniyê evîn e. Evîn û hezkirina mirovan jîn û jiyên wan xweş dike an pîs dike. Gava em li dîroka hozanvaniya cîhanî binêrin, emê gellek hozanvanan bibînin, ku hezkirin û evînê ewan namdar kirine. Lê mezintirîn evîn û hezkirina **Cegerxwîn** bo welêt bû. Welatê wî di jîna wî de û jîna gellek hunermend û nivîsevanê kurd de tîlên tenbûrê, malika hozanê, ronahiya rojê, mûma şevê û yara dil bû.

Cegerxwîn ji welatê xwe re pîr nalîn û axîn rêz kirin û di teviya jîna xwe de bo welêt dengê xwe bilind kir û bi evîna Kurdistanê namdar bû.

Di vê gotarê de, em di nav bax û gulistana **Cegerxwîn** re digerin û bihna kulîlkên evîna wî dikin.

Welatê me li ba **Cegerxwîn** çi welate ?

*"Welatê kurda tev xêr û bêr e
Hemî maden e, tev zîv û zêr e*



*Lê çi bikim îro maye ji xelkê re
Welatê kurdan hemî çîmene
Egîd û şêr û piling tê hene
Hemî heval û pismamê me ne..."*
- **Helbestên bijarte, rûpel 94** -

Di gelek ciyan de, li ba **Cegerxwîn**, ev
dêmenê welat ê xweş û baş tê ber çavan:

*"Zengîn e welatê me,
hemî kanî û zêr in
Em tev wekî şêr in*

*Rengîn e hemî deşt û çiya
Av û giya ne, tev bax û bihtîşt in"*
- **Helbestên bijarte, r. 9** -

Ev xweşî û rindiya welêt, ji zû de, li ber
çavên **Cegerxwîn** e, di dîwana yekemîn de,
jî van rewşên delal li ser welatê xwe gotine:

*"Kurdistan pir xweş û geş,
/ ez jê re tim dinalim
Ew asîtanê kurde, şîrîn e deşt û zinar*

*Zinar û bax û bostan, zeytûn û sêv û hirmê
Hincas û xox û mişmiş,
/ bihok û giwîz û hinar..."*
- **Dîwana yekan, r. 10** -

Hebûna xêr û bêrên welêt, her di dilê
Cegerxwîn de cî girtine û bala wî kişandi-
ne ser xwe:

*"Kurdistan tev kûp û bel û
/ deşt û kel û şax in
Dexl û av û dar û ber û
/ gund û rez û bax in..."*
- **Dîwana yekan, r. 24** -

Kurdistan li ba **Cegerxwîn**, xwe bi xwe
wilo nîşan dide:

*"Gula baxê bihiştê rojhilat im
Di tarîka şevê rojim, hilat im
Ji nav sînga demê pijqîm îro
Di tarîxê fireh hat im, Ferat im..."*
- **Kîme ez, r. 109** -

Kurdistan bi xemla xwe ya rengîn, bi co
û cobarên xwe, bi çem û rîbarên xwe ve, no-
la keçeka bejin bilind xweyadibe:

*"Bilind e bejn û bala te
Li ser taca te ezman e*

*Kitanek reng sipî daye
Serê zozan û Sîpan e*

*Li jorê kanî û cobar
Wekû hêstir dibarin xweş*

*Li jêrê te dibênim ez
Bihîşt û bax û bistan e*

*Kirasek etlesîn kesk e
Bi rengê roje nexşîn e
Li bejna te dibênim xweş
Bi surme şal û mîtan e..."*
- **Ronak, r. 54** -

Bax û bistanêd Kurdistanê hesret û xema
xistine dilê hozanvanî, ku di xwe de dinale,
îro bi dest dijmin de mane:

*"Bax û bistan im ka ? Ax gulistan im ka ?
Dijmin tev girtin ax ! Ax Kurdistan im ka ?..."*
- **Dîwana yekan, r. 39** -


Ew ne tenê şîrîn û rindik e, ew bo me da-
yîk e:

*"Em anîn cîhan wê Em kirin însan wê
Lê me zû ew berda Ax Kurdistan im ka ?..."*
- **Dîwana yekan, r. 39** -

Li ciyekî de **Ce-
gerxwîn** li ser
welatê xwe na-
zik-nazik dibêje:

*"Kurdistanê,
Kurdistan !
Bexşê gula,
derdê dila !..."*
- **Kîme ez, r. 38** -

Welat li ba **Ce-
gerxwîn**, ne tenê
şînayî, av û ka-



niyên sarin, an jî dextl û bistanin. Welatê me
tev zêre û dijmin ji dest me revandiye:

"Çol û deşt û lat û şaxên te hemî miştin ji zêr
Dijminan ew tev revandin,

/ mane em bê xêr û bêr"

- *Dîwana yekan, r. 69* -

"Welat xweş e, tev xêr û bêr

Petrol û hasin, zîv û zêr

Bindestê dijmin, jor û jêr

Ta kengê kola bin, bese !"

- *Kîme ez, r.19* -

Raste ev welata kaniya zêr û petrolê ye,
lê xwediyên va welatî her birçîne, dijmin tê-
de têrin:

"Welatê min bihişte, kaniya zêr

Belê şêr têde birçîne, gurin têr"

- *Kîme ez, r. 45* -

Welat li ba **Cegerxwîn**, di gelek rist û ho-
zanan de keçeka çeleng û lewend e, ên mîna
Cegerxwîn jî bûne evîndar û dilxwazên wê,
hezkirina hozanvanên kurd ji welêt re, ewan
tev gihandine rewşeka evîndariya bê nîşe.
Ev rewş li ba Cegerxwîn zor diyare:

"Welat yareke pir xweş û dîdar

Li ser dinalin hezar evîndar

Li rast û çep kufî, birîndar

Malwêrane ê dosta wî bedew"

- *Kîme ez, r. 31* -

"Keçek min dî ciwan û xame her bext,

Li wê çûne gelek çax û dem û wext

Me jê pirsî ji ku ye, ey keça rind ?

Kenî û go ji Loran ta biçî Bexd

Me go ey keç tu Kurdistanî ? ez kurd

Kenî û go: ne kurdî, ka ber û rext

Serê xwe min tewande ber nigê wê

Binêr gorî dilê min bû hemî sext"

- *Dîwana yekan, r. 60* -

Ev rewş û dêmenê welêt, li ba **Cegerx-**
wîn di teviya karê wî yê hozanvanî de di-
yardibe, welat keçeka ciwan e, xweşik e,
dezgirtiya wî ye, li hêviya mêr û şêrên cen-
gê ye, ew revandine, birîndar e, xembar e û

qêrîn û hawara xort û lawanên kurd dike, ku
wê ji bin zordariyê derxînin:

"Xemlandî me seranser, dezgirtiya xorta me
Gerden sêvek sor û zer, li hêviya merda me
Qelen xwîn e ne gewher,

/ Kurdistanî kurda me

Bê tang û top û leşker, îro we ez berda me

Kurdisatna delal im, herkes tê min dixwazî

Ez pir şox û şepal im,

/ min deng daye bi nazî

Ev bân bîst û du sal im,

/ li ser min ceng û bazî

Kurdo wer min bixwaze, belê bi serfirazî"

- *Helbestên bijarte, r. 58* -

Welat bi xweşî û rindiya xwe, zordariyê
li dilê hozanvanê me dike:

"Çi reng şîrîn e yara min

Şepal û nazik û şox e

Ferat û Dicle û Xabûr

Bi ser hejnê de berdan e

Ji xwîna min tu lêv sorî

Ji bîna min gula corî

Tenê min bazinê zendên

Te zencîrîn di linga ne

Evîna te kirim seyda

Birîndar û perîşan im"

- *Ronak, r. 54* -

Ev sîtemkariya welat di hinde ristên din
de jî, tê ber çavan:

"Pêtiya arê evîna te ye dil kirye pereng

Me çiqas xwest, ku

veşêrim lê bi zor

dayîye deng

Wek te mêrkuj

me nedî kes we

bi xwînrêjî bijî

Ku evîndarê


xwe carek dikuji

wer bê xedeng

Me go qey dost û

hevalî, bi te re

bûne heval



Ji me dil bir te bi tayê serê
/ zulfâ xwe ye şeng

Me nedî çend geryam, ez ne di
/ Şam û ne di Îraq
Kes di rengê te şepalê nazik û şox û çeleng
Te ji Salarê çeleng girtiye ev zor û sitem
Herdu ebrû te şikandin li me hûn
/ şêr û pileng"

- **Helbestên bijarte, r. 88** -

Lê ne tenê ew aşîqê welat e, belê gele ho-
zanvanên din jî di wê rê de çûne:

Ji bona her kesek yarek heye,
/ ê min welat yar e
Belê çibkim di destê dijminê
/ xwînxwar û xeddar e

Çiqas pesnê giran bêjim,
/ nikarim ez bidim zanîn
Çeleng û nazik û şeng û
/ şepal û şox û cebbar e

"Hezar wek min di vê rê de,
/ bi van derd û kulan kuşt in
Tilisma ser devê genca,
/ di sînga min de: reşmare"

- **Helbestên bijarte, r. 73** -

Qelenê welatê **Cegerxwîn** ne zêr û zî-
vin, ne cewher û elmasin, tenê xwîna lawan
û merdane:

"Qelen xwîna min e çibkim?
Divê ku ez bidim carek
Meger can û ciger deynim
Di vê rê de, çi erzan e !"

- **Ronak, r. 55** -

"Welat xweş bûke
Xwîna me qelene"

- **Ronak, r. 69** -

Lê Kurdistan ne tenê şêrînî, ciwanî û
evînî ye. Li Kurdistanê kuştin û talaniye,
darvekirin û sotin e, wêrankirin û girî ye:

"Ey dil li qiraxê çemê Amed rûne sergerdan

Rind çavên xwe veke, temaşake
/ welatê kurdan

Li bajarê Amed çikandine çend sêpî
Bi wan ve daleqandine cindiyê zazan
Li alîkî tac û telesan bê xwedî ne
Li alîkî kolosên kevej ketne bin lingan

Ji berîka xwe desmalekê derxe û çavên xwe
Paqij ke, ji wan hêstirên xwe
/ wek tav û baran"

- **Dîwana yekan, r. 33** -

"Sêpî li Kurdistanê çiqandine herdem
Bi wan ve daliqandine torinên kurdan"

- **Dîwana yekan, r. 45** -

Wan bax û bistanên welatê me yê, ku
Cegerxwîn ji evîna wan dinale, hatine sotin
û pelixandin:

"Agir bi Kurdistanê ket,
/ lewra dikit haware dil
Sed bax û sed bistanî ket manendî
/ bilbil jare dil"

- **Dîwana yekan, r. 20** -

Di welatê **Cegerxwîn** de, kuştin û tala-
ne, perîşanî û bindestiye:

"Alîkî welatê te maye perîşan û bindest
Li aliyê dinê, talan û kuştin û tim qîrîn
Pîr û kal û keç û xort û şîrmij û
/ zarok kuştin

Porgijgijî
/ sergeverin, tu li
/ wan dinêrî
/ wek dîn
Zarokên xwe,
/ ji ber sînga
/ xwe davêjin,
/ ji tîrsa
Bazdidin û li
/ wan vedigerin,
/ dil bi kul digrîn
Li jor balafîr û li
/ jêr otmatîk û
/ mîtralîyoz dîkin



qêrîn û dibêjin, haydê îêxin kurd revîn"
- *Dîwan a yekan, r. 96* -

Ji berê zû de, ev welata di rew_eka wilo de mayî, rût û zuha bûye, dijmin par kiriye, dubendî xistiye nav gelê wî de û xwîna wan mêtiye:

*"Welat hezar sal in beyar
Di nav de wer bê tînim ez
Hemî pûş û pelax e lê
Pir baş e ku hê şînim ez
Dijmin du sê xet lê kişand
Jehra dubendî lê reşand
Xwîna dilê min mijand
Ev çende pê şêrînim ez"*
- *Kîme ez, r. 54* -

Ev zordariya dijmin, bi hawar û qêrînê naye rakirin, tenê xwînêrêtin ji me re welat vedigerîne:

*"Welat ket e dest neyar
Nayê dest me bi hawar
Divê xwîn bê rijandin
Milet pê bê pijandin"*
- *Ronak, r. 117* -

Gelê kurd her di ber welatê xwe de xwîn daye û çî caran ji vê rê venagere:

*"Xakî Kurdistan ! bi qurban,
I pir ciwan û paqijî
Xwîn rijandin pir kurên te, wa li her alî rijî
Milletê kurd ta ku sax e, ew ji vê rê nagerî
Aferî, aferî ! Qadî Mihemed, aferî"*
- *Helbestên bijarte, r. 67* -

Lê çiqas welat di bin destên dijmin de bimîne, dîsa jî nabe ê wî, ew welatê me ye:

*"Welat li ser navê me ye
Navê kal û havê me ye"*
- *Ronak, r. 72* -

Ew welatê, ku ciwan û xweşik û çeleng bû, niha bûye pîreka porsipî, pûş û pelax e,

belengaz e:

*"Bibêje ez keçek bûm, ta ku bûm pîr
Nedî min xwe wekî vê salê êsîr"*

*Serê min bû sipî, pûş û pelax e
Li jêrê min çu nîne xeyrî ax e*

*Ji çavên min diçin sed av û sed co
Ji min êdî dîkin gazinde zaro
Xerab bûne ji min sed xan û qonax
Nemaye bo perîşanan du sê max"*
- *Helbestên bijarte, r. 6* -

Bo çî welat ketiye va rewşa tehl û tirs, **Cegerxwîn** dibîne, ku ne tenê dijmin har û hov e, zordar û talanker e, lê bi wî re di her-deman de aliyek ji me hevalbend û dost ne-yar bûne, em û welat sipartine dijmin:

*"Mirov tev du qatin û qatek li jor
Hemî tişt ji wan re diriste bi zor"*


*Ji dijmin re bindest û kola û seg
Li ser me dibin şêx û paşa û beg*

*Welat perçe, perçe kirin wek reza
Em û xwe bi hev re sipartin dîza"*
- *Zend-Avista, r. 159* -

Dezga û karxanên çêkirinê di welatê me de nînin, loma em û welatê xwe wilo perçe, perçe man e, li şûn mane û emê hertim di bin destên neyaran de bimînin, eger em xebata çêkirinê pêşve nedin:

*"Welatê ku dezga
I bi pêş de nebî
Ewê tim di destê
I neyaran de bî"*
- *Zend-avista,
r. 98* -

Divê em kar û xebatê bi-kin, xwe fêrbi-kin çêkirinê û ji hesin û avahiya acetan hezbi-kin:



"Ji bo ku welatê xwe pê bidne pêş
Nemînin di nav de, ne zor û ne êş

Ji hasin re milxwar û piştîxûz bibin
Bi çakûç û mêkut, bi serkûz bibin"
- **Zend-Avista, r. 100** -

Cegerxwîn ji welat dipirse:

"Hey welat bo çi perçe perçe
/ maye bin destê neyar
Hakimê xakê te bin, ê wek Sêfîd û wek Beyar
Kurdê hextreş serşikestî,
/ wer bimênî çarkenar
Kuştin û zindan û lêdan,
/ bêne wan tim boks û dar
Hey welat heqê me ye,
/ hê em ji xew nabin şiyar"
- **Helbestên bijarte, r. 40** -

"Welat ta kengî wilo perçe bî ?
Em tev di nav de, jar û şikestî"
- **Ronak, r. 69** -

Baweriya Cegerxwîn bi serbestî û aza-
diya welêt mezin e, û ew dizane, ku wê ji
bin destên dijmin derkeve:

"Welat xeyrî te min navê,
/ meger dînya ku kewser bî
Bi xurtî dê tu serbest bî,
/ ji min êdî tu bawer bî"
- **Helbestên bijarte, r. 72** -

Li ciyekî dî jî dibêje, ku:
"Welatê me Kurdistan, wer namînî ko-
lestan" û ji ber ku bilindî, pakî û rindiya mi-
rovî bi welêt ve girêdayî ye :

"Welat çiqas bilind bibî
Ew qas e jî bilind dibim
Her çend pak û rind bibî
Ew çende pak û rind dibim"
- **Kîme ez, r. 17** -

Ji ber vê yekê Cegerxwîn bang li xort û
lawên Kurdistanê dike, ku bila ewan şerm û
fedî bikin û xwedî li welatê xwe derkevin:

"Welatê te zîndan e, pîr teng û kêr
Di nav de dinalin, hemî kêre-kêr"
- **Zend-avista, r. 134** -

"Ziman û welat û millet perçe bûn
Ji dijmin re hiştin me mal û hebûn"
- **Zend-Avista, r. 111** -

"Ne şerm e welatê te wer perçe bî?
Kirasê hejarî li bejna te bî?"
- **Zend-Avista, r. 111** -
"Were em bi hev re bibin wek bira
Welatê xwe derxin ji destê gura"
- **Zend-Avista, r. 113** -

Divê xurt û lawên kurd bixwênin û hiş-
yar bibin, ku kanibin, rohnîyê têxin welatê
xwe:

"Çi tiştên ku başin, bixwîne timî
Welatê me ronî dîkin ew hemî"
- **Zend-Avista, r. 159** -


Cegerxwîn dibîne, ku eger doz û dax-
waza welatê me wekhevî, hevparî û hevjin
be, wê evîna me yê dîsa şîn bibe, û wê çira
di tariya jîna me de vêkeve:

"Ku rista welatê me bû wekhevî
Hemî kes xwedî mal û zêr û zevî"
- **Zend-Avista, r. 106** -

Lê ew, mîna mirovekî xwedî baweriyek
çînî bû, dibîne ku parçebûna Kurdistan ji dest
çînên jorîn e:

"Ku qata bilind
/ çû, dibin
/ tev bira
Evîna welatê
/ me xweş
/ bi çira"
- **Zend-Avista,
r. 107** -

Bêguman rêya
serxwebûn û
azadiya we-



lêt, li ba **Cegerxwîn** jî ne tenê xwendin û rakirina qata jorîn e, ew jî weke hozanvanekî azadiyê banga şorişê dike, dizane ku rizgariya welatê wî tenê bi şorişê tê. Lew re emê careke din li hozanên **Cegerxwîn** vegerin û li ser ramana şoriş li ba rawestin.

Şoreş û serxwebûn di hozanên Cegerxwîn de

Cegerxwîn di demeka dîrokî ya giring de jîna xwe borand (1903-1984 z.), demeke giring e ji ber ku tevgera gelê Kurdistanê di van 80 salên borî de, di gellek koçberên xwe yê rengareng re derbas bû, û jî aliyekî din ve giringiya vê demê ji guhartinên civakî yê jîna gelê me tê. Bi ser ve jî pêşketina mirovatiyê û serketina gelên cîhanê di jî hêzên koledar û kolonyalîzmê, di va dema dîrokî de, bi xortanî û bi firehî bû.

Di va gotara kin û kurt de, armanca min ewe, ku ez nêrîna **Cegerxwîn** di warê Şoriş û serxwebûnê de bidim ber lêkolînê û derxînim ber ronahiyê, ev jî karekî ne asan e, ji ber ku jîn û xebata **Cegerxwîn**, weke Prof. Qanatê Kurdo di sergotina dîwana **Cegerxwîn** a 5'ê de gotiye:

"**Cegerxwîn** bi rewşa xwe ve, bi efrandinê xwe ve, bi ramana xwe ve, behra bê berî û bê binî ye, gelek girane meriv noqî wê behrê be û bizanibe çi di wê behrê da heye."

Armanca min jî vê gotarê ew e, ku ez ji xwendevanan re diyar bikim, li ba **Cegerxwîn** bîr û baweriya şoreşa serxwebûnê ji destpêka xebata wî ya hozanî ve xurt bû, wî jî serxwebûnê re hozan vehûnandin û şanî gelê kurd kir, ku şoreş bo serxwebûna Kurdistanê rêya wî ye û dîvê xwe jê re amade bike û her tiştekî jê re erzan bike, can û mal û teviya heyna xwe. Lew re ewên ku li **Cegerxwîn** xudan derdikevin û li hember şerê serxwebûnê radiwestin, du caran xwe dixapînin:

Yek- **Cegerxwîn** ne hevalê bîr û baweriyên wan ên şaş û teng bû. Du- Ewan nikarin çi caran xwe bikin hevalên **Cegerxwîn**, jî ber ku dawazên wan û kirinên wan nabin yek.

Prof. Qanatê Kurdo di sergotina xwe de dibêje:

"Di jiyîna **Cegerxwîn** da li nav her çar parên kurdistanê da gelek rojên giran qewimîne, li jiyîna xelqê kurd da gelek caran bûye reşebayî, babelîsk, tofan û baran, lê teht û kelemên serê çiyayên Kurdistanê dabeşkirî li ciyê xwe da mane, ne leqiyane; **Cegerxwîn** jî mîna wan teht û keleman li ser bîr û bawera xwe da bi qayim, berk rawestayê, ji ciyê xwe çep û rast neleqiyaye, ne hejiyaye.."

Heya mirina **Cegerxwîn** 14 afirandinên wî hatibûn çapkirin, ji dîwanan (7), Romana Reşoyê Darê, Cîm û Gulperî, Mîdiya û Salar, Gotinên pêşiya, Destûra zimanê kurdî û du birên Ferhengê. Loma tînêrîna berhema **Cegerxwîn** histobariyeke mezin e, divê mirov xwe jê re amade bike û demeka dirêj têde bixebite.


Cegerxwîn Bi xwe feqîr bû, ji bo ku zikê xwe û yê dê û bavê xwe têr nan bike, ji zarotiyê de dest bi kar kiriye, belengaziya wî di nivîsînên wî de perdeyek ji tariyê û sohtine bi xwe re berdaye û ew di hozanên xwe de gelek caran li ser belengaziya xwe peyiviye, wek:

*"Xanîkî min heye pir kûr e wekî çala bê jen
Dirêjî û panî çar gaz heye bi gazê necar
Li alîkî kûz û mirîşk û nivîn û firaxin
Li aliyê dinê agir û seroşk û*

/ zarok û çend dar..."

-Dîwana yekem, Rûpel 36 -

Lê çavêd wî belengaziya gelê kurd jî didîtin û li her kenarên wî birçî û rêncber bûn, bi wî re kar dikirin û mîna wî bo welatê xwe Kurdistan dixebitîn. Li ser rewşa gelê xwe yê birçî, tazî û



perîşan jî gelek gotiye, wek:

*"Xanîkî kûr, teng, li dor çar dîwar
Li ser wî pûş û li bin best û dar
Sifirne û shirik bi kunc û eywan
Bi kulek û refik, hem bi nêrdewan
Her çar dîwarên wî ji ax û av
Mal û sermiyan zar û zêç di nav..."*
-Dîwana yekem, rûpel 58 -

Ji bil belengazî, zêwirî, birçîbûn û rênc-beriyê, hinde hikariyên din jî li **Cegerxwîn** û li hozanvaniya wî hebûn, berî her tiştekî xweşbûna Kurdistanê, çiya, deşt, zinar, av, dar, mirov û heyînên vê welatî gelek hikariyên xwe li **Cegerxwîn** kirin, ew bûbû dilo- vanê welatê xwe, û em dikarin bêjin, ku ho- zana wî (Welatê min) ew gihandiye bilindti- rîn çîna hozaniyê, destpêka wê ev e:

*"Welatê min ! tuyî bûka cîhanî
Hemî bax û bihişt û mîrg û kanî
Şepal û şeng û şox û naz û gewrî
Gelek şîrîn û rind û pir ciwanî...."*
-Sewra azadî, Rûpel 42-

...û di her hozaneka wî de evîniya wî ji welatê wî re diyar dike, û pir caran wê dike dilbera xwe.

Kurdistan li ba wî kiçek ciwan û rinde, dezgirtiya xortane û li hêviya mêrane, ewên ku amadene di ber wê de xwîne li şûna qe- len bidin:

*"Xemlandîme seranser, dezgirtiya xorta me
Gerden sêvek sor û zer, li hêviya merda me
Qelen xwîn e ne cewher,
/ Kurdistanê kurda me
Bê tang û top û leşker, îro we ez herda me
Kurdistanê delal im, herkes tê min dixwazî
Ez pir şox û şepal im, min deng
/ daye bi nazî
Ev bûn bîst û du sal im,
/ li ser min cengebazî
Kurdo ! wer min bixwaze, belê bi serfirazî"*
- Dîwana yekem, rûpel 4-

Ji aliyê hozanî ve, **Cegerxwîn** weke wî

bi xwe bo min, sala 1974ê li bajarê şamê go- tiye, dema min jê pirs kir:

- Seyda, ciyê we di dîroka hozanvaniya kurdan de li kî derê ye ?

Gote min: " Ez di zincîra hozanvanan de qulpê paşiyê me, ji hozanvanên kevnare (klasîkî), min wilo bidin nîşandan. "


Ew bi seydayên kevnare, di jîna xwe ya hozanî de gelek mijûl bû û xwîna wana ho- zanvanî tev xwîna wî bûye, nema ew ji wan cuda dibe û nema ewan ji wî cuda dibin. Lew re em germiya dilê wî di herdu dîwa- nê pêşîn de bi şeweyekî xort dibînin. Eh- medê Xanî, Mela yê Cizîrî, Feqê Teyran, Perto yê Hikarî û heyânî Mela Ebdilselam (Nacî) Cizîrî pêşkesên wî ne û ji wan fêrbû- ye hozanvaniyê. Wî jî weke wan Hozanên çîrokî gotine û li pey rêç û şopa wan boriye. Ji hozanên wî yên çîrokî: Fala qereçiyê, Serxwebûna mirîşkan, Xurtiya yekîtiyê û h.d.

Di hinde hozanên **Cegerxwîn** de, mîna (Şox û şengê - D1, r.130), (Gazin ji kê? D1, r. 142) û (Sur şîrînê D1, r. 157) mirov şaş dimîne û dibêje, evan ji Melayê Cizîrî hati- ne, ne ji **Cegerxwîn**, ji ber ku ziman, avaki- rina hozanê û heyîna wê, ji ên Mela yê Cizî- rî , bi carekê, nedûrin û di gelek rewşdan û di diyarkirina dêmenan de herdu hozan nola hevin. Lew re em dikarin bêjin, dîwarê ku **Cegerxwîn** milê xwe dayîyê dîwarê çanda kurdî ye, ne dîwarekî biyaniye.

Welat li ba **Cegerxwîn** bûye zîndan û ta- rî, ew nema rûdine û jêre xebatê nîşan dide:

*"Ew welatê wek
/ bihuşt bû, bûye
/ zîndan,
/ kûr û teng
Dîl û
/ gerdenxarî tê
/ de, bê şîbak
/ û pencere"*
**-Dîwan a yekem,
rûpel 21-**

Cegerxwîn
bona welatê



xwe serxwebûnê dixwaze û çî caran bo Autonomiyê dilşad nebûye, û di gelek rîstên wî de daxwaza serxwebûnê tê ber çavan, wek:

"Iro roja xebatê, Serxwebûn e doza we
Dema jîn û felatê, li ku maye soza we ?
Hûn tev şêrên di latê, rovî kete koza we
Şikestîne di matê, dijmin biriye boza we"
- **Dîwana yekem, rûpel 4** -

Cegerxwîn deng li derwêşan dike, ku cîlkên xwe bavêjin û dakevin qada xebatê, bo serxwebûna gelê xwe, ew dibêje:

"Dema xîştî çûye, dema tang û top e
Îrhanê havêje, dijmin qope-qop e
Ev rêça hûn tê de, rêçek xwar û kêr e
Rêça serxwebûnê çî xweş rêç û şop e!"
- **Dîwana yekem, rûpel 43** -

Ew ji kiç û jinên kurdan re jî diyar dike, ku daxwaz serxwebûn e, û divê ewan nola wî bêjin:

"Ez keça kurd, nû gihame,
/ tim dixwazim pêşveçûn
Doz û daxwaza me herdem tac
/ û ala serxwebûn"
- **Dîwan a yekem, rûpel 79** -

Dema Cegerxwîn têgihêşt, ku daxwaza gelê kurd serxwebûn e, êdî rabû deng li gelê xwe kir, ku ji zarowên xwe bo xwendin û zanîne bişînin, wan hişyar bikin, ji ber ku nezanîn dijminê mirov û pêşketinê ye:

"Şev û rojan bixwînin, bibin serbest û zana
Tovê jînê biçînin, ji bo dîl û nezana
Carek hûn dê bibînin van hexe û rezana
Kurdistanê derênin, ji destê van dizana"
- **Dîwan a yekem, rûpel 4/5** -

Lê bi zanîne tenê mirov nikare welatê xwe bistîne, lew re Cegerxwîn dibêje:

"Xorto ! eger tu rabî, wek başokê herî çûk
Ne xurt û şehreza bî, tu nastên ji min mûk
Ne wek şêr û guran bî, bûkê didî bi tûtûk

Ku bê tac û sera bî, tê çawan min bikî bûk?"
- **Dîwan a yekem, rûpel 5** -

Bang li sergeranên kurd dike, ku malê xwe bo rizgariya gelê xwe bidin:

"Malê xwe tev bela kin, ji bo serbestiya kurd
Xwîna xwe tev birêje,
/ ji bin destan tu derkev"

Zanîn û mal û hezkirina welêt jî nebese, divê yekîti hebe, û bo yekîtiyê Cegerxwîn gelek gotiye, em gazina wî di pir deran de dibînin, û di (Serxwebûna mirîşkan) de pir xweşik hatiye ser wê pîrsê. Li cîyekî din dibêje:

"Em destê xwe bidin hev,
/ li ber dijmin bibin yek
Qet zora me nabin, ev dijmin û ev seg"
- **Dîwan a yekem, rûpel 37** -


Bo yekîtiyê dîsa dibêje:

"Gelî kurdan, ji xew rabin,
/ werin carek temaşa kin!
Yekîti qence, pîr başe,
/ di Kurdistanê peyda kin"

.. û ji wê pê ve jî Cegerxwîn bo serxwebûnê û azadiyê tenê yekîtiyê xweştirîn vêt û daxwaz dibîne:

"Bes yekîti xweş divêtin,
/ da ku têk serbest bibin
Min be qurbanê
/ sera û ale
/ rengînê te me "
- **Dîwan a yekem, rûpel 68** -

Cegerxwîn dibîne, ku axa û beg tiştê baş bo gelê xwe nakin û ji wan hene her hevalên dijminin, lew re dibêje:



Pîra Torê

Hilkişîme çûme jorê,

/ herdu rex min bend û rez

Min di pîrek tê ji torê, ker di bin de tê bi lez

Hate nêzik rojbixêrek da û wek

/ min dil bi xem

Pîrebî bû, por sipî bû, taqî reş bû, rû gewez

Min ji pîrê xweş dipirsî:

/ ey metê tu ji ku ve tê ?

Go ji Sîrtê digme Bêrtê, Xûniya Romê me ez

Xan û eywan kirne wêran,

/ mêr û jin serjê kirin

Min go: Pîrê ! qey tu kurdî ?

/ Çûye tilyên xwe bi gez

-Belkî benda rez bi guh bit,

/ dengê xwe pir hilmeke

Pir ditirsim ez ji derbê singuyê Roma teres

- Min digot: axa û beg, wê go:

/ kurê min guh medê !

Ew şivanin, sermiyanin,

/ dane gur wan col û pez"

-Dîwan ayekem, rûpel 45 -

Bo serxwebûna welatê me, li ba Cegerxwîn tiving ciyekî giring distîne:

"Werin dîsa ji xew zû hûn şiyar bin

Digel rex û tifîngên xwe li kar bin

Bikin cengê digel dijmin hero zû

Heta ku em bibênin ew vera bû...."

-Dîwan ayekem, rûpel 22-

Ew gazî li hemî kesên welatî û xwedî namûs dike, ku rêzên xwe bikin yek û bo gelê xwe dakevin qada xebat û şorişa netewî:

"Te divê ku ew bibin mêr

Xwedan text û tac û zêr

Bi yek can û dil û deng

Digel dijmin bikin ceng

Tevde bidin soza xwe

Zû bixwazin doza xwe

Wekê mêra bibin yek

Bi dest bigrin gurz û çek

Li ser çiyên bibazin

Doza xwe tim bixwazin

Ji Kermanê ta Ferat

Mûsil bigrin ta Xelat...."

-Dîwana yekem, rûpel 42-

Em dibînin, ku wî her çar parçeyên Kurdistanê di vir de bi nav kirine, bi lêvkirina çar navan: Kerman, Ferat, Mûsil û Xelat.

Ew di dû re dibîne, ku ji wa hêza yekîtîyê re serokatîyek, deselatîyek pêwîst e, ew dibêje:

"Yek serdarê xurt û jîr

Li cem rûnin çend wezîr

Ji bo kurd û Kurdistan

Ava bikin dibistan

Da bixwênin keş û kur

Çêkin top û balafir

Xwendewarên qenc û baş

Li pêş leşker bikin marş...."

-Dîwana yekem, rûpel 42 -

Wilo ew rêya rast dibîne, rêya ku tê de serokatîyeka xurt û jîr hebe, ji gelê xwe re dibistana şorişê veke, xort û keçan têde fêr bike xebat û têkoşînê.. û bi wê serokatîyê re xwendevan, rowşenbîr û zanayên baş û qenc hebin, di pêşiya leşkerê serxwebûnê de herin, ne li pey tevgerê an jî li dij wê.



Cegerxwîn Li Diyarbekirê Hişyar Bû

• Mehmet Eren


Elbet ez zêdetir nikarim gotinên mezin, şiroveyên kûr li ser Seydayê Cegerxwîn ê nemir bikim. Ev yek ne karê min e jî. Ev, karê hozan, şaîr, nivîskarane, karê hemçaxê Seyda ne. Lê ez tenê dikarim, wek xwendevanekî dilsoz ê berhemên Seyda, çend gotinên piçûk bikim.

Carek di vê nivîsarê de ez dixwazim ku bal bixşînim ser aliyê Cegerxwîn yê Diyarbekirê. Gelo seyda çiqas li Diyarbekirê geriya ye? Çi li ser nivîsiye? Gelê Diyarbekirê ji bo wî çî gotine û nivîsîne? Nuha li Diyarbekirê hezkirina Cegerxwîn û xwendina berhemên wî di çî merhelê de ye? Ji bo vê yekê hinek nivîskar, xwendekar, mela û hinek pirtûkfirosê dê fikrên xwe diyar bikin.

Seydayê Cegerxwîn di xortaniya xwe de jî ber ku xwendina xwe ya olî di medresan de bixwîne, gellek bajar hêl û herêmên Kurdistanê geriyaye. Di vê gera xwe de rewşa gelê Kurd ji aliyê siyasî, civakî û aborî de dîtî ye. Pê agahtar bûye. Ew bûye şchedê bindestî, jar û perîşanî, zilm û zordestiya ku li Kurdan hatiye kirin. Ev yek li ser wî gellek tesîr kiriye. Xwestina wî ya li hember neheqiyê bilind bilind bûye. Çara yekem di wan temenê xortaniya xwe de evîna welat dikeve dilê wî. Ev evîn, roj biroj xurtir û bilintir dibe. Ev evîn, gihîştîye qonaxeke wusa ku êdî bi dergekî bilind qîrîye û gotiye: "**Bê te hêcim welat**" û kar û xebatên xwe bê rawestan ajotiye û hetanî dawiya temenê xwe neskiniye.

*Welat, çiqas bilind bibî
Ew qas çî bilind dibim
Her çend pak û rind bibî
Ew çende pak û rind dibim.*

*Serbest bijîn bajar
û gund
Kurd tê de rûnin
serbilind
Wek Feylesûfê
Çîn û Hind
Bi rûmet û mezin dibim
(.....)*



Elbet Seydayê Cegerxwîn wek ronakhîr û Şaîrekî Kurd, zêdetir giraniya xwe daye ser hişyarkirina gelê xwe. Û di vî warî de qelêma xwe lorandiye. Wî dizanibû sedemê bindestî û perîşaniya gelê xwe. Li gor wî gellek sedemên vê yekê hebûn. Lê ew du dijminên herî mezin nîşandide û dibêje; **"Me heye du dijminin mezin, yek nezanî ya din xizanî ye."** Ji ber vê yekê ji qonaxek bi şûn de, li hember her şêwe kevneperestiyê derdikeve. Ew naxwaze bimînin hov û har, ew dixwaze bibin zana û pêşverû û weha dibêje;

*Şêyxê min destên îdî maçî nakim ez bese
Kavil û wêran te hiştin ev sera û medrese
Şêyxê Ewrûpa binêre, wane hesin birîne jor*

*Em xîst û def û dîlan, paşketin tev mane kor
Her keşakî deh zimana zanî rengê eflatûn
Em çima hov û nezanin, ser di ber de paşveçûn
(.....)*

Cegerxwîn di pêvajoya jiyana xwe de di qonaxên gellekî dijwar de derbas dibe. Ew jî wek gelê xwe gellekî zulm û zordestiyê dibîne, tê nefîkirin û girtin. Lê tucar riya rast bernade. Ew dibêje; **"Em ji rê dernakevin, çendî bibînin zulm û zor"** Dide ser rê û ji ser dernakeve.

Cegerxwîn di jiyaneke dûr û dirêj, dagirtî û serfiraz de ne tenê bi kar û xebat, her weha berhemên giranbûha jî afirandiye û li peyî xwe hiştiye. Lê sed heyfe ku ev berhem baş nehatine famkirin, xwendin û belavkirin. Her çiqas ji destpêkê heta nûha li hundirê welat **Weşanên Dengê**, li dervayî welat jî **Weşanên Roja Nû** di vî warî de xizmeteke baş kirinbin jî, elbet ji bo danasîna Cegerxwîn û berhemên wî ne bes e. Divê carek hemû partî û saziyên Kurda li Cegerxwîn û berhemên wî xwedî derkebin, wan bidin danasandin. Ji bo vê yekê divê li dervayê welat û li hundirê welat konferans, panel û civînên cur be cur bên bi dar xistin. Li gel vîya divê berhemên wî li gellek zimanên biyanî bên wergerandin. Bi minasebeta sedsaliya Cegerxwîn her Kurdek dikare bi dil û can wî helmêzke û bihevîn e.

Elbet Cegerxwîn wek ku li pirraniya gund, bajar, hêl û herêmên Kurdistanê geriya ye, li gund, navçe û bajarê Diyarbekirê jî geriya ye.

Ew gera xwe ya li Diyarbekirê weha qal dike:

"Min li Diyarbekirê çî dît"

Seydayê Cegerxwîn di beşeke jînenîgariya xwe de weha behsa dîtinên xwe yê Diyarberê dike;

Kela wî ya pirr bilind û heybetlî heye. Ev keke cî cî qul bûne. Di van qulan de zarok diçûn û dihatin. Di nav kelê de depoyeke eskeriyê hebû. Tirkên, xwestine ku **Deriyê Merdî-nê** yê kelê helojîn û fireh bikin. Lê bi ser neketine. **Mizgefta Ûlû** ji derve ve pirr esîl xwiya dike. Li rex wê medreseyên wêrane hebûn. Lê yên ku hêna wêrane nebûbûn ku dihatin karanîn jî hebûn. Mizgeft bi xwe hatibû nû kirin. Li ser **Robarê Diclê** pireke mezin hebû. Gelo çend lingên wê hebûn min nejmart. Ji bo bajar, ji **Elîparê** avê hanînbûn.

Zebeşên Diyarbekirê gellek bi nav û deng bûn. Pirr mezin bûn. Digotin; "qatirek bi zor dikare du heba helgire." Mizinbûna petêxan jî ji yên zebeşan kêmtir nebûn.

Zarokekî ser rût û çav teraxom nan difiroto û digot; "Nanê germ, nanê teze! Vî nan î min nepêjandiye, bavê min pejandiye, wele bavê min..."

Li Mehkemeya Diyarbekirê

Qasî ku salix didin. Ji Cegerxwîn re rojek bûyareke balkêş tê qalkirin. Ew bûyara ku di Mehkemeya Diyarbekirê de derbas dibe weha tê qalkirin.


Bi navê **Şêx Şemseddîn û Şêx Nûredîn** du bira hebûne. Her du şêx jî di wê herêmê de bi nav û deng bûne. Rojek bavê wan mirî ye. Du jinên bavê wan hebûne. Yek dê, yek damarî ye. Damarî gellek xweşik û can bûye. Ji birayên **Şêx Şemseddîn** ji damariya xwe hezkirîye. Birayê din **Şêx Nûredîn** bi vê yekê dihesa. Jê dipirse û dibêje:

-Ez bi tiştêkî weha hesiya me. Gelo rast e ya na?

Birayê wî **Şêx Şemseddîn** jî dibêje:

-Belê rast e. Nuha necariye. Ez jê hez dikim.

Şêx Nûredîn dibêje:



-Tişteki weha di dînê(ol) me de nayê qebûlkirin. Di tu dînî de jî qebûl nabe. Dev ji vê jinê berde. Em li gel te ruswa bûn.

Şêx Şemseddîn dibêje:

-Ez bêy wê deyax nakim. Nikarim dev jê berbidim.

Li ser vê yekê birayê wî, Şêx Nuredîn tê Diyarbekirê û ew dide mehkemê. Mehkeme ban wan dike. Dadger ji Şêx Şemseddîn dipirse û dibêje:

-Hedîseke weha heye, Tu çi dibêjî?

Ew jî dibêje:

-Belê rast e.

Dadger dibêje:

-Ne zagonên (qanûn) me, ne jî dînê me hedîseke weha qebûl nake. Ji ber ku tu şêxî divê tu li wayek ji me re bînin. Ya em ê te bikujîn.

Şêx dibêje:

-Fitwa min heye.

Dadger dibêje:

-Ka fitwa te çi ye?

Şêx dibêje:

-Fitwa min ev e. Min ji devê diya xwe bihîstiyê. Diya min gotiyê: " di felan tarîxê de rojek havê te ne li mal bû. Xulamekî me yê pîr çeleng hebû. Min bang li wî kir, anî malê. Ez bi wî re raketim. Ez wê şevê bi hemle mame. Tu ji wî xulamî yî" Yanî ez ne birayê wan im.

Mehkeme jî jê re dibêje:

-Divê tu testîq bikî.

Şêx jî du sofîyên xwe nîşan dide. Mehheme ji her du sofîyan dipirse û dibêje:

-Rast e ya na?

Sofî jî sond dixin û dibêjin:

-Me ev hedîse ji devê diya şêx bihîstiyê.

Mekeme ji şêx re dibêje:

-Tu karî jînekê li xwe mar bikî. Lê belê tu ji mîratê havê xwe mahrûm î, mafê te, tê de tune ye.

Şêx dibêje:

-Ez qebûl dikim.

Li ser vê yekê Şêx Şemseddîn ji aliyê mehkemê ve serbet tê berdan. Wextê ku vedigerin malê, Şêx Şemseddîn dibêje:

- Ji bo ku ez ji mehkemê canê xwe xelasim, min derew kir. Tiştên ku min û sofîyan got, gişt vir bûn. Ez jî birayê we me.

Paşê Cegerxwîn di derbarê vê hedêse de weha dibêje:

-Li gel vê hedîsa nexweş, disa di wê herê-mê de şêxê herî welatperwer ew bûn. Ji bo welatperweriya wan hurmeta min ji wan re heye.

Paşê Şêx Şemseddîn jî di serhildana Şêx Seîd de tê dar de kirin.

Li evîna welatê xwe hişyar bû.

Gelo we dizanibû ku Cegerxwîn cara yekem li Diyarbekirê, li evîna welatê xwe hişyar bûye. Dîsa qasî ku Cegerxwîn di Jînenîgariya xwe de qal dike. Ew cara yekem li **Qarejdaxa (Çiyayê Reş)** Diyarbekirê li ser ku hedîsek di serî de derbas bûye, li evîna welatê xwe hişyar bûye. Kurdatiya wî bêtir kemilî ye.

Cegerxwîn rojek ji Dêrikê diçe Qerejdaxê mêvaniya **Çûço Axa**. Çend roj li wê derê dimîne. Rojek berê êvarê du kesên siwarê hespan li derê konê Çûço Axa peyda dibin. Her du siwar yek **Şewqî Beg e**, yek jî birayê wî **Evdila Beg e**. Ew ji **Erxenîya Diyarbekirê** ne. Her du bira jî qaçax û firarê dewletê ne. Ji ber şerê Şêx Seîd dewlet li wan digere, ew jî revîne xwe sipartine Çiyayê Reş. Mêvanên Çûço Axa ew şev radizên. Serê sibê, ji mêvanan Şewqî Beg, bi destê Cegerxwîn digire û hinek ji malan dûr dikevîn. Şewqî Beg dest pê dike, dûr û dirêj qala xwe, şer, Kurdan û xelasi û azadiyê dike. Li ser vê yekê Cegerxwîn jî sûnd dixê û soz dide ku wê ji nuha pê ve zêdetir doza welatê xwe xwedî derkeve û bixebite.

Cegerxwîn weha qala vê bûyarê dike;

- Ez di sala 1924an de li ser vê bûyarê û bi saya Şewqî Begê Erxenî hişyar bûm. Tê bîra min ku bîr û baweriyên min ên Kurdayetiyê zêdetir kemilîn, bawerîya min xurtir bû, min fikrên welatperwer naskir. Piştî ku min Şewqî Beg naskir, êdî min **bi Erebi** helbest nenivîsand. Min dest pê kir hemû helbestên xwe **bi Kurdî** nivîsand. Lê di vî warî de zêdetir agahtariyekê min a kûr jî tune bû.



Ez Şagirtêkî Te Me

• Arjen Arî*

Ez şagirtêkî te me.

Şagirtêkî li ser axa ku tu pê şa nebûyî, dil bi qasî axa helbesta te bi êş...

Her rist bi dû qedandinê de ji min re dibêje, "Tu ê bikşînî mîna wî! Tu ê bi dû êşkêşiyê de xwe bibînî!"

Afrînerî gelo qolinek e? Qolinc in gelo mizgîna zayînê?

Ha Seydayê min, ha Seydayê evînê: ji şîrên xwe yî kul-neva pê ve, te çi hişt ji min re?

Li ber destê te, ji te hînî dirûna ristan bûm. Ji rahijîna xameyê risasî destê min tîştî, dilê min dilê min dalekî şîre, li ber kaxiza kitan-spî lal bû, bê zar bû...

Kengî ku dil çav li hezkirîya te kir, di wê kêlikê de te, te kir ku dil bidim erdnîgareke kiras-meleşî...Erdnîgareke rû-ya, bejin-yar; ji min û te pê ve dojecha her kesî!

Tu:

Mahrîrîrê Salar û Mîdya.

Mahra te kê bi agir re birrî?

Berî te: berî ku şîrikê mêranîyê di rehên laşê te bigere û te bi mêranîyê bihesîne, hinekan: hinek ê ji te ve rû nas, bejinnas, fêlnas... destên xwe yî bi hêsrên qîzaniya Sason şûştî, dirêjî çend gerdenên bi şahnik ê qîzên li heviya yar û pismaman kirin..?

Yara me:

Sedemê jiyîn, mebesta li ser ling mayîna me...

Yara me:

Yara ku derdawên wê ji dest avêtinan zîvar zîvarî!

Yara ku Mehabad ji ber çûyî

Yara ku li Rojhilata Naverast rahbika bêdêr,

Yanî Seydayê min di nava teşkên Dicle û Firat de axa bi xwîn; xak bi xwe!

Ji helbestê te:

Êger sêncî rez û baxan .

Çîrand û dest biçne sêvan

Dibe lêv herne ser lêvan

Li min megre ku sêwî me...

Ecey ê bêxak!

Ecey ê bêyar!

Ecey ê heza xak û yarê di ristên helbestê de kir berberî!

Tu ê sêwî herî!

Çil sal e di devê min de 'sêwî' tiya te bû dûrikeke bêlûte..

Bi saya te Seydayê min, bi saya te min jî dil gorî axekê kir!

Di zevîyê helbelstên te de ez ê pale, hê jî qefil-kêşê çarînên te me...Di ber re ber re, xwe xwe, di ber xwe de derwêşkî dibilînim car-caran qesîdeyeke te yî jibûrbûyî:

Ey felek mala te nava bo çi sergerden kirim

Rengê lîndê dil disojim, tevde pêt û agir im...

Di dojecha helbestê de bişewite, erê?

Di qada şer de peyv bû şûrê te! Ji te hîn bûm ku bextewarî li ser vê xakê bi qasî xwezîyên te ji min jî dûr e. Û min kir û nekir; bi qasî te nebûm xwedîyê bêndereke helbestî. Li hêlekê gidîşên Qesîdeyî, li hêla din lodên Xazelan. Adana heştê salan: Heşt Dîwan...

Û helbest rist bi rist bi pîkolî, malik bi malîk bi kêferatî, ji qulzema dilê te evîna welatekî bêwestan, bê wehêsan, şetikî diherike...

Di sed saliya te de erdnîgarek bi zimanê te tê ziman.

Û dîrokeke bindest bi zimanê xwe û te hildiperike ezman!

Seyda ez şagirtêkî te me!

* Ş a î r



Cegerxwîn Kirine Tenekeyeke Vala

• Recep Dildar*

Kurdan Cegerxwîn kirine tenekeyeke vala û kî dihere û tê çoyên xwe lêdixin, edî ew û şensên xwe çiqas deng jê derkeve.

Ya rastî Cegerxwîn ne tenekeyeke vala ye. Lê kûpeki têra xwe tije ye. Û diser de diqelibe. Çi heyfe ku tu kes devê wî kûpî venekirine û lê nanêrin, hela çi tê de ye. Gelo rûnê nivîşkî an dîms tê de ye an jî tije hunguv e ku meriv tiliyekî tenê pê serxweş dike.

Li bakûr û bi taybetî jî li Amedê, rewş weha ye. Herkes navê Cegerxwîn dizane lê pir hindik kes dizanin ku wî camêrî, çi kiriye, çi xwestiye, fikir û ramanên wî çi ne? Nîfşên berî sala 1980î hinek wî dinasin. Lê nîfşên nû jê gelek dûr in.

Dema xort dikevin pirtûkxanê û çav li pirtûkên wî dikevin. bikêf nîşanî hevûdu didin. Lê dema sitendinê helbestên tirkî distînin û derdikevin. Hinek xwe şaş bikin bistînin jî ez ne di wê baweriyê de me ku ew ê li mala xwe rûnên û tîr û tije bixwînin.

Bi rastî jî ez pir merak dikim, gelo çend Kurd dizanin ku Cegerxwîn ji bo welat û milletê xwe çi fîdekarîyê kiriye. Eger Cegerxwîn dev

ji melletiyê ber neda ya bi vî êş û zanabûna xwe ew ê di demek kinde gelek dewlemend bibûya. Lê wî rîya zahmet da ber xwe û eş û elema milletê xwe kişand.

Cegerxwîn ji bo welatekî serbixwe û neteweke azad ket ser rê. Li ser dinê biratiya millêtan dixwest û ser welatê xwe jî wekhevî dixwest. Ew merivekî komînîst bû û heta mir jî komînîst ma.

Ji bo Cegerxwîn baş bê naskirin, divê herkes her malbat û her sazî ji aliye xwe ve wî bixwînin û bidin nasîn. Kesên dest bi xwendina Cegerxwîn bikin ew ê bibînin ku ew deryayeke mezin e. Meriv jê tîr nabe. Heta ew baş neyê naskirin, helbestên nîfşên nû wê zêde kok bernedin.

Di sedsala Cegerxwîn de ez çavên xwe li stiyê keçan digerinim ku qolyetê wî bibînim. Li sîngê xortan de digerinim ku rozetê wî bibînim. Di vî havîva germ de li ser tîşortan wêneyên wî bibînim. Tîştekin din jî bibêjim, ma kesên ku wêneyên Cegerxwîn di mala wan de tune be, ka çewa Kurd in?

**Xwediyê pirtûkxaneyê Humerê Li Diyarbekirê*

Ew ji bo Kurdan ferhengokek e

• Serkeft Botan*

Cegerxwîn di xortaniya xwe de ketiye nav xebatê. Bi êşa welatê xwe hesiya ye. Ew pirr ji kambaxiya xizaniyê kişandiye. Ew mirovek pirr bi hêz bûye. Heta ku ji wî tê li ser êş û ezayê xelqê sekiniye.

Bi rastî kî jî di çiyê wî de bûya, dê weha bi hêzbûya. Xizanî û bindestiya gelê wî, bîr û baweriyê wî xurtir dike. Bexwedana wî tekûztir dike.

Ger ev yek ne bûya, Cegerxwîn dikaribû bi-be dewlemend. Lê ew nekîr ji bo azadiya gelê xwe bi rê ketiye.

Ew hetanî Rêxistina Xoybûnê oldar bûye. Paşê derbasî hevdehiyê bûye. Cegerxwîn li gor hevdehiyê xwe ne di qadek baş de ye. Ew ji bo Kurdan ferhengokek e. Kurd pirr tîşt jê hînbûne.

Cegerxwîn ji ber ku gellek tîşt di rê de ne-


çûn e, sîtemkarî kiriye.

Bû mela yê Xizna Jorîn

Elo, Celo kum bi qul. Li ser wî nirxên zexim ne kirine. Ne rexne hene, ne nirxandin... Divê hebin. Berhemên Cegerxwîn sê payê wan mela dixwînin. Hunera wî zêdetir mela têdigihên. Yê ku ri-hê wan ên netewî hene dixwînin.

Bi min xwendina berhemên Cegerxwîn ne bes in.

**Helbestvan*



"Xwedê wî ji dergayê xwe avêt"

• A. Kadir Çaxer

Dîrok sala 1953an, demsal bihar bû. Ez hêja heft salî bûm. Bi bavê xwe re çûbûm berberoşkê Mala Keya, baran bariya bû. Her der bûbû herî, cot û kar nedihate kirin. Mêrên gund li berberojik rûniştibûn. Li ser ol, şêx, meleû seydayên mezin dipeyivîn.

Li ser van mijûlayiyan, di van vê civatê de bi navê **Salihê Hedê** zilamekî kal hema dest avête singê xwe, hêjand û got: "Xwedê merivan bisitirîne. Ma seydayek ji **Mele Şexmûs** (Cegerxwîn) mezintir hebû? Xurifî, Xwedê wî ji dergayê xwe avêt."

Ez wê demê cara yekem bi navê Şexmûs

(Cegerxwîn) hesiyam. Ev yek di serê min de bû pirsgirêk. Mele Şexmûs Kî ye? Cegerxwîn kî ye? Derge û avêtin çi ye? Xurfandin çi ye? Eger min çiqas ji bavê xwe pirsî bersîva min ne da.

Heta ku dîrok bû sala 1968-69an hêj nû min Mele Şexmûs (Cegerxwîn) nas kir. Ku wî jiyana xwe ji bo serketin û azadiya gelê xwe buhartiye û hên berdewam dikir.

Heta nuha gelek dem û dewran derbas bû. Min wî baştir naskir. Ez têgihîştim ku wî tenê berjewendiyê gel û welatê xwe ji xwe re kiriye armac

Nasandina Cegerxwîn ne bes e

• Yucel Daxtekîn*

Li Amedê eleqadariya li ser berhemên Cegerxwîn li gor kitêbên Kurdî yên din û li gor yên Tirkî baştir e.

Li Tirkîyeyê ji destpêka weşandina kitêbên Cegerxwîn heta niha -li kitêbxaneyê me- ji kitêbên din zêdetir hatine firotin. Di gel vî ya li cihek wek Amedê ez dişa jî firotina berhemên Cegerxwîn tîr nabînim. Ez bawer im sedema vê yekê ew e ku kêm kes dikare bi Kurdî bixwîne û binivîsîne.

Ji bo danasîna Cegerxwîn û berhemên wî mirov dikare gelek çalakî li darbixe. Di salvegerên wefata Cegerxwîn de mirov dikare bi civînên girseyî wî bi bîr bîne. Di civînên weha de mirov dikare şair, nivîskar û ronakbîrên biyanî jî beşdar bike. Di vê merhelê de wezîfa herî mezin dikeve ser milên şair û ronakbîrên Kurd. Lê mixabin di vî warî de xebatên pêşçav tune ye.

Ji ber mercên taybetî yên ku em tê de ne, derfetên me yên xwendin, nivîsandin û pêşdebirina ziman û çanda Kurdî tune ye. Sedemê vê yekê ya sereke qedexekirin, asteng û bendên li pêşîya fêrkirina zimanê Kurdî ye. Li gel vê yekê jî berhemên Cegerxwîn di nav Kurdan de ji şairên Tirk wek **Nazim Hikmet** zêdetir tê xwendin.

Ji ber ku bi rîya çapemeniyê danasîna şai-

rek wek Cegerxwîn qedexe û diwar e, ew di nav Tirkan de nehatiye naskirin. Lê ger derfet hebûna, ez bawer im wê ne tenê li Tirkîyeyê wê li hemû dinyayê bihata naskirin. Ji bo danasîna Cegerxwîn divê li welat û dervayê welat kitêbên Cegerxwîn li zimanên biyanî û li zimanê Tirkî bîr wergerandin.

Di warê naskirina Cegerxwîn de şairên Tirk xwedî cyb û kêmasiyeke mezin in. Ji ber ku ew jî bi kirinên xwe dibin şîrikê zihniyeta qedexekirin û ideolojiya fermî. Li himber zordariyên li ser ziman û çanda Kurdî bêdeng dimînin, di kovar û civînên xwe de qet qala ziman, çand û edebiyata Kurdî nakin.

Divê şair, nivîskar û ronakbîrên Kurd xwedî li ziman û edebiyata Kurdî derkevin. Ger xwedî dernekevin ne mumkun e ku şairek wek Cegerxwîn nasbikin û wî fêmbikin.

*Xwediyê
Pirtûkxaneyê
Dîlan Li Diyarbekirê



Rola Weşanên Dengê...

• Mahmûd Çetîn*

Li hember hemû qedexekirin û berhevkinê, ji ber ku berhemên Cegerxwîn derxwistin pêş, bi awayekî berfireh danasandin, di navbera gelê Kurd û Tirk de birayeti û dewlemendiya çandî pêk aniye, divê Weşanên Dengê bê pîrozkirinê.

Di sedsaliya Cegerxwîn de di festîvala Diyarbekir de bi çalekî û panelan bîranîna Cegerxwîn, ev yeka ku xortan digotin: "He-

val" û gulên Cegerxwîn bela dikirin meriva kêfxweş dikir.

Di pitûkxaneyê me de jî eleqedariya ji bo berhemên Kurdî zêde ye. Xasîma jî ji bo yên Cegerxwîn...

**Xwediyê Pirtûkxaneyê Ûrartû Kelepîr
Li Diyarbekir*

Cegerxwîn bûye sembolek

• Songul Keskin*

Li Diyarbekirê û li vê herêmê berhemên Cegerxwîn baş tên firotinê. Cegerxwîn di nav Kurdan de baş tê naskirinê.

Xwendevan li her şêwe berhemên Cegerxwîn eleqeder dibin. Ji ber ku wî li ser her mijarê nivîsandî ye. Ji ber vê yekê ye ku Cegerxwîn di nav Kurdan de bûye sembolek.


Cegerxwîn qasî ku tê naskirin, ew qas berhemên wî nayên firotin. Lê berhemên wî, li gor berhemên Kurdî yên din zêdetir tên firotinê.

Ji bo ku Cegerxwîn û berhemên wî zêdetir bîrê danasandin, divê berhemên wî li gelek


zimanên din bîrê wergerandin.

Ciwanên Kurd qedir û qimeteke baş didin Cegerxwîn û berhemên wî

**Xwediyê
Pirtûkxaneyê
Avesta Li Di-
yarbekirê*



Çapkirina berhemên Cegerxwîn û Weşanên Roja Nû



● Haluk OZTURK

Şair û nivîskarê bi nav û deng Seydayê Cegerxwîn di sala 1979-a de ji Kurdistana Surîyê derket û hat li Swêdê bi cî bû. Wî jî-yana xerîbîyê bijartibû ji bona xatirê ku bika-ribe li vî welatî pirtûkên xwe bide çapkirin. Ji ber ku li welatê wî, li Kurdistana wî ya ezîz hertiştêkî kurdayetiyê qedexe bû, çapkirina pirtûkên kurdî, rojname û kovarên kurdî jî. Di destê Cegerxwîn de bi dehan berhemên wî yên neçapkirî hebûn û li benda çapkirin û belavkirinê bûn.

Di eynî salê de ez jî hatim Swêdê. Min Seyda li cem hevalên Riya Azadî (û KOMKARÊ) dît. Berê min wêneyê wî di rojname ROJA WELAT de dîtibû. Pê re hevpeyvînek kiribûn. Dema min bi destê wî girt û kêfxweşî dayê heyecanek kete dilê min. Ew navê mezin ku di zarotiya me de mellayên welat-

parêz behs dikirin, ew mellayê sosyalîst ku Şivan Perwer helbestên wî bi strankî ji mille-tê kurd re digot aniha li cem min, li pêşberî min rûniştibû. Min xwe bextiyar hîs dikir. Dûra ez jî bi hevalên KOMKARÊ re, di serî de bi Salih Înce û Hanefî Celebli re ketim nav proja çapkirina kitêbên Cegerxwîn. Hingê Roja Nû di formata rojnameyekî de bi kurdî û tirkî derdiket. Ez û Seydayê Cegerxwîn jî ketin nav desta nivîskarên rojnamê. Hevkariya me herwisa di mîzampajkirin û çapkirina çend hejmarên rojname "Gulistan" de jî hebû. Ev weşana peryodîk, organeke Partiya Pêşverû Ya Kurdên Suriyê bû û li dervayî welat derdiket. Cegerxwîn berpirsi-yarê wê bû.

Di sala 1980 de me di nav Weşanên Roja Nû de, dîwana Cegerxwîn ya çaran bi navê

"RONAK" çapkir û belavkir. Heta wefata wî, sala 1984-a me çar dîwanên wî çapkirin: "Ronak", "Zend-Avista", "Şefaq" û "Hêvî". Kurdên Ewropayê, xasima yên ku piştî Cunta Faşîst a Tirk derketibûn dervayî welat ev pirtûk ji destê hev direvandin. Yên din jî di rê de bûn... Cegerxwîn dizanibû êdî ew proje serketi ye. Piştî wefata wî jî em li ser derxistina pirtûkên wî berdegambûn. Heta niha heşt (8) pirtûkên Cegerxwîn di nav Weşanên Roja Nû de ronahî dîtine. Hêjayî gotinê ye ku hin ji van berhemên li Istenbolê di nav Weşanên DENG de jî careke din hatine çapkirin.

Belê Cegerxwîn li Stokholmê jî karê nivîsandinê berdegam dikir. Lê wextê wî ji bo xebatên din jî hebû. Di çar salên dawiya jiyana xwe de li gelek welatên Ewropayê geriya, tevî şahiyên Newrozê bû, komcivînan KOMKARê de wek endamê şerefê gotar xwendin, avakirina Enstîtuya Parîsê de beşdar bû, û di meş û mîtîngên kurdan de wek mîlîtanekî dimeşîya, li dijî sefaretên dewletên dagirker bi gencan re dengê xwe bilind dikir.

Cegerxwîn ronakîrekî kurda yê sedsala bîstan e. Ronakbîrekî wisa mezin e ku navê wî wê di dîroka kurdan de, di edebiya-


ta kurdî de û di tarîxa şiyarbûna neteweyî de herdem bête bîranîn. Dibêjin lê; herkes kurê zemanê xwe ye... Cegerxwîn jî kurê zemanê xwe bû! Dibe ku ew hinekî ji zemanê xwe jî pêştatir bû... Melayekî kurda yê pêşverû bû, yanî zanayekî kurda bû yê ku dixwazt dem û dinyayê fehm bike û bi civata xwe bide fehmkirin, û riya rast nîşanî milletê xwe bide... Wî bi dîtin û fehmîdariya sosyalîstiyê pêşketina milletê kurd dixwazt. Lewma şaşik û cube ji ser xwe avêt û bi dehsalan li dijî nezaniyê û zordestiya mîllî şer kir. Hertim hêviya xwe ji bo Kurdistanê Azad zindî hîşt. Xebata xwe domand heta roja mirinê. Lewma wî di dilê milletê kurd de ji xwe re cîyekî germ çêkirîye. Ew ê heta-hetayê di wira de bijî.

Wek me got Cegerxwîn, bê rîza dilê xwe ji gelê xwe ji welatê xwe qetîya bû. Wî dixwazt berî mirina xwe keda xwe ya sal û zemanan çapkirî bibîne. Wî ew hêvî û daxwaza xwe bi cî anî. Wek KOMKAR û Roja Nû em pê kêfxweş û serbilind in ku wezîfa derxistin û belavkirina berhemên Seydayê Cegerxwîn bû para me.

Em di 100-saliya Seydayê Cegerxwîn de careke din wî bi rêz û hurmet bi bîr tînin.



Ji Pêşgotinên Pirtûkên Wî



Ji pirtûka Cîgerxwîn ya bi navê Folklor Kurdî

FOLKLORA KURDÎ **—Kurmancî—**

Bê gomanê ko dewlemendî û mezinahîya zimana bi folklor û rewş û pergala tore, rist û nivîsarên wa ye.

Çi zimanê ko folklor û tore têde fireh û mezin bûne, ew ziman, zar, şîwe ji zimanên mezin têne jimarîtin. Her wekû pêşveçûna dezgeh û jîna civakî jî, yek ji van tiştan e, ko ziman pêşve dibin û fireh dîkin. Lê ji ber ko, em, niha di dabaşa folklor da ne, dixwazin vê dabaşê bidin xuyakirin.

Di vê meydanê de zimanê kurdî — zarê kurmancî- gelek dewlemend û mazin û payedare. Ji her nîşî helbeste, lawik, heyran, istiran, serpêhatî, çîrok û lîztik dagirtîye. Kurd ji bîçûkayî de, zarokên xwe hîn van tiştan dîkin. Hê di pêçekê de, dê, ji wan re dilorênî û dîrok, istiran û çîrokan dibêjî. Di bere dinawirênî ji lewra çawa çavê xwe vedikin û zimanê xwe digerin, dest bi rist û hûnan û istiran dîkin û bi

her tiştî dilîzin û di şevbiwêrkên xwe de hîn van tiştan dibin. Ji lewra dibênin, ko zarokên Kurd xudriste, hozan û hişyarî, dengbêj û çîrokvanin.

Lî pir cihê axîne, ko heta Sedê Bîsta jî, tiştekî hêja di vê meydanê de nehatîye çêkirin, nehatîye nivîsandin û belavkirin. Belkî jî, nehatîye bîra kesî, ko herê xwe bidin vî karî û karêkî bi rûmet ji welat û gelê xwe re bikî.

Tenê di vî Sedê Bîtsem de çend nivîst bi zarê kurmancî li Ermenîstana Soviyatî hatine belavkirin. Çawa, kol i nav kurdî Îraqê zarê soranî jî destek neviştên hêja hatine çapkirin.

Tenê kurd, pirên kurd nikarin ji van nivîstan kareke hêja bikin, herwekû nikarin bi tevayî rewş û pergala zimanê xwe û folklorên xwe nasbikin. Ji ber ko, kurd, hemî ne bi şîwakî tevayî dixwênin û dinivîsin.

Ji lewra, di îro de, gereke bi herdû şîwan hemû nîşên xwendewarî bête çêkirin û gotin û nivîsandin û belavkirin heta, ko rojekê karibin herdû şîwan bikin yek û bighênin hev.

Her çiqas şîweyê sorî bi pêşve herî jî, lê nikarî daxwaza xwendewarên kurd bi pirî bîcîbênî. Ji ber ko, ne weke şîwê kurmancî dewle-

mend û firehe, çawa ko di hindameke pir bi-çûk de hatiye givaştin, ko ji sedî bîst kes nika-rî jê hîn bibî û daxwazê nadî naskirin.

Belam şîweyê kurmancî, tevî koz êde dewlemende û her nîfşên tore, helbeste, la-wik, heyran, serpêhatî, istiran, çîrok û lîztikan di nav xwe de digrî û ewqas daxwazê jî didî zanîn û naskirin û nazik û kêr tevger û kêr tîpe.

Xwendewarên delal, çandan, ko ev nîvîştên me ne di rêza nîvîştên xelkê de ne jî, lê ge-lek bawerim ko winê di van nîvîşt û nivîsaran de gelek tiştên heja û şayanê şabaz û aferîn bi-bênin û bixwênin. Herwekû pir hêvîdarim, ko winê piştî me ra hêj xwestir û çêtir binivîsin û bêtir pêşve bibin. Ji ber ko, pir hêvî heye, ko çax û demên we jî ên me xwestir û çêtir bin.

Di îro de, çî tiştên ko em bixwazin çêkin, nikarin tekûz û pêkhatî bênin meydana. Ji ber ko, welatê me di îro de bi çende xêzan di nav çende dewletan de hatîye perçekirin û hemû jî, nahelîn heta em bi zimanê xwe tiştî bibê-jin û jî hawîr zor û setem weke hîm û latan bi ser piştî me de hatine berdan û nikarin bi hê-sanî xwe jî bin giraniya wan derxin û jî zindanê wî de jî pere bi dest me nakevin û heta dewlemend û mîletperwerên me jî, ne tenê çî-kusin, pera nadin, belkî şerê me bi hovîti di-kin.

Ca eger hin çewtî, kêmasî jî we dîtin, rast bikin û derbasbin, li me negrin. Bê goman ro-jek heye, ko win van keynenivîsta bixwênin û rast bikin, bi pêşve bibin û kareke mezin ji wan bikin. Emê jî were kok bîgehê wan de-yinin û win bi serve avabikin yan jî çêtir bikin û wan keynenivîstan di refikan de bihêlin! Bere başên wan jî werebin û kêmasî û çewtî, guneh û sûcê me bin. Ji berê de dibêjin: "Rû-nê genî li ser nanê xwedî."

Di vî nîvîstê de, winê helbeste, dîlok, hey-ran, lawik, istiran, serpêhatî, çîrok û lîztikan jî ge-leka bibênin, herwekû "Bêlote", "Berdesta-rî", "Berdolabî", pêşyan jî bibênin û dixwa-zim hina jî wan vewejêrim, jî hev bidim jen-din û bîr û awira xwe jî li ser wan bidim xu-yakirin û hina jî li hêviya we bihelim.

1965/11/27
CÎGERXWÎN

PÊŞGOTIN

X. LEZGÎN (Haluk Ozturk)

"FOLKLORA KURDÎ" berhema mamos-ta Cîgerxwîn ya 18'an e, ku heta nîha tê çap-kirin. Bilî van hîjde kîtêban, qasî bîst -bîstû-pênc berhemên wî yên neçapkirî hene, Di nav kêr mîletan da edîb û nivîskarên mîna Cî-gerxwîn afrandkar hene. Wî piştî xebateke 50 - 60 salan, xezîneyeke mezin pêşkêşî literatu-ra Kurdî kir.

Cîgerxwîn navekî mezin e. Bêşik navê seydayê mezin, wê bi herfên zêrîn derbasî dî-roka edebîyata Kurdî bibe. Û bêşik mezinahî-ya welatparêz û şairê mezin, ne tenê ew e ku, wî bi hejmareke gelekî bilind pirtûk, nîvîstên heja pêşkêşî çand, ziman û edeba Kurdî kirîye, lê herweha ew mîlîtanekî şerê azadîya gelê Kurd bû ku, ji 50 salî zêdetir, bêwestan li mey-dana têkoşînê xwiya kir. Heta roja dawîyê jî, bawerî hêvî û xebata xwe jî dest berneda.

Çîroka jiyana Cîgerxwîn, têkoşîn û xebata wî ya dîrûdîrêj neynîka dîroka gelê Kurd ya sedsala 20'an e. Di benedê pêşgotinekî da, derbarî vî insanê mezin da nivîsandin, û bi her alî va danasîna wî ne mumkun e. Lê bi kurte-birî be jî, di pêşgotina vî xebata wî ya heja da, em carekî dîsa li çîroka jiyana wî binhêrin û wî bi hurmet bi bîr binin.

Navê CÎGERXWÎN yê rastîn Şêxmûs e. Lawê Hesen û Eysanê, di sala 1903 da, li gun-dê Hesarê nêzikî Mêrdînê, li Kurdistan Tirkî-yê hatîye dinê. Malbata Şêxmûs, berî şerê cî-hanê yekemîn, ji ber tengasiyên aborî mala xwe jî Hesarê bardikin dibine Amûdê. Li wir, Şêxmûs hîn 9-10 salî bûye dê û bavê xwe wînda dîke. Piştî mirîna dê û bavê xwe, ew li ba xwişka xwe Asîyayê sitar dibe, dest bi rênçerîyê, şivantî û gavantîyê dîke. Di nav-bera salên 1918 û 1920'an da, di rîya hesin da dixebite. Di 18 salîya xwe da dest bi xwandî-na dîni dîke. Di sala 1928'an da teaza melatî-yê distîne û dibe pêşnimêj.

Wextê Şêxmûs feqeh bû, li Kurdistanê ge-lekî gerîya, jiyana gelê Kurd, erf - edetên kur-dî, pîrsgirêkên civatê baş nas kir. Bi serhilda-na sala 1925'a ya Şêx Seîd Efendî ra, gîyanê nîştimanperwerîyê li ba Şêxmûs peyda dibe.


Ji wê salê şûnda Şêxmûs Hesên dest bi xebatê xwenasîya netewî, propaganda şerê azadîya Kurdistanê dike. Sedemên paşdamîyana gelê xwe, zilm û zordestîya dewletên dagirker, kedxwarî û sîtema axa û şêxên Kurdistanê dibîne û li dijî wan şer dike. Cubeyê melatîyê datîne aliyekî, dîsa dest bi rênçerîyê dike û pêra ji helbestan dinivîse. Êdî ew şervanekî azadîyê ye. Ji bo hişiyarkirina gel, geşkirina agirê azadîyê, helbestên wî, li seranserê Kurdistanê dibin defa hawarê. Ew bi rîya feqeh û malayên welatparêz xwe digihînin her derê Kurdistanê; dibin marş, dibin stran û li ser lêvên dengbêj û hozanan, keç û xortan digerin.

Cîgerxwîn, helbestvanekî têkoşer, ronahîdar û internasyonalist e. Helbestên wî, bi peyamenên şoreşger û sosyalîst dagirtîne. Gelê Kurd ê bîndest, berî hertîştêkî gereke hîşiyar bibe, dost û dijminên xwe baş nasbike; wek mîlet, bi xwe, bi çand, ziman û dîkora xwe serbilind be, xwe kêmtir nebîne, welatê xwe baş nasbike. Ji

bo rizgarîya netewî û civakî, pêwîst e karker û gundîyên Kurdistanê xwe rêz bikin, qedera xwe û welatê xwe bigrin destê xwe. Pêwîst e jîna Kurd bixwîne, zane be, di şerê azadîyê da cîhê xwe bigre. Hingê gelê Kurd dikare ji jîyana sedsalên navîn, ji paşverûtîya feodalî xwe xilas bike, dijminên ku welat di nav xwe da parvekirine, derxe derva.

Şair û mamostayê mezin, di praktîka jîyanê da, 50 salan ji bo bi cîh anîna van ramanan xebitî. Heta roja dawîyê jî 22.10.1984'an da ku çavê xwe li jîyanê girt, ew endamê rêxistinêke siyasî bû... Mîlîtanekî 80 salî bû.

Aha "FOLKLORA KURDÎ" niha di destê me da, şahidîke din e ku Cîgerxwîn ne tenê bi gotinê, bi kirinê jî rê nîşan daye. Wî di vê pirtûkê da gelek nimûneyên folklorê kurdî berhev kirîye, ew jî windabûnê xilas kirine. Cîgerxwîn nemir e. Gelê Kurd wê vî lawê xwe yê payebilind, di çand, ziman û dîroka xwe da hertim bi bîr bîne.



Ji pirtûka bi navê Dîwana Yekan- Sewra Azadî

JÎYANA CÎGERXWÎN Û EFRANDINÊN WÎ

Ferhad Can

Hozanê bi nav û deng Cîgerxwîn di 22'yê Çirîya Pêşîn, sala 1984 ji nav me barkir û çû heqîya xwe: cmrê wî gîha bû 81 salî.

Lê belê, ji bo hozanekî mirin ne ev e. Eger ew tê xwendin, eger şîêrên wî li ser zmanê xelkê ne û li çaralî digerin û dilgeşî, hêz û hêvî didin mirovan, xuya ye ew ne mirî ye. Cî-

gerxwîn îro jî hozanekî jînî ye. Wî bi dû xwe gelek efrandin hiştin. Hîn ku xweş bû çardeh efrandinên wî çap bû bûn û heftên wan dîwan bûn. Piştî mirina wî jî her sal efrandinê wî yê nuh çap dibin.

Dem 22-23 salî bûm min navê Cîgerxwîn bihîsti bû. Hevalekî min şîêrekî wî xwendî bû û çend xet di bîra min da mabûn. Lê ewqas. Li wê demê jî, wek îro, şîêrên Cîgerxwîn li welat bi dest nediketin (Wek yê Nazim Hikmet. Piştî bend û qeydên li pêş şîêrên Nazim rabûn, lê yê Cîgerxwîn berdewam e). Lê wî çaxî, gava rîya min bi gundekî Qereqoçanê ket û li wir, tiştê ku rastî hatim heyîrîm. Zarokên

gund ku diçûn dibistanê ji Cîgerxwîn gelek şî-êr jiber kiri bûn. Wan ew şîêr ne ji miellîmê gund, lê ji melayê gund hîn bû bûn. Li welatê me gelek melayên usa welatparêz û hişyar he- ne. Ew çanda gelê me ji neslekî derbazî neslê din dîkin û bi vî awayî kar û xebateke giran- buha pêk tînin.

Şîêrên Cîgerxwîn îro jî li welatê wî di nav gelê wî da qedexê ne. Nizam li dinyayê, li we- latên dinê jî îro tiştên usa hene yan na?

Di sazûmanên zordest da mal û kitêbên hîn hozanan tîn şewitandin (wek Nerûda), li hîn deran wan davêjine zîndanên (wek gelek hozanên li welatê me), li hîn deran tîne kuş- tin (wek Lorca), hîn ji welatê xwe dûr dike- vin, li xerîbiyê dimirin û şîêrên wan li welatê wan qedexê ye (Wek Nazim û Cîgerxwîn). Hîn jî merivê sazûmanê ne û şîêrên wan li ka- qizên herî xweşik tîn çapkirin, di radyo û tî- lewîzyonên dewletê da tîn xwendin, dikevin kitêbên dibistanan. Lê çi bê kirin jî merivên han tucar nîkarin bibin hozanên rastî. Nav û dengê wan nayê bihîstin, bê bihîstin jî zû ji bîr di- be. Hozanên rastî yê din in. Şîêrên rastî ji sî- noran, ji tîlên sincîkin, ji zevîyên mayînan derbaz dibin û heya gundê li çîyayê Qereqo- çanê diçûn, dikevin-defterê zarokên gundîyên feqîr û di bîra wanê teze da cî digrin.

Cîgerxwîn di sala 1903 da li hêla Mêrdînê di gundê Hesarê da li malbateke feqîr hate di- nê. Navê wî danî Şêxmûs. Wî dê û bavê xwe hîn di zarotîyê da winda kir. Li cem merivên xwe, xasima bi alîkariya kekê xwe mezin bû. Hîn di zarotîya xwe da li cem gundîyên dew- lemend, li cem axayan xebitî, xizmekarî kir. Hîn di zarotîyê da kete şerê jîyanê û nîrê zor- destî û zêrandinê li ser xebatkaran naskir. Tişt- ên ku di wê demê da dît û hîn bû, piştra li ser raman û şîêrên wî tesîreke mezin kirin.

Ji ber bûyer û tevheviyên Şerê Mezinî Pê- şîn wî û kekê xwe jî barkirin û berjêr çûn, li bin xetê, li Amûdê ciwar bûn. Piştî şer li mintiqê gor mafên dewletên împeryalî sînorên nu hatin danîn û Amûd di nav sînorên Sûrîyê da ma. Cî- gerxwîn êdî nekarî cardin vegere welatê xwe yê berê.

Wê demê dibistan li kêma cîyan hebûn. Şêxmûs jî wek gele hemdemên xwe rûyê di- bistanê nedît. Di 18'î da li cem meleyan dest bi xwendina dînî kir. Bo pêşvebirana xwendi-

na xwe li gelek cîyan gerî. welatê xwe Kur- distan, derd û êşên gelê Kurd û zargotina wî ya dewlemen naskir. Di dema xwendina med- resê da, her usa jî derheqa çand û edeba Kur- dî da gelek tişt hîn bû, nivîskarên me yên kla- sîk naskir. Li ser wî, xasima Ehmedê Xanî û Mela Ehmedê Cizîrî tesîreke mezin kirin. Di wan salan da dest bi nivîsandina şîêr kir.

Li gundekî Sûrîyê bû mele û bi hişyarî û welatparêziya xwe, bi bîr û bawerîyên pêşve- rû di demeke kurt da xwe nîşan da. Dijî zêran- dina şêx û axan derket û piştgirîya gundîyên feqîr kir. Bi camêrî dijî wan kesan derket ku di bin perda dîn da xelk dixapandin, ji bindes- tan dixwestin ku dijî zulm û zêrandinê bêdeng bimînin, stûyê xwe xwar bikin. Dijî bîr û ba- werîyên kevn û pûç derket. Bona vê yekê, pir neçû, ew kesên zordest û kevnepereşt jê aciz bûn û gotin ew kafir e.

Di sala 1925 da, piştî tîkçûna serhildana Şêx Saîd gelek bîrewer û welatparêzên Kurd derbazî Sûrîyê bûn. Ewana di sala 1927 da bi navê Xoybûn komeleyek ava kirin. Şêxmûs jî tevî vê komelê bû û di kovara Hawar da bi na- vê Cîgerxwîn şîêr nivîsandin. Ev şîêr dijî zulm û zêrandinê bûn û bi kela welatparêzî ti- jî bûn. Bonê vê yekê, di demeke kurt da nav û dengê Cîgerxwîn hat bihîstin.

Şerê Dinyayê ya Duduyan û bûyerên piştî wê ku li heremê cî girtin, tesîreke mezin li ser Cîgerxwîn kir. Giha bîr û bawerîyên sosyalis- tîyê û di şîêrên wî da welatparêzî û înternas- yonali bi hevdu ra kelîyan.

Di sala 1950 da li Kurdistanê Sûrîyê Partî Demokratî Kurd ava bû. Cîgerxwîn jî kete vê partîyê û heya mirinê jî endamê wê bû.

Di sala 1961 da şorişa Kurdistanê Iraqê dest pê kir. Cîgerxwîn bi şîêrên xwe piştgirî- ya şoreşê kir. Bi wê nema, derbazî Kurdistanê Iraqê bû û ji bo elimandina kadroyên partîyê kar û xebat kir. Dema ku şer sekîna bû, di Akademîya Kurdî ya Bexdayê da li ser zman û edeba Kurdî ders dane xortan.

Şîêrên Cîgerxwîn di demeke kurt da ji sî- noran derbas bû bûn, li çaralî welat giha bûn destê gel û li ser zmanan bûn. Him bona vê yekê, him jî bona kar û xebata wî ya rêxistinê, gelek bala dijminan dikişand û gava li Sûrîyê êrîşên hukûmetê dijî Kurdan xurt dibûn, Cî- gerxwîn jî para xwe jê distend. Ew gele caran

hat girtin, eza û cefa dît, hin caran revî û di gundan da xwe veşart. Carê jî derbazî Bêrûtê bû û xwe ji girtinê xilas kir.

Cîgerxwîn piştî sala 1970 demeke piçek rehet, demeke bê girtin û bê eza derbaz kir. Lê di vê demê da jî dîsa, bo nivîsandin û weşandina efrandinên xwe li Sûriyê rewşeke baş tune bû. Bona vê yekê di sala 1979 da derbazî Swêdê bû. Piştra jina xwe û zarokên xwe ji anîn û li bajarê Stokholmê cîwar bû.

Cîgerxwîn kar û xebata xwe li der welat jî ajot. Wî ji destpêka xortanîyê vir da tim bi hêvîya rizgarîya gel û welatê xwe jîya bû, bi vê bîr û bawerîyê şer kirî bû, gelek eza û cefa, gelek belengazî kişandi bû. Emrê wî giha bû 80, lê hîn roja rizgarîyê xuya nedikir. Vê yeke dilê wî hêvî û kîle dilê xwe tucar winda nekir û kar û xebata xwe ajot.

Cîgerxwîn bi devkî û bi qelem, heya mirinê di nav şer da bû. Ev merivê bi bejn û bal, porspî, rûken û jîndar di nav Kurdan da gelek bi rûmet bû. Mala wî tim bi mêvanan, bi nas û dostan tijî bû. Ew li hemû civînan siyasî û çandî hazir bû, ku bi alîyê hêzên welatparêz dihatin çêkirin. Gele caran çû Parîsê û Elmanîya Federal, tevî şevên Newrozê bû û axaft, ku bi destê KOMKAR'ê hatibûn çêkirin. Bi daxwaza Qanatê Kurdo çû Lenîngradê û nas û dost dîtin.

Cîgerxwîn di 22'yê Çirîya Pêşin da li Stokholmê, ji ber nexweşîya dil emrê xwe temam kir û çû heqîya xwe. Çawa xeber hat bihîstin ji çaralîyê Ewrûpê xebatkar û birewerên Kurd hatin li Stokholmê civîyan. Malbat û hevrêyên wî di saloneke mazin da sê rojan rûniştin û xelk hate sersaxîya wan. Ew sê roj bûn civînek ku jîyan û têkoşîna Cîgerxwîn hate ser zman û şîerên wî hatin xwendin.

Cendegê wî di 2'ye Çirîya Paşin da bi teyarê ji Sûriyê ra hate rêkirin. Dema şandinê gelek însan civîya bû.

Mirina Cîgerxwîn di nav Kurdên Sûriyê da dengeke mezin derxist, ji ber ku wî piranîya emrê xwe di nav wan da derbaz kiri bû. Dema cendegê wî Şamê çû Qamîşloyê li ser rê xelk bi hezaran kom bû. Li Kurdistanê jî bû mahşer. Rîya navbera Hesîce û Qamîşloyê serbiser tijî bû. Kurd ji bona hurmeta hozanê xwe yê ezîz ji hawirdor Cizîrê, ji Çiyayê Kurd, ji Heleb û Şamê ref bi ref hatibûn. Di nav nas û dost û hezîrên wî da gelek Erebb,

Ermen û Suryan ji hebûn ku ew jî hati bûn. Di 5'ê Çileyê Paşin da wexta cendegê wî binax kirin, dor 100.000 kesî li wê hazir bû. Ew li Qamîşloyê, di baxçeyê mala wî ya piçûk da dan erdê. Ev mal di darê dinyayê da milkê wî yê heyî bû û bi alîkarîya nas û dostên wî hati-bû çêkirin.

Jîyana wî ya dirêj bi şer û şîer hatibû hundandin. Şerê wî dijî xiraban, neheqan û zordestan bû. Wî bo rojên delal, bo rizgarî û aşî-tîyê şer kir. Di şîereka xwe da usa dibêje:

*Ez xweş mirov im
Ne hîrç û hov im
Lê çibkim dijmin
Bê şer naçî der*

Cîgerxwîn li medresê xwend, lê ew, bi rastî, xwendekarê dibistana jîyanê bû. Bona vê yekê tucar bîr û bawerîyên kevn û pûç hînî xelkê nekir. Wî rastî dît û bi camêrî ew anî ser zman. Ew bû mamosteyê gelê xwe. Tiştê ku rast dît û rast zanî heya roja mirinê got, kar û xebata xwe bi sebir û bê westan ajot, da ku xelkê hişyar bike, bikişîne nav refên tevgera azadîyê. Di heştê salê xwe da jî wek xortekî jîr û jêhatî bû. Meriv li himber xurtîya bîra wî şaş û metel dima.

Cîgerxwîn baş fêmkiribû ku, wexta wan sazîyên kedxwar û pêwendîyên feodalî derbaz bûye û ew êdî li ber pêşveçûna gelê Kurd bûne astengên mezin. Bona vê yekê, Cîgerxwîn, bo hişyarkirina gel dijî kedxwarên wek şêx û axa şerekî bê westan ajot. Ew kesên han him gundîyên Kurd dizêrînin, tip û tazî dikin, zordestî û neheqîya dinê li wan dikin, him jî xwe wek parçeyek ji wan nîşan didin û cilê dostanîyê li xwe dikin. Cîgerxwîn di şîerekî xwe da bo wan usa dibêje:

*Hey teres ferqî çîye,
Ha neyar xwar ha te xwar*

Cîgerxwîn tim dijî zordestîya li ser jinan, dijî bend û qeydên li ber pêşveçûna wan derket. Wî nîşan da ku ew zordestî û bend û qeyd çawa pêşveçûna civakî û şerê azadîyê sist dikin di civata Kurd da. Wî gazî jinan kir ku tevî karên civakî û siyasî bin û her usa jî, di derheqa vê yekê de mêr jî hişyar kirin. Di dîwana xwe ya pênca, Zend Avista da, di derheqa van adet û usûlên kevneparêz da usa dibêje:

*Qirêja hezar sal û kevneperest
Di îro ji bo me meke mal û rist*

Di şîerên Cegerxwîn di welatparêzî bejn dide. Ew bi kîn û hêrs tijî ye dijî hêzên zordest ku gelê Kurd bindest kirine, dizêrinin, zulma dinê lê dikin û heya pir caran qirdikîn. Lê ew, hukmên zordest û gelan, sinifên karbi-dest û xebatkaran tevî hev nake, di vî warî da hişyar e. Cîgerxwîn di warê netewî û navnetewî da dost û dijmin gelek baş ji hev cuda dikir. Wî bi çarçûwekî gelek fireh li dinê dinhêrî. Wî dengê xwe ji bo hemû gelan bilind kir ku dijî faşîyê û împeryalîyê şer dikirin. Ew piştgirê reşikan bû ku li Amêkîra Bakûr dijî nijadparêzî şer dikirin, ew piştgirê gelê Wîetnamê yê mîrxwas bû. Ji bo têkoşîna van gelan bi dilgermî nivîsand û pesna wan da. Di şîerên wî da welatparîzîyeke kûr û înternasyonalîyeke fireh bi hevra keliya.

Di warê siyasî û hunermendî da jî usa bû. Cîgerxwîn bi jîyan û xebata xwe, karê siyasî û ya çandî bi hevra ajot û bi vî awayî derseke gelek mezin da wan kesan ku, dixwazin van herduyan jî hev veqetînin û sûrên Çînê daynin navbera wan.

Ma ev herdu jî hev dibin? Eger çand tesîra xwe li ser jîyana mirovan di warê ramanî da dike, bi vî awayî li ser jîyana rojane jî dike. Ew çawa ji siyasî û çandî hev cuda ye, ew gotîna ku "siyasî û çandî jî hev cuda ye", ew gotîneke pûç e. Ew hunermendê ku dibêje tu pêwendîyê min bi siyasî û çandî xwe dike keleya ku ji diranê filê çê bûye, ew jî xwe û xelkê dixapîne. Ew bi xwe jî xizmeta bîr û bawerîyê û bi vî şiklî, xizmeta siyasî û çandî dike.

Efrandinên Cîgerxwîn ku heya nuha çap bûne:

1. Dîwana Yekan, Şam, 1945
2. Cîm û Gulperî, çîrok, 1947
3. Sewra Azadî (dîwana duduyan), 1954
4. Reşoyê Darê, çîrok, 1954
5. Gotinê Pêşîya, 1956
6. Awa û Destûra Zimanê Kurdî, Bexda, 1961
7. Ferhenga Kurdî, Cildê Pêşîn, Bexda, 1961
8. Ferhenga Kurdî, Cildê Duduyan, Bexda, 1962
9. Kîme ez (Dîwana Sisêyan), Bêrût, 1973
10. Mîdya û Salar, çîrok, Bêrût, 1973
11. Ronak (Dîwana Çaran), Weşanên Roja Nû,

Stokholm; 1980

Siyasî û huner wek goşt û hestî ye. Şîer û hemû efrandinên Cîgerxwîn bi welatparêzî û bi şoreşgerî tijî ne bû bi wan xemilîne. Bi vî awayî Cîgerxwîn tevî karê şoreşgerî bûye. Lê ew bi vî nemaye, raste rast di karê rêxistinî da jî cî girtiye û heya dawîya emrê xwe dev jê bernedaye. Di van salên dawî da adetek derketî bû, hin kesan karê çandî mane dikirin û xwe ji siyasî û çandî dixistin; lê Cîgerxwîn tucar guh neda gotinên han. Wî usa bersîva wan da:

*Bibe partî û hem bibe partîzan
Eger serbilindî dixwazî, bizan*

Heya îro heşt dîwanên Cîgerxwîn çap bûn. Hin jî dîwaneke çapnebûyî maye. Cîgerxwîn tevî şîeran çîrok jî nivîsandin û li ser zman, dîrok û zargotina Kurdî efrandinên wî hene. Hin efrandinên derheqa dîroka Kurdî, jî zmanên dinê wergerande zmanê Kurdî. Efrandinên ku heya nuha çap bûne 17 heb in. Qasî 20 efrandinên xwe hin çap nebûne û di nav van da bîranînên wî jî hene.

Cîgerxwîn hozan û nivîskarekî şoreşger bû ku gelek rûçikên granbuha pêra civîya bûn. Wî wek tovekî xas di axeke bejî da bejn da, gelek bahoz û lehî derbazkirin û berhemên xwe dan. Ew jîyana bi êş û zehmet, zordestîyên ku dîtî û rojên reş, her usa jî bûn sedemê derketina Cîgerxwîn wek hozanê berxwedanê, hozanê azadîyê.

Ew ewdalekî gelê Kurd yê xas û bijarte bû. Gelê Kurd bi wî serbilind dibe. Cîgerxwîn îro jî bi şîerên xwe yê tijî kel û dilgermî, bi jîyan û xebata xwe vê wek nimûne di tevgera gel da dijî. Cîgerxwîn bi me ra ye û wê her bijî.

12. Zend Avista (Dîwana Çaran), Weşanên Roja Nû, Stokholm, 1980
13. Şefaq (Dîwana Şeşan), Weşanên Roja Nû, Stokholm, 1982
14. Hêvî (dîwana Heftan), Weşanên Roja Nû, Stokholm, 1983
15. Tarîxa Kurdistan, 2 cild, Weşanên Roja Nû, Stokholm, 1985-1987
16. Aştî (Dîwana Heyştan), Stokholm, 1986
17. Folklorê Kurdî, Weşanên Roja Nû, Stokholm, 1988

CEGERXWÎN

Celadet Ali-Bedirxan

Navê wî Şêxmûs e. Navê bavê wî Hesen û yê diya wî Eyşan bû. Hesen kurê Mihemed, Mihe-med kurê Mehmûd, Mehmûd jî kurê Elî ye.

Li gora ko seyda ji min re gotiye ev Elî digel bireyê xwe, ji nav gurdilan, ji gundê Pêkende hatiye Hesarê. nav dekşûriyan. Hesar bi Kercosê ve ye kû dikeve rojavayê Keskîfê.

Hesen keçek û du kur hebûn. Keça wî Asiya nûxwiriya wî bû. Di pey keçikê re Xwedê kurek da bû yê. bi navê Xelîl. Di pey re û di sala 1903'an da Şêxmûs hêj kiçik bû, li cem birayê xwe Xelîl dima. Lê ji ber ko li ber destê jinbirê debar ne dikir bîr bi xweha xwe ve direviya.

Hesen beriya seferberiya sala 1914'an ji Hesarê bar kiribû û hatibû Amûdê. Wextê koç û rehmetê zarawên wî ji nû ve vegeiriya bûn Hesarê. Piştî mîdekî dîsa hatin Amûdê û li wêderê bi cih bûn.

Êdî Şêxmûs li cem xweha xwe dima. Xweha wî ew dişand ber pez û carina jî jê re palêyî û rençerî jî dida kirin.

Lê Şêxmûsê ko di kurahiya dilê wî de agirekî mîqedes vêdîket qîma xwe bi vê jînê ne dianî; jî nik xweha xwe jî direvî û gund gund li medresan û xwendegahan digeriya.

Gelek ne ketin navê ew Şêxmûsê sêwî û şivan bû feqeh Şêxmûs û çavên xwe li dinya zanistiyê vekir.

Herwekî di Kurdistanê de adet e; Şêxmûs her û her medreseyên deştê de xwend, çû welatê soran û jê gihastiye heta deştê Lehîcanê, di nav Kurdistanê ecem de.

Wextê Cegerxwîn jî welatê soran vegeiriya deştê rast bi rast çû gundê Telşêrê û lê di bi cih bû û di xwendinê de pê da erdê. Xwendina xwe li nik seyda Ibêdilal qedandibe jî, ji ber ko mela Ibêdilal di vê navê de çû bû rehmetê, îcaza xwe ji birayê wî, mela Fetihal, standiye.

Şêxmûsê sêwî yê ko bi rêve bû bû feqeh êdî gihastî bû paya seydatiyê. Wî seydayê ko piştê di nav kurdan de bi navê Cegerxwîn deng bidaya.

Piştî temamkirina xwendina xwe, Şêxmûs melatîya gundan dikir. Dibû pêşnimêjê gundiyan, mehra wan dibirî, zekata wan dixiste rêzika şêritetê û bi vî awayî dijî.

Vê jîyînê jî gelek dom nekîr. Cegerxwîn dev ji melatîyê berda û dest bi cotkariyê kir. Digel kurmancan du gund ava kirin. Navê gundê ko bi xwe tê de rûdinişt kiri bû Ceheneme. Seyda ji bo

Cehenemê digot, ma ji xwe ne welê ye; miletê ko ne bi ser xwe ye ma sekene wî ne ceheneme ye.

Cegerxwîn wextê ko dev ji melatîya gundan berda bergehê xwe jî guhart. Cib û şaş avêtin, riha xwe a dirêj û çarkenar ediland û dawîyê kete qelefata xortên vî zemanî, herwekî suretê wî şanî dide.

Wextê Cegerxwîn ev inqilabên ha çêdikirin, di nav miletê wî de jî bi destên çend bijartan inqilabine mezin çêdibûn.

Welatjorî di şerê biserxwebûnê de şikestî bûn. Qehremanên wî şerî, yên ko ji kuştinê xelas bû bûn, xwe da bûn çîyan û bera neyarên xwe didan. Hinên din xwe gîhandi bûn çerveyî welêt, civatînan datanîn û ji felata welatê xwe re dixebitîn.

Di Kurdistanê iraqê de zarowên kurdan di dibistanan de, bi herfên erebî be jî, bi kurdî dixwendin. Li Bexda, Silêmanî û li Rewandîzê kovar û rojnameyîne kurdî bi der dihatin.

Kurdên Rewanê, xêra teşkilata welatên Sovyetistanê, bû bûn xwediyê elfabêke latînî. Bi vê elfabeyê rojnameyên xwe derdixistin û darsa zarokên xwe di dibistanên xweser de bi vê elfabeyê û bi zimanê wan ê mader digotin.

Di Sûrîyê de jî elfabeke latînî hati bû belav kirin. Herçend ew elfabê di dibistanan de ne hati be jî xwendin, pê kitêbine dibistanî derdiketin, kovar û rojname belav dibûn, xort û kalin jî elfabeya nû ji hev hîn dibûn û her tiştên xwe pê dinivîsandin.

Seyda jî şûrê xwe ji kalên kişandibû, bera pûl û latên îtiqadên batil û xurefeyan da dida, şerê neyarê hundir dikir, li kurmên darê li kurmên ko dar dixwarin digeriya. Ew kurmên ko seydayê Xanî berî sê sed salî pêş me kirine.

Seyda rast bi rast bela xwe dabû mîr û beg û axa û şêxan. Ji lewre jî xwe re dijminîne xurt û dijwar peyda dikirin. Carina cih lê teng dibû: Lê seyda, bê perwa, şûrê xwe di ser serê wan re vediveşand û êşkere digote wan. ez dikim bî vî şûrî serê we jêkim.

Lê divêt bête gotin ko ji zelmên ko di sefa neyarên wî de dihatine dîtin, peyayîne hêja û welatparêz meyardariya wî dikirin û jî tayê wî dibûn. Nemaze, rehmetî Haco axa rast bi rast destê xwe datanî piştî wî, di rîya cidal û cihadê de ew dihevot û jê re digot, teqşîr meke her eyb û kêmasiya me bibêje, lê têkilî dîn û diyanetê mebe.

Tiştên ko me li jor gotî, birekî jînenîgarîya (tercîmey-hal) Cegerxwîn e. Herwekî, ji ber bêgaviyê di vê diwanê de me her tişt kurt û ketebir kiriye, me jînenîgarîye Seyda jî bi kurtî got.

CEGERXWÎN

Jînenîgarîya wî

Osman SEBRI

Navê seydayê Cegerxwîn Şêxmûs e, kurrê Hesên, kurrê Mihemed, kurrê Mehmûd, kurrê Elî ye. Elî jî nav gurdilan jî gundê Pêkendê hatiye nav deksûrîyên gundê Hesarê.

Seyda di sala 1903an de ji dê û bavekî feqîr hatiye dinê. Berî ku mezin bibe bavê wî çûye rehmêtê, sêwî li nik xuha xwe Asîyayê maye. Bi-çûkî berxortaniya xwe bi şivanî û cotkarî borandî ye. Piştî vê demê, ji nûve çav daye xwendinê û ketîye rêza feqehan. Di demekî ne pirr dirêj de ketîye pêş hevalên xwe û şehedeta ilmê şerîetê li ser destê saydayê mela Ubeyd îstanîye.

Di vê navberê de tevgerên serxwebûnê di nav Kurdistanê de dest pê kiri bûn. Şêx Sêidê rehmêtî bi şerrê serxwebûnê rabû bû. Lê mixabin ku bêbextî û dilreşîya şêx û axan nehîst ku ev xebeta welatî biçe serî. Şêx Sêid bindest û dîl, gelê Kurd jî şerpeze û bê rûmet kete ber dest û lingê neyar. Ji bo çavîşkandina milletê Kurd, kuştin, bi agir sotin, serjêkirin, ji welat derxistin, heps û nefî kirin, di vî warî de herçiya ji Tirkên hat, derheqê milletê Kurd de teksîr nekirin. Van kirên neyar, ruhekî nuh di seydayê me de hişyar kir û hezkirina Kurd û Kurdistanê xiste dilê wî.

Berî istandina îcazê Cegerxwîn bi feqetî çû bû Kurdistanê Iraq û Îranê. Vê gerra han jî di canê seyda de şobeke çak û ronak hiştibû. Dêrê milletê hêdî hêdî bîr dibîr millet jî nezanî û bêti-faqîyê dîl û bindest mabû; şêx û mela, beg û axa ji van kêmasîyan berpirsiyar bûn. Ji lewre berê xwest şêx û melan jî wacibê wan hişyar bike. Lê dema dît ku wan çav dane xwarina malê millet û bindestîya wî û dest dane destê neyaran û xulamîya wan; xîreta seyda qebûl nekir ku di nav wî refê bêbextî û hêrûmetê de bimîne, rabû cîbbe û şaşik avêtin û wek camêran destên xwe vemalan û daket qada xebata welêt. Ev e tiştekî kurt û ser-pilkî ji jînegariya seydayê Cegerxwîn.

EW BI XWE

Ev bûn 23 sal ku seydayê Cegerxwîn nas dikim, Bi hikmê ve nasîna dirêj, min du meziyetên çak di seyda de dîtine ku hêjayî salixdanê ne.

1. Cegerxwîn derdê milletê xwe baş nasî ye. Bela milletê Kurd di mîr û paşan, beg û axan û şêx û melan de dibîne. Bêşik seyda di vê ramana

han de ne î şaş e. Çima ku ji hezar salan û vir de, ev kesên han pêşî, sermîyan û rêberên vî milletî bûn. Cihê ku can, mal û welatê wan biparastana, çav dan xwarina malê wan û ew dîl û bindest û welatê wan bi dest neyaran ve berdan. Cihê ku ew bidana xwendin, zana û fêr û jîrek bikarana, tev de nezan û bê raman û bê arman hiştin. Cihê ku yekîti di nav millet de barnîna pê, rik û berberî xistine nav kurdan û hemî kirin neyarên hev. Bi vî awayî ew û welatê wan xistin bin destê neyar. Tenê têr dike ku em bikarin fikreke baş li ser van kesan bidin xwendevanan. Şêx û melan bangîna xwe ji mirîyan dikirin; mîr û paşan, beg û axan jî bangî ji neyarê millet û welêt kolîdar dikirin.

Ji lewre Cegerxwîn bê dilovanî kêmi û kasî-yên wan dibêje, û millet serwestî fend û xap, bê-bextî û dilreşîyên wan dike. Ez bawerim ku seydayê Cegerxwîn di vekirina çavê Kurdên Sûrîyê û nivroyê Tirkîyê de şopeke mezin û hêja hiştîye.

2. Cegerxwîn di kurdîtiya xwe de î rast û durust e. Ew çend rast û durust ku, di rîya welat û welatîyên xwe de sînga xwe ji zîvarî û belengazîyê vekiriye. Bi çav min ev yek ahun kaça fedakarî ya dawîyê ye.

Ji vê pêve; di rojên tengî û zîvariye de jî, dilgeşî û comerdî jî Cegerxwîn bi dîr neket. Rojê min ew dilteng û bêhêvî nedît, çi dema lê qewimîye tevî zîvariya xwe her û her destê alîkarîyê dirêjî heval û hogirên xwe kirîye.

Ji vê bi şûnde, seydayê me di rîya welat û welatîyên xwe de gelek west-û êş, renc û zor heps û neheqî jî dîtine. Îro dibînim seyda bi gavên xurt û camêr herve armanca xwe diçe bi navê hevalîyê ez wî pîroz dikim û jê re pêşveçûneke çak dixwazim.

DÎWANA WÎ

Herçi ev dîwan, ji dîwana seyda a pêşîn bi gelekî xwestîr û hêjatir derketîye. Di dîwana pêşîn de, seyda ne hinde xurt û ne jî di armanca xwe de dîrbîn û yekrû bû; lê ev dîwan li ser armanceke xuya hatiye nivîsîn û rû û rêça wî tê de xweş dîyar in.

Gelek mixabin ku ji ber hin sebeb me nikarîbû tevayîya dîwanê çapke û me ji bo îro bi evqasî têr kir. Ez gelekî hêvîkarim ku dîwana seyda a sîsiyan hin xurttir û hêjatir be. Heye ku ew dîwan di çapxaneyên Kurdistanê de bête çapkirin. Ma kî dizane ku pêşende di himbêza xwe ya nediyar de ji bo gelê Kurd çi vedişêre.

Şam, 5.10.1954



Ji pirtûka bi navê Kîme Ez - Ronak

PÊŞGOTIN

Hemîd Derwêş

Çi gava ku mirovek, têkoşer û şoreşgerên kurd bîne ber çavên xwe, bê guman, navê biwêj (Şair) ê mezin Cîgerxwîn di nav wan de wê bê êjmartin: ji ber ku, mamûstayê hêja ne tenê li perçeyên Kurdistanê û di nav milletê kurd de tê nasîn. Belam li temama cihana pêşverû, û sosyallîst de jî xwedî nav û deng e.

Digel vê jî; wek xortekî kurd, dixwazim hinek nasîya xwe, li ser xebatkar û navdarê niştîmanî de di vê pêşgotina ha de, ji xwendevanên hêja re bi kurtî pêşkêş bikim.

Cîgerxwîn: Navê wî, Şêxmûs kurê Hesên, ji gundê Hesarê ji Kurdistanê Tirkîyê emrê wî her wek û wî di dîwana xwe ya yekem de gotîye: "di sala 1903 de ez hatime dinyayê, bi navê Sultan Şêxmûs ez çêbûme lê dayê." Yanê emrê biwêjê me neha dibê 70 sal. Cîgerxwîn piştî ko bîrbir bû, dest bi xwendina olperestî kir û ji bo temam kirina xwendinê li çar qozîyê Kurdistanê gerîya û di vê gera ha de, halê milletê xwe yê sîyasî, civakî û aborî didît, pê agahdar dibû. Ev jîna kurd tê de, jiyanek bindestî û paşve mayî bû jî ber ko emperyalîstan wê demê welatê Kurdistanê perçe perçe kiribûn. paşverûyên Tirk, Ecem û Erebi jî zordestî û sitemkarî li kurd dikirin. Ji ber vê yekê; Cîgerxwîn di sala 1923 de, piştî emrê wî bû bîst, rewşa kurd û Kurdistanê tê de, tesîrek pir mezin lê kir. di ber xwendina xwe re xebata niştîmanî û milletperwerî jî meşand, bi dengê bilind û bê tirs û bê pîrs, li ristên xwe gazî milletê kurd kir, ji bo hişyar bibin, bindestî û sitemkarî-

ya dijmin ser xwe rakin. Lê Cîgerxwîn bi rist û xebeta xwe, xwest rengêkî gelêr (şa'bî) bide tevgera kurd, û bivî awayî bang temamên gorên (tebeqên) millet kir, da ko bi hev re bi yek destî rabin û welatê xwe rizgar bikin. Ev nêrîna han jî xweş xuyaye di dîwana wî ya yekem de. Lê piştî ku Cîgerxwîn ket nav xebatê, jê ve xwîya bû ku burcuwazîyên kurd, ew jî weke burcuwazîyên milletên din e. Îtir berê xwe rêça sosyallîstîyê û bixurtî û dijarî şerê burcuwazên kurd kir, û rast û rast ban karker û cotkarên kurd kir û ji wan xwest ku dest bidin pirolîtarên cihanê û şerê dijminê mezin bikin ku ew jî emperyalîzm û paşverû ne çî Tirk û Ecem, çî Erebi û çî Kurd, û dît ku ew rîya han bi tenê Kurdistanê aza dike. Her wîsa jî ev nêrîna xwe di dîwana duwem de bi cih kir ko di sala 1954 de hatîye çap kirin.

Di ber van raman û armancên xwe yê bilind û çek de Cîgerxwîn çendî belengazî, zulm û eşborandîye, lê tevî wî haweyî jî, bê serçimandin û birçîbûn, zindan û çola, dev ji rêya xwe ya rast û dirist bernada û her û her ser meşîya; bi vê rengê xebata xwe Cîgerxwîn rolek pir mezin di şîyarî û serxwebûna gora, gelêrên kurdî de lîst, prolîterayê welat li qada wan da hesandin.

Di vê dîwanê de jî, biwêjê me, dîsa, şopa têkoşîn û şoreşgerî girtîye, nêrînek li ristêk li ristên dîwanê, dide xuyakirin ko seyda di ramanên xwe yên niştîmanî û civakî de gavên fireh ber bi pêşve avêtine, û ji ristên wî yên evînî, meruf tê dîgê ko seyda hîna ew Cîgerxwînê dil tenik û evîndar e û hêvîdar in ko ev dîwan arîker bê ji bo ramanên pêşverû re li nav milletê kurd de.

15.02.1973

Pêşgotin

KEMAL BURKAY

Ne hewce ye ku ez li ser şexsê Cîgerxwîn dûr û dirêj binivîsim. Di çar parçên Kurdistanê da êdî kî heye ku wî nasnake û derheqa emrê wî da ne bihîstîye? Li welatên dereke jî Cîgerxwîn, wek şairekî kurd ê mezin û wek hostayekî şoreşger bi nav û deng bûye.

Di dinyayê da hertişt gora şrûtên dorberê xwe pêk tê. Merivên rêber, serok û senatkarên mezin jî gora hewceyên zeman û mekan derdikevîn, dighên. Miletê me şairek mîna Cîgerxwîn derxist, jî ber Kurdistan hewcedarî wî bû. Ew nêzîke dused sal in ku Kurdistan dikele. Bo azadî ceng û şer dike û tê pelixandin. Gelê me hewcedarî dengêkî bilind bû; Cîgerxwîn bû ew deng; Wî di şîerên xwe da gilî û gazine, hêvî û daxwazên gelê me anî ser zmên û bilind kir. Bona vê yekê, gelê me jî ji wî ra xwedî derket, dengê wî bû dengê gel...

Cîgerxwîn hîn di xortanîya xwe da, di dema fegitîyê ku ew li Kurdistanê hêl û hêl digerîya, rewşa gel û welatê xwe bi her awayî, xweş fêmkir. Di wê demê da pir kes ji bindestîya welat ra dişewitîn lê yar û neyarên gel û rêya xilasbûnê bi awakî zelal ne diditîn. Pîranîya wan, tenê zordestên biyanî jî gel ra dijmin dihesibandîn. Dijminên nav gel, mîna axa û şêxan, an ne diditîn, an jî xwe li ne dîtîne didan. Eşkere ye ku, qasî dijminên der, yên hundir jî sedemê belangazî û nezaniya gel in. Cîgerxwîn ew yek dît û bi dil û can şerê wan zordest û kedxwaran kir. Cîgerxwîn bi xwe mele bû, le wî gelek tiştên pûç û wala şikandin, avêtin avê. ew tiştên ku, ew hezar sal in, di nav însanê me da têne gotin û wan famkor dikin, wek ji pûsê perdeki dikişînin ber çavên merivan. Cîgerxwîn rastî dît û rastî got. Di vê babetê da Cîgerxwîn bi rola xwe hişyar e, lê ne qure ye:

"Gotinê ku em dibêjin her kasî hişyar dîkin,

"Ne gelek nû ne welakîn nû gihîştin van dora..."

(Ji Dewlemendê Bê Şeref)

Di alîyê nivîsandinê da Cîgerxwîn xwe paşda nade û têr dinivîse. Li ser bûyerên welat û dinyê li ser babetên dîrokî û li ser dil û delalan.. Ew, di xortanîya xwe da çawa bi qîret bû, îro jî usa jîr e, jêhatî ye. Ev dîwana wî ya çaran ku di 77 salên wî da derdikeve, ev yek jî nîşan dide ku Cîgerxwîn çawa karkerekî bê westan e di warê nivîskarîyê da. Cîgerxwîn, tevî helbestan, nivîsarên siyasî û dîrokî jî dinivîse û di vî emrê xwe yî mezin da dimeşe, tev li civîn û meşînên siyasî dibe, dipeyîve û agîrê şoreşgerî geş dike. Ew yek jî naşan dide ku Cîgerxwîn îro jî wek xortekî bi hêvî ye, dilê wî ciwan e û ew di rîya rizgarîya Kurdistanê û azadîya geş da şer dike.

Eşkere ye ku xweşikî û delalîya şîer, bi yekitîya raman û his û şikil pêk tê. Heke yek ji wan kêmbê, an şunda bimîne, şîer jî nagihîje kemalê û dilê merivan pê şad nabe. Şîera Cîgerxwîn, wekî hiş û raman, bi alîyê şikil lî şîerek xurt û zor e. Ew bi reng û çmîkên Kurdistanê xemilîne. Bi alîyê gotin, çîrok, metelok û mecaz dewlemend in û xweş-eheng in. Carê li "Konê Reş" binêrin: Seyda, qasî koçeran navê tişt û tore-yên wan dizane û şîera xwe bi wan xemilandîye, ew kiriye cewahîrek giranbiha.

Cîgerxwîn di dirêjahîya emrê xwe da bo gel û welatê xwe bê westan xebitî û hîn jî dixebite. Ew ewladekî Kurdistanê yê hêja ye. Lê Kurdistan jî qedrê wî dizane û bi heyîna wî şa dibe. Kurdistan, qedrê law û qîzên xwe yên camêr û canik ji bîr nake!

Şîeren Cîgerxwîn îro li çar alî Kurdistanê di bajar û gundan da di kom û mezran da di dest miellîman û melan, di dest mezin û xort û zarokan da ne. Raman û daxwazên wîbî vî awayî rû û can digrin, xurt dibin û di azadîya gel de rolek mezin dilîzin.

Îlon - 1980

PÊŞGOTINA MIN

Cigerxwîn

Berî, ko ez dest bi pêşgotina xwe bikim, supasên xwe ji heval Kemel Burkay re Pêşkêş dikim, ko pêşgotinake xwe ji dîwana min re danîye. Çawa, ko ez supasên xwe ji wan heval mirovên ko ji bo çapkirina dîwana min re xwe êşandine û karkirine pêşkêş dikim. Weharengê supasên xwe ji dewlatê Swêd ra pêşkêş dikim, ko alîkarî ji bo çapkirina dîwana min bi re kirine. Ji hemî dilxwaz û alîkarên xwe re jî supasên xwe pêşkêş dikim.

Ez dixwazim di vir de gotineke kurd û te-vayî bibêjim ko hemî dîwan û ristên ristevan

û nivîskarên kurd dereng û ne di çaxên xwe de têne çapkirin. Ji lewra kêmwes û bêhêz û havi dimênin. Lê tenê tiştên heye ko rûmet û hêz û doz û daxwazên wan dîwan û nivîsaran diparêzî, ko ew jî ev e, ko şoriş û kêferata gelê kurd her nayên rawestan. Û ji ber wilo jî kengî bêne çapkirin, doz û daxwazên wan weke xwe dimênin û gewşek û bêhavi nabin.

Lê çima em nikarin zû bi zû nivişt û dîwanên xwe çapbikin û belavbikin? Ev jî, ji ber ko çend dewletên şovinî û faşistî, welatê me di nav xwe de perçekirine û heryek ji wan dixwazî me di nav xwe de bipişêvî û windabikî. Tevlî, ko ew jî dizanin, ko nema dikarin kurd û zimanê kurdî di nav xwe de winda bikin lê hêjî, di nav wan xewnexav û rewrewk û sawîran de dijîn.

Stockholm, 17/10/1980



*Ji pirtûka bi navê
Zend Avista*

Pêşgotin

Qanatê KURDO

Meha avgûstê sala 1980 ji Stokholmê serwerên kovara kurdî "Roja Nû" dîwana çaran ya şairê me yê ezîz Cegerxwîn ji min ra şandibû, ku ez pêşgotinê bo wê binivîsim. Serwerên wê kovarê nivîsibûn: "Em û mamosta Cegerxwîn li wê ramanê bûne yek, wekî di destpêka vê pertokê da pêşgotina te mamostayê mezin hebe.

Em hêvîdar in, ku tu ji me ra ser vê efirandinê bîr û bawariya xwe ango dîtina mîna pêşgotinekê bi rê kî."

Gelî heval û hevkarên delal!

Berê pêşin ez gelekî şad bûm, ku şervan û tîkûşerên kurdan li Evropê hene, teşkîl û sazmanên wan hene, ku ew bi pirsên rewşenbîrkirina neteweyê xwe va mijûl dibin, dixwezî dîwana Cegerxwîn bona xebatkar û tekûşerên îş û karên ronahîyê çap bikin. Ez gelekî şame, ku we ramana xwe kirîye yek, ku ez bi bawariya xwe mîna pêşgotinê li ser wê dîwanê binivîsim. Ew spartin bextewarîke mezin e, li jî-

yîna xwe da ez gihîştîme wê rojê, ku bi xwestina we dikarim şixulekî bi xêr û hêja bikin bona neteweyê xwe.

Spartina we li ser çava qebûl dikim. Lê divê hûn bizanin, ku nivîsandina pêşgotinê bona dîwana şayîrê me yî mezin û hezkirî Cegerxûn ne tiştekî hêsa ye. Bona vî karî, bona vî şîxûlî divê meriv li hemû pirsan da zana, hozan û pispor be bi zanîna xwe va çend serfyan li ser Cegerxûn ra; ez xwe hesab nakim merivê wusan û bi fikira min pêwîst e bêjim, ku heta niha sed car heyf, ku li nav neteweyê me yî bindest da merivên wusan tunene; bi rastî gotî, dibe hebin lê min navê wan ne bihîstîye, eger hebûna, minê xwe bextewar hesabbikira û ji kovara "Roja Nû" ra binivîsîya, ku nivîsandina wê pêşgotinê bona dîwana Cegerxûn bispêrne wî. Lê niha herçend serwerên wê kovarê pêra layq dîtine, ji min ra nivîsîye, ku ez "pêşgotinê ango dîtina xwe mîna pêşgotinê" binivîsim, ez mecbûr im wê xwestinê biqedînim, bûnme serî.

Cegerxûn bi reng û rûye xwe va, bi nivîsarên xwe va wek teht û kelemên serê çîyayên Kurdistanê here bilind e; sedan sed sal hatine, çûne û bihîrîne, lê ew teht, ew kelem li cîyê xwe da bi tîk, qaym û berk mane, Cegerxûn jî li hunerwerîya xwe da, li bîr û bawerîya xwe da bi qaym serbilind û serefiraz maye û li rîya xwe da her diçe û diçe.

Di jîyana Cegerxûn da li nav her çar parên Kurdistanê da gelek rojên giran qewimîne, li jîyana xelqê Kurd da gelek caran bûye reşebayî, bobelîsk, tofan û baran, lê teht û kelemên serê çîyayên Kurdistana dabeşkirî li cîyê xwe da mane, ne leqîyane; Cegerxûn jî mîna wan teht û keleman li ser bîr û bawara xwe da bi qaym, berk rawestayê, ji cîyê xwe çep û rast ne leqîyaye, ne hejîyaye, raste-rast li rîya xwe da ber bi merem û mebesta xwe diçe û wê here; ew bûye dengbêj û borîjenê serbetîy û azadkirina neteweyê kurd, ev bû û ev e armanca jîyana wî mîrî. Li dor û berê çîyayên Kurdistan, li deşt û bestên Kurdistanê xûnavî da xelqê Kurd toximê kurdewerî û wetenperweriyê reşandîye. Li tarîx û dîroka Kurdistan da gelek û

gelek zefîtkar hatine, ku rabine ser wan teht û kelemên serê çîyayên welatê Kurdistan, xwestine Kurdistan qir bikin, li nav xwe da pûç bikin, bihelînin, lê nikarbûne û nikarin bikin. Ji rojhilat, ji rojava, ji jor (bakûr) ji jêr (Başûr) gelek û gelek caran dijminan li ser Kurd û Kurdistanê da girtine, gelek caran mîrkuj û xûnrêjên mîna Cengîsхан, Ayatola û mayatola Kurd û Kurdistan kirine nav agir û alavan, talan û tajan kirine, sotine, kuştine, lê nikarbûne reha Kurdistan ji binîva biqurçimînî, nikarbûne û nikarin, çimkî gelek mîrên mîna Cegerxûn ji nav sîng û berên çîyayên Kurdistanê ji paşîla jinên Kurd yên delale xûnşîrîn û binge û binejîya Kurdistan derketîne, rabûne û ala kurdewerîyê û kurdperwerîyê, ala azadkirina kurd û Kurdistanê girtine destê xwe, serwerî û rêberî li şerê serxwebûna neteweyê xwe kirine. Navê gelek mîrxas, şerkeran û qeremanan li tarîxa kurdan da, xasima li sedsalîyên nozda û bîstan da, aşkera ye. Wana jî toximê azadkirina kurd û Kurdistanê reşandîye, her sal li dû hev ew toxim li nav deşt, mêrg, newal û bestên welatê kurdan da hêşîn dibin, digihîjin, li nav wan da gelek kulîlk, gul dibişkivin û dilê keç û xortên kurd şa dikin û pê ra jî tîne bîra wan, ku ew gul, ew kulîlk bi xûna mîrxasên meydana şerê serxwebûna neteweyê kurd avreşan bûne, gihîştîne û bihar bihar her sal dil û canê qîz û xortên kurd qal dikin û ew hazir dibin bona rojên oxirmê giran, bona roja xîret û namûsê.

Miletê kurd bi navê mîrxas û qeremaneşerê serxwebûna welatê xwe fexîr û kubar dibê, nek bi tenê bona wê yekê, kul i tarîxê da ew mîrxas û ew qereman bi çek û sîlihan va rabûne, derketine meydana şerê azadkirina milletê xwe, lê wusan jî wana mala xwe, canê xwe û ruhê xwe terxan kirine bo xatirê serxwebûna kurdan, bo xatirê azadîya wan. Miletê kurd wusan jî bi navê şayîr û helbestvanên xwe fexîr û kubar dibê, ew qedir û qîmetê wan dizane, bi navê wan serbilind e, çimkî ew şayîr, ew helbestvan ji ber pêş û paşîla jinên kurd yên jîr û êgîn û zîrek derketine, ji nav şaxên Kurdistanê rabûne, derketine meydana şer, li rex qeremaneşekdar wek teht û kelemên serê çîyan bi şeranî ala rengê sor, kesk û sipî girtî-

ne destê xwe, şer kirine, mala xwe, ruhê xwe, canê xwe terxan kirine bo xatirê azadkirina neteweyê xwe, welatê xwe.

Çaxê ez navê şayîrên kurdan, navê helbestvanên kurdan tînim bîra xwe, herdem navê hezkerê me, şayîrê me mezin û hêja Cegerxûn tê ser lêvên min, li hiş û serê min da rûniştîye ku ewî jî mala xwe, ruhê xwe û canê xwe terxan kirîye bo serbestî û serxwebûna kurdan; dibe rast e, ez bêjim li sedsalîya me da şayîr û helbestvanê kurdên kurmanç yê herî mezin bi fikir, bîr û bawera xwe va weke (mîna) Cegerxûn tune. Cegerxûn bi rewşa xwe va, bi efirandinê xwe va, bi ramana xwe va behra bê berî û bê binî ye, gelek giran e meriv noqî wê behrê be û bizanibe çi di wê behrê da heye. Bona wê yekê divêt meriv noqvanê zana be û pispore be; ez xwe hesab nakim merivê wusan. Cegerxûn nek bi tenê şayîr û helbestvan e, ew wusan jî zana û zanyar e, ne rehet e li ser hemû efirandinên Cegerxûn li vira binivîsim û fikira xwe bi firevan binivîsim. Lê her çend kovara "Roja Nû" spartîye min, ku ez pêşgotinê bona diwana wî, bona wî şêrê nav çiyayên kurdan binivîsim, ez nikarim bêjim na, ez mecbûr im qasî qewata xwe, qasî zanîna xwe çend gilîyan binivîsim; lazim e ez binivîsim çimkî "Roja Nû" dixwaze wê diwanê çap ke bona palan û gundî û xebatkarên kurd. Di vî îşî da ez berpirsiyar im çend gilîyan binivîsim.

* * *

Li sala 1947 li Însîtûta rohilatnasîyê da ez mijûlî ziman, etnografî û lîteratûra neteweyê kurd dibûm. Li wê însîtûtê da gelek zanyarên Rûs yên mezin û navdan dixebitîn; li nav wan da çend profesorên qedirgir hebûn: Aleksandir Arnoldoviç Frêyman, ew serokê koma îrannasan bû, ez li ber destê wî û bi serkariya wî mijûlî karê xwe dibûm. Îgnatî Yûfianoviç Kraçkovskî serokê koma erebnasan bû, akadêmîk Vasîlî Vasîlêviç Strûvê, serokê însîtûta rohilatnasîyê bû, Evgenî Edûardoviç Bêrtêls, serokê kafêdra filologîya îranîyê ya fakûltêta rohilatnasîyê ya zanînga Leningradê bû û yên din bûn. Mabeyna min û wan xweş bû, wana ez hez dikirim û gelek caran arîkariya min dikirin, temî û wesîyetên baş didane min.

Rojekê ez li sivdera însîtûta me da rastî profêsor Kraçkovskî hatim. Ewî ez dame seki-

nandinê, devê çentê xwe vekir û kitêbek jê derxist, dirêji min kir got "Xortê delal, han ji te ra vê kitêbê, dibe hewasa te pêra hebe, bi kurdî nivîsîne, îrannasê navdar Vlîdmîr Fêdoroviç Mînorskî ji Londonê şandîye, lê binhêre, bixûne, dibe kêr te bê."

Min ew kitêb hilda, lê nihêrî, dît, ku bi herfên latînî li ser nivîsîne "Dîwana Cegerxûn", min rûpelê wê vekir, li rûyê din dît: şiklê Cegerxûn çapkirî bû, li binîya wî da nivîsî bûn: "Xwedîyê diwanê". Min fehm kir, ku Cegerxwûn xweyîyê diwanê ye, lê min nizan bû Cegerxûn kî ye, min navê wî, navê merivê awa nebihîstibû, ez fikirîm, ketme mitala "Cegerxûn kî ye?" çima "Dîwana Cegerxûn"; li berê ez haj pê nîn bûm, ku Cegerxûn şayîr e.

Min belgên kitêbê wergerandin, navê çend şîeran xwendin, li axirîya kitêbê navnîşa şîeran nivîsandibûn, min pêşgotin xwend û pê hesiyam, ku kitêb li Sûriyê bi arîkariya rewşenbîrkerên kurd hatiye çapkirinê, ku Cegerxûn navê şayîrî zêdeye, navê wî eslî Şêxmûs e, yanê Şêx Musa ye. Bi naverokên şîerên diwana wî ez pê hesiyam çima ewî navê "Cegerxûn" li xwe kirîye. Ji ber halê qûltîya miletê kurd. Ji ber derd û kulê gundî û pale û xebatkarên kurd ew dilêş bûye hergav bûye ah û zarê wî, dil û cegera wî xûn girtine, sebeb vê yekê ewî navê xwe kirîye Cegerxûn. Bi xwendina diwana wî ez pê hesiyam, ku ew ne şayîrê sedsalîya navîn e, lê şayîrê zemanê me yî niha ye; hewas û kêfa min bi zimanê diwana wî ra hat, kurmançîya wî gelek xweş bi min hat, gelek wext bû, ku min ew diwan hergav bi xwe ra dibîr, ji destê xwe der ne dixist, çaxê ez ji îş û karê xwe azad dibûm, min ew dixwend, çiqas diçû, ewqas hewesa min bi şîer û helbestên wî ra dihat, her şîerekê, her helbestekê ez didame hêlana û heyecana. Di wan da derheq derd û kulê miletê kurd, jîyîn û halê Kurdan û şêrê wanî serxwebûn hatibû nivîsandinê. Berê min qet kitêbên nivîskarên kurdan yên mîna vê diwanê ne dîtubûn û ne jî xwendubûn; li wê diwanê da berê pêşîn min deng û basên yekbûn, hevkarîya kurdan bo xatirê serxwebûna welatê wan xwend. Bi xwendina wê diwanê hate ber çavê min dîroka şêrê kurda, serhatî û dîroka zana û hozanên kurdan, min xwe bextewar hesab kir, ku diwana wusan ketîye destê min, ku pê hesiyam, ku şayîrekî kurda wusan heye û navê wî Cegerxûn e.

Ji welatê Sovêtê der bi saya serê Celadet Bedirxan û Kamûran Bedirxan nav û dengê Cegerxûn zû va li nav her çar parên Kurdistanê da belav bûbû, herdu mêrên qeremanê şerkerên rewşenbîrkerên neteweyê kurd li kovarên xwe "Hewar", "Roja Nû" û "Stêr" da, "Ronahiyê" da herdem şîer û helbestên Cegerxûn çap dikirin û kovarên wan li nav salên 1932 û 1945 da bûbûne bînge û binaxa çapkirin û belavkirina efirandinên Cegerxûn. Eger ew kovar tunebûna, ne hatina çapkirinê, şîer û helbestên Cegerxûn jî qet çap ne dibûn û xelqê kurd pê ne dihesîya, ku li nav wî da hozan û zana û şayîrên mezin hene, ku yek jî wan Cegerxûn e.

Di kovar û rojnamên Celadet Bedirxan û Kamûran Bedirxan da kurdnasê firansî Toma Buwa û Rojê Lêsko, çende mîqalên biçûk derheqa jiyîn, îş û karê Cegerxûn da û derheqa şîer û helbestên wî kurdewerî û wetenperwerî da çap kirine. Bi gilîkî ji welatê Sovêtê der nav û dengê Cegerxûn zû va eşkera bû, her li Sovêtîstanê kesek haj wî mêrî tune bû, navê wî ne bihîstibû ne jî efirandinê wî xwendibûn.

Li sala 1952 an da min mîqalek bi navê "Lîtêratûra kurdên derwa derheqa halê kurdên Sovêtîstanê da" li kovara "Îstoriya î filolojîya stran Vostoka" da (vîp. 3) li Lînîngradê bi zimanê rûsî çap kir. Di wê da min çend rêzên şîerên Cegerxûn li ser welatê Sovêtê çap kirin, anîn her çavên xwendekaran, ku pê bihesîn Cegerxûn di şîerên xwe da dinivîse, ku Sovêtîstan dostnê neteweyê kurd e, ku ew terefdar û piştivanê şerê azadkirina xelqê kurd e, ku ekserê sor wê bibe azadkerê kurd û Kurdistanê, ku xelqê kurd ketiye ser rîya Marks û Lînîn û qet tu cara jî wê rê der nakeve.

Li paşê li nav salên 1946 – 1953 an da min li zanînga Lînîngradê da dersê zimanê kurdî dida şagirtên kafêdra filolojîya îranîyê. Bi biryarê wê kafêdrê gerek ew şagirtên kurdî hîn dibin, biçûna nav kurdên Ermenîstanê, bibînîn ew çawan dijîn û li nav wan da bi pratîkî hî-nî xebardana zimanê kurmançî bibin. Havîna sala 1953 min şagirtên xwe M. B. Rûdênko, R. L. Sabolov, T.N. Paxalîna, A. I. Îvanova, A. A. Grûnbêrg, H.I. Usupov û yên din bi xwe ra birne pratîkê nav kurdên nehîya Abaranê. Berî hingê hextê min lê xistibû, dîwana Cegerxûn ya duduwan jî ketibû destê min. Eva dîwana ji ya pêşîn baştir bû, tê da nek bi tenê şî-

er û helbestên derheqa jiyîn, ayîn, hal û dîroka şerê serxwebûna kurdan hatibûne nivîsandinê, lê wusan jî derheqa dostî, hevkarî, azadî û aş-ti li nav neteweyên bindestî da hatibûne nivîsandinê. Şîer û helbestên vê dîwanê gelek xweş bûn û min ew dîwan bi xwe ra bir. Ez û şagirtên min em li gundê Camûşvana mezin cîwar bûn. Hingê Emînê Avdel bi jin û zarûwên xwe ve hatibûne wî gundî, li mala xalê wî Cindî da cî-war bûbûn. Bi xwestina Emînê Avdel ez jî çûm ketima mala xalê wî û tev kulfetê wî cîwar bûm, şagirt jî li otaxên dersxanê di cî-war bûn. Hingê min carnar şîerên dîwana Cegerxûn ji Emîn ra û biçûkên mala wî ra dixwendin. Ew şîer bi Emîn û zaruwan xweş dihatin. Li paşê min û wî va ramana xwe kire yek, ku ji wê dîwanê şîerên Cegerxûn yên bajarvanîyê (şîer û helbestên pêşketî, şûreşgerî, kurdewerî, wetenperwerîyê, dostî û hevkarîya neteweyan) hilçinîn û cuda li berevokê da bona kurdên Sovêtê bi herfên kîrîlîkî (rûsî) çap bikin. Hingê hevalekî me kurd li komîteta partîya komûnîstên Ermenîstanê da dixebitî. Em çûne cem wî, ku ew arîkarîya me bike bi teva-yî em herne dîwanekî çapxanê lava bikin, ku şîerên Cegerxûn yên bijare bi herfên rûsî bona kurdên Ermenîstanê çap bikin. Ewî hevalî milê xwe ne da ber xwestina me, got: Ez çî zanim Cegerxûn kî ye, belkî koneperest derkeve, dijminê welatê Sovête be, zehf ji ewî çend xeberên baş derheqa welatê me da nivîsîne xwe hesab dike Bolşevîk, komînîst." Ez û Emînê Avdel di dilê xem, por pojman ji otaxa qulixa wî derketin, vegerîyan çûn.

Li sala 1957 da min rêzmana xwe ya kurmançî (Gramatîka kurd skogo yazîka (kurmançî) bi zimanê rûsî çap kir. Hingê min pê ra layq dît çend şîerên Cegerxûn di wê rêzmanê da çap bikim. Min ev şîerên jêrin: "Halê gundîyan", "Reşo û gundî", "Ta kengê emê karker û cotkarê bega bin", "Xwendin", "Pembûwê meye, lê em tazîne", "Heval pol Robson", "Mehrecana Bêrlînê", "Hozan û şayîrên kurd" di wê rêzmanê da çap kirin (300 310). Di rûpela şeşan da derheqa Cegerxûn da min ev xeberên jêrin nivîsîne: "Cegerxûn vîdayûşîsya kurdsîy poët Sîrîf, borêts za nasîonolnûyû nê-zavîsîmost, dêmokratîyû î osvobodênîyê naradov Blîjnêgo Vostoka ot gnêta împriâlîzma" yanê "Cegerxûn şayîrê kurdên Sûrîyê navdar e, li helbestên xwe da ew derdikeve meydana

şerê azadkirina netewayên bindest ji bin zulma împêralîzmê bo xatirê serxwebûna wane demokratî."

Li paşê di nav salên 1963 – 1966 Ordîxanê Celîl ji Ermenîstanê şandibûne Lînîngradê cem me, ku qursa apîrantûrê da hîn be. Çaxê ew hîn dibû, min herdu dîwanên Cegerxûn dane wî, ku bixûne. Li wextekî da ew bû nasê efîrandinên Cegerxûn, şîer û helbestên wî hez kirin. Rojekê ewî ji min ra got: "Apê Qanat, baş dibe, eger hine şîerên Cegerxûn bi herfên rûsî bona cahilê Ermenîstanê çap bikin." Min got: "Ew meremêkî baş, çend sal berê min bi xwe xwest wê xebatê bikim, lê hingê hevalekî qulixdar û berpirsiyar li wê pîrsê da arîkarî min ne kir, niha tu bike, ezê arîkarî te bikim, şîerê Cegerxûn bijare çap bikin." Ew şîer û helbestên Cegerxûn ji dîwanên wî yê bajarvanîyê derxistin, wergerandine ser herfên rûsî û pêşxêber ji berhevoka wan şîeran ra bi kurmancîya şkestî nivîsî, di wê pêşgotinê da derheqa qedir û qîmet û nîrxê wan şîeran li pîrsa civakî û şîyasetîyê da şirovekir, pêşgotin da min, min ew rast kir û ramana xwe bona çapxana Ermenîstanê nivîsî, ku çapkirina wê berhevoka şîer û helbestên Cegerxûn gelek bi muhîm û feyda ye bona kurdên Ermenîstanê. Ew Berevok li sala 1966 li Ermenîstanê bi lê nihêrîna Wezîrê Eşo hate çapkirinê.

Li sala 1966 ji Azêrbecanê kurdekî ji min ra namek nivîsî; ewî di nama xwe da nivîsîbû: "Navê min Eskerov Şamil e, ez kurdê nehîya Kelbêcarê me, li wê nehîyê de kurd dijîn, min mekteba partîyê li Bakuyê xilas kirîye, niha li nehîya Kelbêcarê li nav kurdan da mijûlî xebata rewşenbîrkirina netewe dibim, mela min heye li ser lêgerîna lîteratûra kurdî bixebitim, ez lava dikim, tu bi kerema xwe ji min ra biniwîsî lîteratûra kurdî heye? Li kîderê dest dîkeve?"

Min bersîva nama Eskerov Şamil nivîsî, ku "du dîwanên şayîrekî kurdên Sûrîyê li cem min hene, nivîsarên wî gelek bi qîmet û hêja ne, navê wî Cegerxûn e, ezê dîwanên wî ji te ra bişînim, tu bixûne, bi fikira min layq e meriv xebatke zanyarî derheqa efîrandinên wî da binivîse." E qayî bû name nivîsî, got: "Bi kerema xwe wan herdû dîwanan ji min ra bişîne, ezê ser bixebitim, lê bigerim, sere derîyê lê bikim, dîsêrtasîya zanyarî li ser efî-

randinê wî da binivîsim." Min herdû dîwanên Cegerxûn ji Eskerov Şamil ra şandin. Sal û nîvek şûnda ew hate Lînîngradê, meheke havîn li mala min da ma, hemû kovar, rojnamayên kûrmancî (Hewar, Roja Nû, Ronahî, Stêr) û kitêb û pertokên li ser tarîx û kûltûra kurdan çapkirî xwendin, çi bona xebata wî zanyarî lazim bû, ewî jê hiçand û sala 1969 bi xêr û silamet dîsêrtasîya xwe "**Efîrandinên şayîrê kurd Cegerxûn**" pawan kir. Xên ji wê ewî pertokek bi zimanê azerbêcanî "**Xelqin şayîrî Cegerxûn**" çap kir. Di xebatên xwe da Eskerov Şamil efîrandinên Cegerxûn parê ser van koman dike: 1) Şîerên yekbûn û rewşenbîrkirinê (Ronahîkirinê); 2) Şîerên dostîye neteweyê kurd û neteweyê Sovêtê; 3) Şîerên li ser aşîtiyê li dînya-yê da; 4) Şîerên pêşberî şêx û pîrên muftexûr.

Li paşî analîza van şîeran Eskerov Şamil mijûlî kêş û qafîya (çapa rêzbandê) şîerên Cegerxûn bûye û hatîye ser wê fikirê, ku Cegerxûn şîerên xwe bi çapa rêzebenda û forma mûxames, mesnevî, qasîde, rûbayî û xezel li hev anîne lê bi piranî ewî şîerên xwe bi formên bangan nivîsîne, gelek şîerên wî rêzên wan şeşbangî ne, heftbangî ne, heşbangî ne, dehbangî ne, û mîne stranên kurdî bendên wan li hev tîne û bi teqîl lêne gotinê û stranê. Li paşî wan nivîsarên min ji jorê navê wan nivîsandî li gelek nivîsarên nivîskar û zanyarên Sovêtîstanê da navê Cegerxûn dihate nivîsandinê, di hate gotinê, ku ew şayîrê neteweyê kurdî herî pêşkevtî ye, herî demokrat û înternasînalî ye (binêre "Almanax Kûrdskey Lîteratûrî", Bakû, 1959; Nado Mahmûdov, Neteweyê kurd, Êrêvan, 1959 (bi zimanê Ermenî); Boşlaya Sovêtskaya ênsîklopêdiya, Moskova, 1963, t. 24; Jûrnal "Drûjba narodov" 1963, N 12 û yên din).

Bi vî cûreyî nav û dengê Cegerxûn li nav Sovêtîstanê da belav bû, biçûk û mezinên kurd navê wî, şîerên wî bihistine, dixûnin gelekên şîerên wî ezber kirine, li êvarîyan da bi ezber dibêjin; zanyarên kurd û rohilatnasên Sovêtê pê hesîyane, ku şayîrekî kurd şûreşgir, pêşketî û demokrat heye, ku navê wî Cegerxûn e. Me ev zanibû çaxê herdu dîwanên wî pêşin ketibûne destê me. Niha em pê hesîyane, ku dîwana wî sisîyan "**Kîme ez**" derketîye û niha ji

dîwana wî ya çaran hazir bûye bona çap kirinê. Eger em bi temamî li naveroka (mezmunê) hemû dîwanên wî binhêrin, baş bifikirin, emê bêne ser wê fikrê, ku efirandinên wî bi bîr û bawera xwe va, bi nêt û merem û mebestên xwe va pareve dibin ser van koman: 1) Şêr û helbestên li ser jîyîn, ayîn û halê kurdan; 2) Şêr û helbestên li ser zana, hozan û şayîrên kurdan; 3) Şêrên dildariyê û evîntîyê; 4) Şêrên li ser bajarvaniyê (yên dostî û hevkarîya neteweyan û aştî li nav wan da); 5) Şêrên tarîx û dîroka şerê serxwebûna kurdan; 6) Şêrên pêşberî muftexurên (axa, begen, şêx, pîran, bûrjuwa û kapitalîstan); 7) Şêrên pêşberî zumla faşîzmê; 8) Şêrên rewşenbîrkirina (ronahîkirina) neteweyê kurd; 9) Şêrên pêşberî dîn, diyanet û ayîna berê kevneperestî; 10) Şêrên fîlîsofîyê. Bi cuda pêwîst e zanyar û lêgerîner li ser her komeke van şêrên Cegerxûn bixebite, bi zanyarî mijûlî analîza (ji hev derxistina) wan bibê, qîmeta wan, hêjayîya hunerê wan nîşanî xwendevanên me bikin. Lê sed car heyf niha zanyarên lîteratûra kurdî tunene, lê ez bawar dikim, kul î paşewextîyê zanyarên wusan ji nav neteweyê kurd derkevin, mijûlî wan pirsan bibin; kî dizane, dibe wextekê li Kurdistanê serbixwe da înstîtûta lêgerîna lîteratûra kurdî bê naskirinê bi navê Cegerxûn û di wê înstîtûtê da bi pîlanî mijûlî efirandinên wî bibin. Layq e jî bê sazîkirinê û zanyarên kurd bixebitin nek bi tenê li ser lêgerîna şêr û helbestên wî, lê wusan jî li ser nivîsarên wî derheq zimanê kurdî (li ser ferhenga wî kurdî û destûrîya wî ya zimanê kurdî û yê din). Bi fikr û ramana min efirandinên Cegerxûn bi temamî bi naverokên xwe va, bi hunerê nivîsarê va, bi bedewîya nivîsandina xwe va jî nivîsarên gelek şayîrên dinyayê bi navdar, sûreşgir û demokratên niha danaxwe. Eger şêr û helbestên Cegerxûn bihatana wergerandinê ser rûsî, înglisî, frensî û almanî, dinyayê pê bihesiya û bigota eva gilîyan rast in, neteweyê kurd dikare xwe bextewar hesab bike, ku şayîrekî wusan mezin, pêşkevî, demokrat û înternasionalîst ji nav sîngî û berê Kurdistanê derketîye û, helbet, neteweyê kurd dikare bi navê Cegerxûn ferix û kubar be.

Çend gilî li ser dîwana Cegerxûn ya çaran pêwîst e bêjim. Ew dîwana niha li ber

min e, ez bi hewesdar wê dixûnim û mîna berê şêrên wî, helbestên wî bi kurmancîya xweş û şîrîn hatine nivîsandinê. Çaxê meriv wê dixûne, qêmiş nake wê dîwanê ji destê xwe derxe, meriv her hewasdar e wê bixûne û dermanê dilê xwe tê da bibîne, çar û mîkan e, nêt û meremê xwe li rîya serbestkirina neteweyê kurd tê da bixûne, pê bihesê, bizanbe Cegerxûn şayîr û dengbêjê çi zemanî û çi bîr û bawerê ye.

Şêr û helbestên dîwana Cegerxûn ya çaran bi naveroka xwe va mîna şêr û helbestên her sê dîwanên wî pêşin in. Ew ji bi raman, nêt û meremên xwe va li ser jîyîn, hal û şerê serxwebûna neteweyê kurd hatine nivîsandinê. Bi texmîn ew parevedibin ser sê koman: 1) Şêrên evîntîyê (evîndariyê yan jî dildariyê); 2) Şêrên jîyîn, ayîna kurdan, yê tarîya wan û Kurdistanê.

Di dîwana Cegerxûn pêşin da şêrên evîndariyê tekete hene, di wê da pîranî şêr li ser jîyîn, ayîn, hal û tarîxa Kurdan, şerê wan nav xwe û pêşberî stemkaran, dijminên derva û hundur hatine nivîsandinê. Di dîwanên wî yê du du û sîsîyan da gelek şêrên wî evîndariyê hatine gotinê, mesele, di dîwana wî çaran da ev şêrên dildariyê çap bûne: *"Diyariya yarê"* (176), *"Yara"* (136), *"Pîr bûm, dil pîr nabî"* (144), *"Çep û rast"* (142), *"Derdê derûn im"* (181), *"Destê xwe paqijke ji xwînê"* (137), *"Dil perçe perçe hûr dikî"* (196), *"Cejna yar dilxweş dibî"* (171), *"Name ya derd û xeman"* (175), *"Bextê sipî"* (198), *"Zengil"* (119), *"Gazî jî çine"* (173), *"Ocaxa yar"* (183), *"Yar hat civînê min bi şev"* (185), *"Ev dinya pir xweş e"* (131), *"Tu zanî maç dermanim"* (179), *"Bi torê bixwîn vê namê"* (146), *"Di ser çavê mera hatî"* (160), *"Kurdistan"* (54), *"Guh bide dîrokê"* (199), *"Fetwa ya pîrê Mexan da"* (194), *"Şîrîn lebê"* (191), *"Me dil daye pertave"* (149), *"Dilo mizgîn li te şabî"* (192), *"Penge rû"* (177), *"Çi bikim bi rojî û nimêjê"* (92), *"Eman hey lê"* (201).

Di van şêrên xwe yê evîniyê da Cegerxûn ah û zar dike û ah û zara wî li ser welat tene kirinê, di wan da ew dibêje û ji xema dilan dilûvîne, ku ji dûrîya evîne derd û kulê wî pir bûne, di wan da ew xebera *"evîn"* li şûna xebera *"welat"*, li şûna xebera *"Kurdistanê"* dide

xebitandinê. Çaxê ew ji hizkirî, ji dilketî û evîna xwe ra dibêje: *"Eman ji derdê dûrîyê"*, ew dixwaze bêje, ku ewî dûr e ji welatê xwe, kul i welatê xerîba da dijî, ku ew ji derdê dûrîya evîna xwe Kurdistanê di xwe da ketîye, dîponîje, ew nîşan dike, ku ewî bîra welatê kal û bav"e kirîye, ku ew dixwaze welatê xwe azad bibîne, bi serbest hemêz ke, pê şad be, bighîje bext û mirazê xwe Kurdistanê azad û serbest bibîne. Bi şîerên evîntîyê Cegerxûn tê ber çavan mîna xortekî evîndar, mîna mêrekî miraxwez, ku evîna wî, mirazê wî serbestî û serxwebûna kurd û Kurdistanê ye.

Mesele:

*Pir xweş e, pir xweş e
Ev dinya pir xweş e
Yar pal daye ser min
Rû wek gula geş e*

*Serbest û azad in
Em dilxweş û şad in
Bê gilî û gazin
Bi dil hev dixwazin*

*Guldestên evînê
Pêlên derya jînê
Em gihan serbestî
Sed tif li bindestî (133)*

*Were meyger, bide cema lebaleb
Ku toza bendewarî dawegênim*

*Delala min dinav destên neyara
Dixwazim wêh i zorê rakîşênim*

*Mebên seyda Cigerxwîn bûye kal
Divê nemrim heta dilber bibênim. (153)*

*Were hembêz bikin em hev bi şadî
Berî dijmin me têxî bende û davê*

*Tu rojî dil disojî lê metirse
Cigerxwîn hişk û xurte wek benavê. (151)*

Şîerên Cegerxûn yên dildarîyê bi navê *"Agir û pêta evînê"* (154 – 159), *"Me dil daye Pertavê"* (8149), *"Dîyarîya yarê"* (135) û yên din bi naveroka xwe va yên hezkirina welat in, di wan da mirazê dilê Cegerxûn, dilxweza wî, evîna wî serbestî û serxwebûna kurd û Kurdistanê jîyîna bextewarîya wan e, mesele, li helbesta xwe *"Agir û pêta evînê"* da ew dibêje:

*Evîn ji pêta agirî
Dil girtîye qet namirî
Fêde çine ah û girî
Ahî ji destê te evîn*

*Nalîn ji her daxên dikul
Jan daye cerg û nav û dil
Lê, min şikestî pişt û mil
Ahî ji destê te evîn
Gava ji dilber dûr dibin
Birîn di dil de kêr dibin
Sermest û pird rencûr dibin
Ahî ji destê te evîn (156)*

Bawar bike li her şîer û helbestên evîntîyê da, yên di vê diwanê da çap bûne, Cegerxûn li paşî ah û zarîn kirina li ser evîna xwe, li paşî pensê wê dan, ev esse çend rêzên girîni li ser welatê xwe dibêje û xwendevanê xwe dide fehmkirinê, ku ewî bextreş e û mirazkor e, çimkî welatê wî bindest e, ku evîna wî, dilxwezî û bextewarîya xort û keçên kurd yên miraxwez her li zemanê serbestî û azadiya Kurdistanê da wê mîyaser be, biqede û bê serî.

Çend giliya pêwîst e li ser şîer û helbestên kurdperwerîyê û wetenperwerîyê binivîsim.

Li jorê li pêşîyê min da xuyarikirinê, kul i Sovetîstanê da saya serê xebatên kîjan merivan şîer û helbestên Cegerxûn, yên kurderwerîyê kurdperwerîyê, dostî û hevkarîya milêtên bindest ji herdu diwanên wî pêşîn aşkera bûne. Şîer û helbestên bi vî cûreyî li herdu diwanên Cegerxûn yê paşîn da (diwana sisîyan da û di vê diwanê da, diwana çaran da) gele kin, mesele, li diwana çaran da ev şîer û helbestên wî çap bûne: *"Destê xwe paqij ke ji xûnê"* (137), *"Rewşa Welêt"* (40),

"Bi ser çîyan ketim" (39), "Ji nûva em berjor diçin" (89), "Kî hilgiri v îbarê min?" (17), "Ez nîzanim çî bêjim" (28), "Ta neşewitin, ronî nadî welêt" (66), "Welatperestî" (68), û yên din. Di van şîeran da Cegerxûn dîsan mîna berê dike hewar û gazî, berê xwe li palan, rênçeran, xebatkaran, xwendevanan, zana û hozanên kurdan kirîye, diqîre, dibêje kurdno, ji xewa kibîr hişyar bin, xwe nas bikin, hûn kîne, yek bin, bi şêranî derkevne meydana şerê serxwebûna welat, ji bin destê goveka zulmkarên Îranê, Iraqê û Tirkîyê azad bin; di wan şîeran da Cegerxûn bernama şerê azadkirina kurd û Kurdistanê nîşanî neteweyê xwe dike. Cegerxûn dibêje: ku kurd bigihîjne merem û mebestê xwe, li pêşîyê pêwîst e dijmînê nav xwe (axa, began, şêxan, pîran, bûrjûwazan û kapîtalîstan) ji welat derxin, mesele, ew dinivîse:

*Ev bûye sed salên we
Kûçik dixun malên we
Keşe û şêx û mela
Li we dikin teşqela
Axa u mîr û paşa
Wek hîrç û gornepaşa
Ew tev beg û efendî
Lê win ji wan re gundî (114)*

*"Olperest û êlperest,
Navên kurd bibî serbest" (23)*

*Qata kurdên xwedî mal
Bi dijmînre hûn heval (87)*

*Dijmîn ku em derxin bi zor
Avên çeman em bibne jor
Zaz û hekar û bext û lor
Pir xweş bikin vî warê min (18)*

*Heta xwînê nerêjin
Em nikarin bibêjin:
Ku em ji hûne mîlet
Xwedî leşker, bi dewlet (86)*

Cegerxûn dibêje, ku gundî û xebatkaran tirk ji mîna gundî û xebatkaran kurd li bin destê qata jorîn da (sinîfa jorîn da) ya axa, beg, bûrjûwa û kapîtalîstên tirkînan da nin, ku ji bo azadkirina xwe herdu qatên jêrin tirk û kurd

bibin yek:

*Qatê jêrî tirk û kurd
Tev birçîne, tev zigurd
Divê ew dest bidin hev
Xebat bikin roj û şev
Bixin destê xwe ew dar
Herdû bibin xwedî par
Yanî bibin du dewlet
Dostê hev bin du mîlet (87)
Bibin bi dost û heval
Xwedî zêr û xwedî mal
Destûr bibî dûmuqrat
Dûmuqrata Rojhilat
Qad û xwendin tevayî
Wekhevî û birayî. (47)
Ez bilura Marks im
Dengê rista bêkes im
Ji hêvîyan avis im
Ez nîzanim çî bêjim (28)*

Di şîera xwe "Ta neşewitin ronî nadî welêt" (66) da Cegerxûn dibêje:

*Zenda vemalin, bikevin Zagros
Êrîşt dijmîn bikin bi harî
Em şêrên çîya, piling û ejder
Zaz û bext û lor, sor û hekarî
Rabin bibin yek, destan bidin hev
Ji bo me divêt tenê hişyari
Şazde milyon kurd gernas û mêrxas
dane serê xwe ew reşe – çarî
Ta kengî dijîn perçe, perçe kurd?
Ma kî dixwazî vî îş û karî!?
Raste bindesît karê qelsa ye
Ji ser xwe rakîn wê em neçarî (66)*

Rast e, kesek jî îş û halê neteweyê kurd qayl nabe nek bi tenê ew naxwaze vî îş û karî, wusan jî hemû dost û cînarên wî xêrxwez dixwezin, ku kurd bi serxwebûn bijîn. Çaxê xebêrden tê kirinê, ku neteweyê kurd bi tomerî 20 mîlyonî zêtetir e, (li Tirkîyê 10 mîlyon in, li Iraqê 3 mîlyon in, li Îranê 5 mîlyon in, li Sûrîyê mîlyonek e) xêrxwez û dostên kurdan dibêjin: "Divêt dewleta kurdan serxwebûyî hebe" Rast e, divêt serxwebûna kurdan hebe, lê neteweyê kurd ji destî dabeşkirina welatê xwe ketîye bin destê sê – çar gurên har, (hukumeta Îranê, Iraqê û Tirkîyê), ew tu caran naxwezînin

kurd û Kurdistan bi serbxwebûn bin, ew dixwezin heta hetayê parçê Kurdistanê li bin destê wan da bimînin. Dibe li paşewextîyê hal û wext û zeman bê guhastinê li wan her çar paşewextîyê hal û wext û zeman bê guhastinê li wan her çar welatan da kêr û zêde qayl bin avotonomîyê bidne kurdan, ew jî avotonomîya nav liser mîna avotonomîya kurdan li Iraqê da.

Niha em dibînin, ku dînya parevebûye ser sê komên mezin: 1) Dînya sîstêma welatên sosyālîstîyê; 2) Dînya sîstêma welatên kapîtalîstan û împêralîstan; 3) Dînya welatên serxwebûyî yên bêtêref. Welatên Îranê, Iraqê, Tirkîye û yen din li Rojhilata nêzik dikeve nav dînyaya welatên sîstêma serxwebûyî. Ew welat jî dibînin eger hal û wextê dinyayê tê guhastinê û eger xêr û bêr û kara wan di wê guhastinê da hebe, ew sîyasetîya xwe derva diguhêzin: yan xwe li alîyê dewletên sîstêma sosyālîstîyê digrin, yan jî xwe li alîyê dewletên sîstêma kapîtalîzmê digrin û bi dizîva dibne dost û hevalên împêrîyalîzmê.

Bi xebirdan, bîzar her kes dibêje "li zemanê hilşandîna (ruxandîna) sîstêma kolonyaliyê da, helbet, mafê neteweyê kurd heye bi serxwebûn û serbest bîjî." Ku xelqê kurd serbest be, bi serxwebûn bîjî, lazîm e hukûmetên sîtemkar destê xwe li parçê Kurdistanê bikişînin, bihêlin kurd bi serbestî û serefray bîjî, yan jî pêwîst e neteweyê kurd hemû hêz û qewatên xwe bike yek, şer bike û bi zorê serxwebûna xwe bi destê xwe va bîne. Ji van herdu rîyan rîya pêşîn bî destî hukûmetên sîtemkarên kurdan qet tu caran nabe û nayê kirînê, rîya paşîn her rîya rast e. Şûreşgerî ye, divêt di wê rê da yekîtiya kurdan hebe, ew bî destê zorê serxwebûna xwe bi destê xwe va bînin. Ji ber vê yekê Cegerxûn dibêje:

Heta xwîne nerêjin

Em nikarin bibêjin:

Ku em jî bûne millet

Xwedî leşker; bi dewlet (86)

Zanim sîyaset tev derew

Divê ku kurd rabin ji xew

Destan bidin top û tîving

Li ser çîyan qêrîn û deng

Ji nav welêt derxin neyar

Qada me namênit beyar (100)

Hewar û gazîyên Cegerxûn: "Şer kin bo xatirê welat", xwîne nerêjin, kesek ji me ra nabêje millet", rast in. Lê pêwîst e serkarên tevgera neteweyê kurdan baş bizanibin, ku kengê pêwîst e kurd bi top û tîving derkevine meydana şerê serxwebûna kurd û Kurdistanê. Bi top û tîving, xişt û xenceran li paşî şûreşa Okyabrê li nav salên 1918 – 1932 da kurd rabûn, şer kirin pêşberî sîtemkarên xwe. Hingê wextê wan çek û silîhan bû wî wextî sîtemkarên kurdan sist bûn, mîna niha tank, balafir (firoke), rakêtên wan tune bûn, eger yekîtiya kurdan wî wextî hebûya, eger axa, beg û şêxên kurdan xayîn derneketana, terefdar û arîkarên kurdan jî welatê derva hebûna, kurdên serbest bibûna, ser ketana. Lê sed car mixabin, wusan neqewimî. Ew sal û zeman çûn, derbas bûne, niha hal û hewalê welatên sîtemkarên kurdan hatiye guhastinê, ew bi hêz û qewat bûne, bûne xwedî leşkerên bi tertîb û tendurust, bi tank, top, firoke, rakêtên şer, hemû sazmanîya hukûmeta wan, hemû teşkîletên wan yên partîyê, yên rewşenkirinê bûne hêlîna şovîniyê, faşîzmîyê. Eger niha kurd bi top, tîving û reşas, be alîkarîya hundur û derva rabin, li serê çîya şer bikin, ew nikarin li pêşberî leşkerê bi tank, firoke, rakêt, teyax bikin, dibe şerê wan wê waxtekî bikişîne, lê divêt ew bizanibin, ku ew dişerê wusan da ser nakevin, wê belaş xûna xwe birêjin, gundên xwe, bajarên xwe bidne ber tankan, firokan birûxin û malê xwe bidne talan û tajankirinê. Şerê kurdan e serxwebûna wan niha pêwîst e bi şerê hemû îşker û karke- rên tirk, ereb û farsan va bê girêdanê, divêt pale, gundî, rencber, xebatkar û bîrewerên gund û bajarên tirk û kurd yên ereb û kurd û yên fars û kurd bi hevra, bi tevayî rabin pêşberî kevneperestan û împêralîstan, pêşberî zumla hukûmeta dîktatorî, bo xatirê sazmanîya here demokratî, bo xatirê dostî, hevkarî û wekhewîya kurd û ereb, kurd û tirk, kurd û farks. Ev e armanca nivîsarên Cegerxûn. Li cîkî du ew dibêje: "Em şer naxwezin, lê ew tê ber derê me" (58)

Şêrên wesa naxwazin

Ne gîlî û ne gazin

Milet hemî bibî şêr

Nebî jor û nebî jêr

Bê tîzbî û def û xişt

Welêt bikin wek bihişt

*Ne bindestî ne jî zor
Bere bîmrî qata jor
Tev de em bibne yek qat
Destûr bibî dûmuqrat
Pale bibin xwedî kar
Zevî bidin dest cotkar*

*Doza me ye serxwebûn
Lê di xwazin pêşveçûn (52)*

Di dîwanê da wusan jî çend şîer û helbestên mezin li ser ayîn û tarîxa neteweyê kurd hatine çapkirinê, mesele: *"Em şer naxwazin, lê ew tê her derê me"* (58), *"Aleqemşê"* (83), *"Hovîtiya dijmîn"* (20) û yên din. Ev şîer û helbest ne mîna şîer û helbestên evîntîyê û kurdperwerîyê ne, ev ji wan mezintir; her yek ji wan wek sê – çar – pênc – deh – donz-deh belg in, ew mîna serhatîyan û dastanan dirêj in û bi naveroka xwe va ew jî mîna wan li ser jîyîn, ayîn edetê kurdan û dîroka wan tene gotinê. Bi gilîkî bi naveroka xwe v abi teqil û li hev anîna bendên rêzên bi rengê şîeran û helbestan hatine nivîsandinê. Şêr û halbestên Cegerxûn yên bi vî cûreyî nivîsandî li dîwana wî pêşîn da jî hene, mesele, *"Serxwerabûna mirîşkan"* (48-50), *"Şahnama şehîdan"* (5-56), li dîwana duduwa da *"Cotkar û zevî"* (102 – 107), *"Serpêhatiya Cîwan û dewlet"* (108-121), *"Tarîxa siltan Saledînê Kurd"* (126-129), *"Serpêhatiya Şepal û Sitêr"* (111-118) û li dîwana sisîyan da: *"Kîme ez"* (9-16), *"Pîra merivxur"* (61-68), *"Zincîr ji gerdanîm şikest"* (84 – 94), *"Rencberê bi rûmet"* (169-178), *"Nivîsarek bi yar"* (188 – 195) û yên din.

Ku xwendevanên me delal baş haj qîmet û nîrxê van serhatîya û destana (poeman) bin, divêt meriv başqê mijûlî lêgerîna tertîbî, tendurustî û sazmanûya wan be, guh bide ser naveroka wan, xemlandîna wan û xeberên wanê bedewî. Eva jî mesleke mezin e bi he-wasdar e li pîrsên lêgerîna efirandinê Cegerxûn da. Em hêvîdar in li paşewextîyê zan-yarên lîteratûra kurd wê vê pîrsê safî û zelal bikin.

Li kurtayê da ez divêt bêjim, ku ev serhatî û destan tev wan komên jorên min navê wan nivîsandî xizneke gelek girnbiha ne, ew bi tevayî ênsîklopêdiya jîyîn, ayîn û hal û tarîxa neteweyen kurda ne, ênsîklopêdiya şerê

wî yê serxebûne li nav salên destpêka sedsalîya bîsta heta van salên paşîn. Merivê baş herçar dîwanê wî bixwîne, mijûlî naveroka wan û sazmanîya wan be, wê bê ser wê fikirê û wê ramanê, û bêje bi rastî her çar dîwanên Cegerxûn ênsîklopêdiya peydabûn û pêşveçûna neteweyê kurd de, ya helketin, serketin û daketina şerê serxwebûna kurda ne, ênsîklopêdiya rabûn û rûniştina kurda ye, ya hevbendîya kurd, ereb, fars û tirka ne.

Her şîereke Cegerxûn, her helbesteke her çar dîwanên Cegerxûn ji nav dil û hinavê wî, ji kuranîya dilê wî, ji hiş û aqilê wî gihîştî û safî û ji behra zanîna wî hatine gotin û nivîsandinê; peydabûna wan, efirandîna wan bi hal û wextê dinyayê ra girêdayî ye, ji berhal û jîyîna kurdên bindest û zerandî û ji ber roja wane reş û bextê wanî kor û şîer û helbestên Cegerxûn hatine hunandinê. Di wan da wêne û şiklê kurd û Kurdistanê bi destê hostayê xeberên bedewî kişandî ne. Kesek di xemil, nexş nîtra wan da şikbir nabe, gişk bi rast û rasteqîn in. Lê pêwîst e ji bîr nekin, ku ew li cî û wextê xwe da giranbiha û bi nîrx in. Bingeha naveroka her çar dîwanên wî, bîr û bawara efirandinên wî ew in, ku şervan û tekûşerên neteweyê kurd zanibin, ji bîr nekin, ku rîya azadkirina kurd û Kurdistanê dîr û dirêj û giran e, bona wê yekê niha li berê pêşîn lazim e yekitîya hemû kom û partîyên wan hebe, lazim e li pêşîn ew bixebitin, nehêlin millet qir bibe, pûç be, divêt millet xwedî bikin, ku ew xwe wunda neke, zimanê xwe, kultura xwe, yekitîya xwe pêwan bike, bona vê yekê divêt kom û partîyên wan li her der abi serbixwe hebin, divêt komên wan (yên xortan, yê jinan, yê xebatkaran, yê gundî û palan, komên ronahîkirina millet, yê çapkirin û belavkirina kovar û rojnamên kurdî) bi aşkera û binîva hebin û tevgerêdana wan bi hevra hebe, divêt tegirêdana wan wusan jî bi hemû komên pêşkevî yê ereb, tirk û farsan ra hebe, bi tev wan bixebitin, pêşberî kevneperestan û împêrîalistan şer bikin, şer bikin bo xatirê serbestîya xwe bo xatirê dostî, biratî, hevkarî û aşîti li nav kurd û ereb, kurd û tirk, kurd û fars. Ev e bîr û bawara Cegerxûn, ev e dîlxwezîya wî, merem û mebesta efirandinên wî.

Lenîngrad, 20.09.1980

CEGERXWÎN, DENGBÊJÊ RASTIYÊ Û AZAYÊ

CASIMÊ CELÎL

Navê Cegerxwîn, navê hostê xebera, xudanê lewzê şîrîn li herçar terefê Kurdistanê, ji rohilatê girtî hetanî-roavayê, ji şimalê hetanî canûbê nava xwendevanê kurda da xweş eyan e. Şîêrêd wî bûne stran û nava cimetê digerin. Xort û qîzê kurdayê nû bişkivî nivîsarê şayîr bi devkî hîn dikin, bîr û bawariya xwe, miletperwariya xwe bi wan şîera tam dikin û bi xwe ji dibin ceger bi xwîn. Tûne civînek yan jî êvarek, li ku şîêrêd hilbestvanê kurdayî nav û deng neyêne xwendinê.

Navê Cegerxwîn nava kurdê Sovêtê da ji eyan e.

Îro welatê Sovêtê da —welat, kîderê zixtî û zordestî, newekehevbûn û koledarî ji binyatê hatîye rûxandinê. Kîderê bi seda cimet azayî û serbestîya xwe destanîne, pareke cimeta kurda tevî wan cimetêd bira çanda xweye miletîyê pêşda dibe, bi tarîq û lîteratûra xweye kevnar dibe nas û bi hizkirin, navê Cegerxwîn diwekilîne wî va kubar dibe.

Zarokê kurd li Ermenîstanê, mektebvanê koma çara gava pertûka xweye dersê- "Zimanê kurdi" vedikin, şîera Cegerxwîn "Xwendin" dixwînin. Ewana dengê hilbestvanê şorişvan dibêhên, dengê nalîna dilê wî-bona halê welêt, gazîya wî, ku xort û qîz baş bixûnin, çimkî:

*"Xwendin nebî kes naçe pêş
Peyda dibin pir derd û êş
Her dem di bin destê neyar
Em dê bikin xukî û bêş."*

Sal bi sal mektebvanê kurdê sovêtê diha nêzik û hûrgili nasîya xwe didine emirjîyîn û bîr-bawariya hilbestvanê hizkirî. Ewana li dersxana V-VI da nava pertûka dersêye "Lîteratûra" da ser Cegerxwîn dixwînin, ku "Zarokî û xortaniya Cegerxwîn halekî giran da derbazbûye. Ji çûktiyê xwe gelekî bi xwendinê girtîye, lê ewî nikarbûye xwastina xwe nîaser bike, çimkî bona wê yekê mecal lazim bûne."

Şagirt ji wê pertûkê derheqa wê revê û ç-

tinayê pê dihesin, kîjan hilbestvan xortaniya xwe da dîtîye. Ewana dixwînin, kut evî wê hesîrîyê, êş û lê danê rîka şerkariyê, miletperwariya kûr dilê şayîr da sist nebûne, agirê gumanê bona azayê hela diha gurbûye û lema jî Şexmûsê ji gindê Hesarê bûye dengbêjekî ceger bi xwîn. Li pirtûka dersxana V-VI-da ewana dixwînin: "Cegerxwîn çawa şayîr, çawa şerkarê miqabilî împêrialîzmê, kolonîalîzmê û zordestîyê timê ji aliyê cimete kurda da hatîye hizkirinê. Ew tucara ji dijmina netirsîyaye, tucara ji serkariya cimetêye giran xwe şûnda ne-girtîye."

Du şîêrêd Cegerxwîne eyan: "Kurdistanîm Ka" û "Pembîwê me ye, lê em tazî ne" li nava wê pertûka dersê da nin. Halê miletê kurde bindest û zêrandî nava van herdu şîera di bi firekî vedibe. Mektebvanê Sovêtêye kurd, ku welatê xwe da bindestî û zêrandin nedîtîne, îdî rind zanin ku kurd û Kurdistan bi nîrê neheqîyê da zara-zar in, bindestî dewletêd kolonîalist da tîş-tîşî ne, pîre-pîre, û lema Cegerxwîn dike gazî, dike hewar:

*"Bax û bostanim ka?
Ax, gulistanîm ka?
Dijmin tev girtin ax!
Ax, Kurdistanîm ka?"*

Serpêhatîya Cegerxwîn —ew serpêhatîya miletê me ye; kesibî, zulm û zorî, hebs û lêdan, werguhêzî û mihacirî. Lê tevî van gişka-serbilindî û kubarî, mîrxasî û egîrî, hîvîya bêşikbi şerkarî bigihîje armanca xwe. Bîr û bawariya nivîsarên Cegerxwîn ew bîr û bawariya miletê me ye. Loma jî ewana ewqas ji aliyê cimete hizkirî ne û milet wana diparêze.

Mezinaya Cegerxwîn, çawa rewşenbîr-merrivêkî xudanê bîr û bawariya pêş nek tenê li wê yekê da ne, gelo ew çawa halê miletê xwe dikewgire, bona miletê xwe dike hewar û gazî. Mezinaya her fikirdarekî, usa jî mezinaya Cegerxwîn nava wê yekê da ne, wekî ewana ji qalibê miletîyê dertên û bi fikir da rîya xwe va dibine hûmanîstêd mezin, dengbêjed hemû miletêd bindest û zêrandî, li kîjan qulbê dinyayê da jî ewana bivin.

Cegerxwîn bi şîêrêd xwe va piştovanê heqîyê ye, piştovanê azayê û merivhizî ye. Ew nikare dengê xwe bilind neke, neke gazî bona wan efata, wan wetenhiza, yêd ku rabûne şerkariyê li Afrîqayê, Asîayê, Amêrika Latîniyê

da, bona wan mileta yêd ku mîna miletê kurda bin nîrê neheqîyê da têne zêrandinê. Bona înternasionalîzm û merivhîzîya Cegerxwîn miletêd dinyayê wê nivîsarêd şayîr bixûnîn, hij wana bikin û bîvîn piştovanê şerkarîya miletê kurda.

dewlemend e ziman û dîdemêd bedewatîyê nivîsarêd şayîr. Nava wan da bi awazêd reng-rengî fikirdarîya miletîyêye pîrurne dîhar dike. Tûne şîer, kîjanî em bixûnîn û meseleke cîmetê, aqîlbendîke kal-bava tê da nevînin. Kanîya zîmanê Cegerxwîn zîmanê miletê me ye, çavkanî, ku şêlû nebûye, ava wî zelal e û dilê kesirî hêsa dike.

Nivîsarê şayîr bona zanîyara û kurdnasa wê bîvîn esasê çendîk çend lêkolandinê ulmî. Xebata ulmîye pêşîn ser "Poêzîya Cegerxwîne bajarvanîye" sala 1966 a li Yêrêvanê ji alîyê înstîtûta rohilatnasîyê ya Akadêmîya Ulmuyê Ermenîstanê hatîye çapkirinê. Xudanê vê lêkolandinê Ordîxanê Celîl pertûka xwe da usa jî çil û du şîerêd şayîre hîlbijare neşir kirîye. Herdu cildêd Cegerxwîne pêşîn îdî zû va dest nediketîn. Bona ku şîerêd van herdu dîwana bikevîn destê xwendevanê sovêtîyê, Ordîxanê Celîl ew şîer welgerandîye ser tîpê rûsî. Îro ewana bûne mil-

kê xwendevanê kurdê sovêtîyê.

Salekê şûn da hîlbestvanê meyî hizkîrî wê bive heyştê salî. Bon emrekî heyştê sal ne kême û ne pîr e. Ne kême e, çîmkî tebyeta "bîsaf" bîxwazî -nexwazî ya xwe dike, jî sehet qewat û taqata bende kême dike. Ne pîr e, çîmkî Cegerxwîn şayîr hê cahil e (genc e). Gava şîerêd wîye nû nivîsî dixunî, dîlkutana wîye alavî û hur, dibêhêyî. Ewî hê genc e, çîmkî efirandinêd wî da em dengê tofanê dibêhên, nerehetîya ruhê wî bona bext û yazî, armanca mîlet. Bêtaqetî, ofîn û axîna kaltîyê ne pêşê şayîrê meyî hizkîrî ye.

Ez bawer im, ku şayîr hê sal salêd direj wê em bi nivîsarêd xweye giranahava şake.

Ez li pîrozbayî bîmbarekîyê didime şayîr bona çap bûna dîwana wîye VI-a û guman im, ku ev dîwan jî mîna dîwanêd Cegerxwîne pêşîn li alîyê xwendevana bi hizkîrînê bê qebûlîrînê.

Ez jî hevalê "Roja Nû" ra divêjim serfînyaz bin, rûspî bîn, ku we xîzmata çap kirîna dîwanêd şayîrê meyî nav û deng hîldaye ser milê xwe, çîmkî bi wê yekê va hûn alîkarîya mezin didin pêşdaçûyîna lîteratûra cimeta me.

10.02.1982 Yêrêvan - Ji nexweşxanê



Ji pirtûka bi navê HÊVÎ - AŞÎTÎ

PÊŞGOTINA ORDÎXANÊ CELÎL

Pêncî salî zêdetir e, wekî navê Cegerxwîn ser zarê kurda ne. Pêncî salî zêdetir e, wekî Şêxmûsê kurê Hesên, Hesênê jî gundê Hesarê bûye Cegerxwîn, bûyê dengbêjê derd û kulê mîlet. Û vêga, çaxê dibe xebirdan derheqa edebîyata kurda, îlahî derheqa edebîyata kurdê Kurdistana şerkar, emnavê Cegerxwîn çawa şa-

wa şayîr timê rex nevê klasîkê me; Meleyê Cîzîrî, Ahmedê Xanî, Nalî, Pîremêrd, Goran, Ahmed Mûxtar Caf, Zîwar, Bêkes û yêd mayîn bi bîr tînin.

Kî ye Cegerxwîn, ser çî dinivîse, çî ye xwestina wî? Hergê em karibîn cahaba van pîrsa bi kurtî bidin, şîkilê Cegerxwîn çawa şa-

yîr wê rind bê ber çava. Navê Cigerxwîn esle Şêxmûs e, ew ji dîya xwe bûye sala 1903 li Kurdistanê Bakûr, li gundê Hesarê. Zarofî û xortaniya Şêxmûs di belengazîyê û hêsrîyê da bûye. Ewî di biçûkatîya xwe da bêbextîya dewlemenda, şêxa û pîra dîtîye, hizkirina wî ber bi xwendinê, her bi zanebûnê rêke fire û pir çetin danî pêşîya Şêxmûs.

Sala 1914, çaxê şerê cihanê yê yekem destpê bûî Şêxmûsê yanzdeh salî şîrinaya û lezeta emir nedîtî, mîna dê-bavê xwe, mîna bav û bapîrê xwe rîya rev û bezê, rîya hêsrîyê girt, tevî der û cînara çû gihîştê heta gundê Amûdê. Sal sala derbaz bûn, Şêxmûs xwedîna xwe mellefîyê stand û bû mele. Bi gotina Celadet Bedîrxan Şêxmûs bû pêşnimêjê gundîya, mehra wan dibirî, zeketa wan dixiste rêzika şerîyatê û bi vî teherî eûra xwe dikir.

Mellefîya Şêxmûs dirêj nekişand, Ewî zûtîrekî terka mellefîyê dadest bi cotkarîyê kir.

Şêxmûs hê cahil bû. Lê wê cahilîya xwe da ewî gele çetînayî dîtîbûn, gund û bajarê Kurdistanê Turîyê, Îranê, Îragê gerîyabû. Kurdistanê kurda, Kurdistanê perçe-perçe ber çavê ewe dîtîbû. Dêrde mîlet, dêrde walêt dil-hinavê şayîr sotîbû. Wê hênê hineka zani-bû, wekî navê Şêxmûs diha Şêxmûs nîn e, wekî ji derde Kurdistanê, ji dêrde kurdê bindest ewî navê xwe kirîye Cigerxwîn û bûye dengbêjê azaya welêt.

Cigerxwîn biryar da xwe, heta sax e li rû dinê xizmeta mîletê xweyî zêrîyayî bike, xizmeta azaya û ne bindestîya wê bike. Dîtinîya ko ewî dîtîbû dilê wî kiribû kûra egir.

Têma Kurdistanê, têma watanê kurda po-êzîya Cigerxwîn da têmeke sereke ye. Cigerxwîn Kurdistan rind nasdike, ew gerîyaye deşt û banîyêd wê, şabûye bi çem û kanîyêd welêt. Ewî dîtîye, wekî Kurdistan çewa ci-çewa toprax heye, lê Kurdistanê Kurdistanê Kurda e, kurda li wir ne xweyê hebûna xwe ye, ne xweyê xweyîya xwe ye, welat li ser navê kurda e, lê kurda tê da bêcî ne. Bi gotina Cigerxwîn "Kurdistanê sertaca Silhedîne kurda e", enîya wê roje" di birca asmanî", herdu birûyê wê mîna kevanê Rostemî Zal in, herdu zulfêd wê tîrê qehremanî ne, wê agirê Zerdest û Mezdek e, heru çavê wê mîna herd

darê Hurmuzê ne, herdû lêvê wê mîna kitêbê Hecî Qadîr in, zîmanê wê mîna bendeke ef-randinêd Ahmedê Xanî ye çena wê – çîyayê Cûdê ye. Bona şayîr Kurdistan – ew bûk e, bûkreke rû bi xêlî ye, bona wê bûka delez xort;

*Ji Loran ta bi Zazan tev bi xencer
Dihatin hev li meydanê beranî.*

Cigerxwîn helbesta "Şam şekir e, welat şîrintir etin nedîtîye, wekî Cizîr, Şehrezor, Gor, Loran tev qîzê wê ne, cahil in û ser xwe ne "...pir şepal in, ber zewac in" û bira xortêd kurda destê xwe ji bedewa bernedîn, bira bi dilê xwe wana ji xwe ra bixwezîn, qelenê wan jî "yekî û xwîn û xwendega ye."

Cigerxwîn nedîtîye, wekî Cizîr, Şehrezor, Gor, Loran tev qîzê wê ne, cahil in û ser xwe ne "...pir şepal in, ber zewac in" û bira xortêd kurda destê xwe ji bedewa bernedîn, bira bi dilê xwe wana ji xwe ra bixwezîn, qelenê wan jî "yekî û xwîn û xwendega ye."

Cigerxwîn bona azaya Kurdistanê, bona serxwebûna Kurdistanê pîrsa xwendinê û şorîşgirîyê pêşda dîkşîne. Kurdistan nikare aza-be hergê xort û qîzêd wê ne xwendevan bin Kurdistan nikare serbest be hergê xort û qîza da, nava mîlet da yekbûn tunebe.

Şayîr xort bû, kol i Kurdistanê Turkîyê sala 1925 dest bi şorîşa mîletîyê – azadarîyê bû. Serkarî li wê şerkarîyê Şêx Seyîd dikir. Rast e şorîşa kurda ji alîyê neyarê mîlet bi destê zorê şikest, lê ewê şopeke pir giran û nebîrkir bîr û bawerîya Cigerxwînha hişt. Cigerxwînber çavê xwe dît, çawa bêbextîya kedxurê kurda: axa û bega nehişt wekî şorîşa Şêx Seyîd serkeve, bigihîje meremê xwe. Ewî didît wekî kirinêd neyara ruhê kurdayê şorîşgirîyê teksîr nekir, qewata zend û bendê wê neşkênand.

Berî medresa xwe temam bike Cigerxwîn çûbû Kurdistanê Îranê û Îraqê. Wê rêwîtiya xwe da ewî nek tenê mîranîya û mîrwasîya mîlet dîtîbû, lê usa jî bêtifaqîya serokê eşîrê kurda dîtîbû, yê ko neyarî di kirine nava mîlet û ziyaneke pir giran digîhandîn yekbûna wî.

Cigerxwîn çewa dengbêjê derd û kulê ci-

metê, çewa şayîrê wêyî şorişgir borcê xwe hesab kir derheqa şerê kurda da millet ra gilî bike û şiroveke. Nêta wî ew bû, wekî bona rast têgihîştina net û meremê şerkarîya îroyîn pêwîst e ko millet rind zanibe mêjûyî şerkarîya xwa ye qurna himberî dijminê der û hundur.

22 Çirîya Paşîn sala 1946 bajarê Mahabadê civata Kurdistanê Îranêye milletîyê cara pêşîn derheqa çêbûna Cûmhuryeta Kurdistanê Îranê ya Demokratîyê elam kir. Şorişa Kurdistanê Îranê gihişte meremê xwe. Lê jîyana ko milletê kurd teze destpêkiribû xweşî hukumeta Îranê ya paşverû nehat û wana Cûmhuryeta Mahabadê bi destê zorê hilanî. Vê kirina nepak da alîkarîke pir mezin dane Îranê împêryalistêd Anglîyayê û Amêrikayê. 31 Adarê sala 1947 li bajarê Mahabadê hukumeta Îranê ya paşverû bi serekvanîya genaralê amêrikî Şvârskopf, hersê serokê Kurdistanê Îranê ya Dêmoqratiyê; Mihemed Qazî, Scîd Qazî û Sêyîfî Qazî darê daraxacê xistin. Pey vê qewimandinê Cigerxwîn helbesteke xwe pêşkêşî bîranîna serokê şorişa Kurdistanê Îranê, Qazî Mihemed kir,

*"Xakî Kurîdistan bi qurban, pir ciwan û paqijî,
Xwîn rijandin pir kurên te w ali her alî rijî.
Miletê kurd ta ko sax e ew ji vê rê nagerî,
Afarî, afarî,
Qadî Mihemed afarî."*

Wexta Kurîdistanê Îranê da bona azayê û ne bindestîyê xûn dihetê rêtin, li Kurdistanê Îraqê da milletê kurd bi serkarîya Mistefa Barzanî rabêbê şerkarîya azaya xwe. Hukumeta Îraqê bi serekvanîya Nurfî Seyîdê xûn-xur mîna hukumeta Îranê top û tank şande miqabilî kurda, ewî jî mîna hukumeta Kavam Ês-Saltanê her dera dera daraxacê danî û lawêd kurda darda kir. 11 Mêha Hezîranê sala 1947 li bajarê Bexdayê bi destî hukumeta Nurfî Seyîd, çar lawê kurda: Mistefa Xoşnav, Izêt Ebdûl Ezîz, Xêyrûlla Ebdûl Kerîm û Mehmed Mahmûd, yê ko serê xwe danibûn boy oxira Kurdistanê, hatine kuştin. Cigerxwîn dîsa denê xwe bilind kir, ewî helbesta "Gernasê Mameş Xoşnav nav xoş" nivîsî û pêşkêşî şehîd Xoşnav kir.

Salên şerê cinanê yê duda Cigerxwîn ser şehîd û şerkarê kurda poêmek bi sernivîsa "Şehnama Şehidan" nivîsî. Bona nêta vê helbestê bigihîje her xwendevanekî, her cotkarekî, şayîr poêma xqe diha bi sivikî û diha bi zimanekî zelal nivîsî. Ewî nava 196 xeta da navê 42 mêrxasê kurda hildide, yê ko jîyana xwe dane bona serxwebûna Kurdistanê. Xwendevan ber çavê xwe rengê Xalîtbeg, Kemal Fawzî, Usiv Ziya, Salih – Begê Hênê, Evdîlqadîrê şêx ji Nehrîyê û yêd mayîn dibînin. Cigerxwîn poêma xwe da van egît û pehlewana ra xeber dide û derheqa halê Kurdistanê bindest gilî dike.

Cigerxwîn çawa şayîrê edlayê, çewa şayîrê şerkarîya rojê hatî, bona pismamtiya û biratiya milletêd dinyalikê ji sînorê Kurdistanê dertê. Ew nefereke ji neferê mala wan şayîr û nivîskarê dinyalikê, yê ko temamiya emrê xwe, temamiya nê û feraseta xwe pêşkêşî pêşveçûna millet, pêşveçûna şuxulê aştiyê li dinyalikê kirîye.

Cigerxwîn emrê xwe da du şerê cîhanê dîtine. Ewî birçîbûn, hêsrîf, kuştin, rev û bez, gund û bajarê wêeran, zeviyê bêxwayî, zarê êtîm û gele ecebê giran ber çavê xwe dîtine. A bona çi şayîr helbesteke xwe da ko nav lêkirîye "Hûn çi zanin şer çi ye", dinivîse:

*"Pîj û ber dibarin fironek, top û tang,
Bi qîrîn, bi xumîn bûye şer, bûye ceng,
Kmişîn, hilweşîn xan û bircên belek,
Genî bûn, kurmî bûn, pir keleş, pir cendek,
Bi sîngo bi gulla didirin, dikuji.
Ser gever, çav beloq, dev jihev mêr û jin."*

Cigerxwîn şerê cînî rind zane. Ew divîne, wekî dinya mîna berê ne destê kedxuran e, ne destê miftexiran e. Ev divîne, wekî dinê da dewleteke mîna dewleta Sovyêtê pêşda hatîye, dewleteka pala û gundîya ko piştovanê hemû milletê feqîr û belengazan e. Helbestêd xwe da Cigerxwîn divîne û dinivîse, wekî dinê da hê qeyde û qanûnê împêryalizmê batmîş nebûne. Wekî dijminê xebatkara yê here pêşîn împêryalizm e. Awa bona çi Cigerxwîn helbesteke xwe, ko pêşkêşî aştiyê kirîye, nav lê danîye: *"Kî divê şer, kî divê selam?"*

Cigerxwîn emrê xwe da neyî xort e, lê xort e û xurt e bi şuxulê xwe va, bi qeweta

helbestê xwe va. Ew xort e, çimkî her dem xwe dide ber çetîna û bi qewata xortanîyê ew çetîna, ew tengasî alt dike. Cigerxwîn meşa emir, veguhastina wê tim û tim bal cahila, bal xort û qîza dibîne bi vîm eneyî şayîr xwe xort hesab dike.

Pey xilasîya şerê cînanê yê duda, sala 1951, bajarê Bêrlîna Rojhînat, Bêrlîna ko wextekê paytextê faşîstê Gêrman (Alman) bû, mihricana cahila û xwendekara yê sisîya çêbû. Wê mihricanê dilê Cigerxwîn da şabêneke pir mezin pêş da anî, çimkî paytexta dijminê merivayê bûbû merkeza mihricana cahila û xwendkarê dînyalikê, mihricana aşîyê li temamîya dînyalikê. Rastî jî, eva yeka qewimandîneke nebînayîbû û Cigerxwîn helbesteke xwe a nû pêşkêşî vê mihricanê kir:

*"Herin mihrican, mihricana xweş
Destê xwe bigrin ciwan û keleş,
Hindî û Çînî, Ereş û Hebeş,
Hemî bibin yek, îç gewr û çir eş,
Hey keçên ciwan, wey xortên ciwan,
Xêrxwazên cihan herin mihrican."*

Cigerxwîn ji xortên cihanê ra dibê, ca li Bêrlînê pirsyarkîn çika çî kar, çî xêr di şer da heye. Ew gazî xort û qîza dike li Bêrlînê, ko hemû lawê cihanê destê xwe bidîne destê hev, hevra "bêjin derd û kulên xwe", wekî bîkin yek hemî bîr û bawîrya dilên xwe, kar bîkin boy aşîya dinê. Helbesta Cigerxwîn "Em şer naxwazin, xortên dêmokrat, keçên dêmokrat" nek tenê dengê Cigerxwîn e bona azayê, nebindestîyê, pismamîyê û biratîyê, lê ew usa jî dengê şayîrê kurd e bona serbestîya mîletê bindest, yê ko bîn nîrê kolonyalîzmê dizêrin.

Pey şerê cihanê duda, çaxê devê birînê brîndara teze dihatne hev, çaxê agirê şer teze dîtîmirî. 27 Hazîranê sala 1950 eskerê Amêrîkayê tevî ekserî klîka Lî-Sîn-Man hucumî ser Qora Dêmoqratiyê kirin. Şerê Qoreyê gele dilê Cigerxwîn şewitan, şewata dil diha bêtir bû, çaxê şayîr pêhesîya, wekî hukumeta Turkiyayê nek tenê zîlamê tirk, lê usa jî xortê kurdê tûnsîz, teze simêl xûdayî şandîye deşta şerê Qoreyê. Helbeste *"Neçin şerê Qore"*, ew dengê Cigerxwîn e, ew qîrîniya wî ye zidî pilanê împêryalîstîyê yê ko dixwazin mîletê aza bikine bin qolê xwe.

Sala 1945 gelê Viêtnamî şerê azaya xwe dîkir, ko ji bindestî Fransayê aza be, lê kolonyalîstê Fransayê nedixwast dest ji Viêtnamê usa zû bîkşanda. Şerê Viêtnama mêrxas, eskerê wêye egît şerekî giran danîn. Navê kela Dîyan - Bîyan - Fû dinê bela bû. Ber wê kelê mêrxasê Viêtnamê derbeke birînê gîhandin eskerê Fransayê, yê ko ketibûne kela Dîyan-Bîyan- Fû û nedixwastin jê derên.

Pey şerê Dîyan-Bîyan-Fû Cigerxwîn helbesteke teze nivîsî ser vê kela nav û navdar, ser mêrxasê wê û zelal da kivşê wekî rêça bindestîya mileta, rêça kolonyalîzmê diçe digihîje dewletên Amêrîkayê Yekbûyî.

Qurna XX. qurneke nerehet e. Welatê sosyalistîyê boy aşîya dinê kar dîkin, welatên împêryalîstîyê tim û tim ha li vê kuncê dinê, ha li wî kuncê dinê dew û dora çêdîkin, piştovanîya hukumetê kevneperest dîkin. Bi me-na vê piştovanîyê gelê filistînêye mêrxas ji welatê xwe mihacîr bûye û ketîye dero dero. Dijminê gelê filistînêye egît şerê serxwebûna xwe dike, lê dijmin neyar e ew gundê filistîniya, malê wan dide êgir, dişewitîne, zarê wan dîkuje. Cigerxwîn çewa şayîrekî kurd, çewa şayîrekî pêşverû nikare çavê xwe bigre, denê xwe neke. Ew berî gişka dike qîrîn, dike hewar, helbeste dinivîse û şikyatê xwe dike ser vê hovîtiyê (*"Dêryasîn"*, *"Têlzater"*.)

Têma welêt, têma kurd û Kurdistanê, têma şorişê û serxwebûna gelê me, pîrsa xwendinê û pêşketinê, neyarîya û bêbextîya dijminê gel (dişminê der û hundur), pîrsa dostayî û biratîya hemû gelê cînar û têma înternasyonalîzmê Cigerxwîn her dem dike binyata helbestê xwe. Ev e mezinaya Cigerxwîn û bîr û bawîrya wî.

Xên ji helbestên watanperwarîyê û şorişgerîyê. Cigerxwîn şayîrekî lîrik e, şayîrê hub û hizkîrenê ye. Ew nemir e bona gelê xwe û ez bawar im, wekî wê ew roj bê, çaxê ko helbestên Cigerxwîn delal nek tenê kurdê aza wê bixwînin, lê usa jî xwendevanê dînyalikê wê bi tercîma zîmanê xwe ezberî bêjin û pê kêfxweş bin, çimkî binyata helbestên Cigerxwîn ew delalîya emir e, delalîya jiyîna mirov e.

Lênîngrad, Sibat 1983

Xudanê gotina "Ronahî pey tarîyê ye"

Têmurê Xelîl

Nava dîrokê da degme (kêm cara) diqewime, ku mirovek tenê roleke pir mezin bilîze nava bextê gelê xwe da. Cigerxwîn yek ji wan mirovan e. Ne hewce ye em îro dûr û dirêj derheqê wî da xebêrdin. Her tenê em bêjin, ku nava wan mirovan e. Ne hewce ye em îro dûr û dirêj derheqê wî da xebêrdin. Her tenê em bêjin, ku nava wan kurdên Kirdistanêye, ku bi zaravê kurmançî xeber didin, vê gavê helbestvanê herî mezin ew e.

Gava em helbesteke baş dixwînin, carna nizanin jî xwediyê wê helbestê sax e yan mirî ye. Eger ev helbest baş e, em jê lezetê dibînin û razîbûna xwe didine helbestvan. Em wî helbestvanê hîç nas jî nakin. Dêmek, helbestvan hebe jî, tunebe jî, helbesta wî heye û ew helbestê haqasî bijî, çiqasî ew baş hatiye nivîsarê. Bi serî wê helbestê em wî qîmet dikin. Û gava em pê dihesin, ku helbestvan sax e, em şadibin, çimkî xwediyê wan xeta wê dîsa helbestên baş binivîse. Lê ger helbestvan îdî tune; her kes hindava xwe da ber xwe dikeve, ku ser helbestên wî îdî yên nû wê zêde nebin.

Lê ger tu bi xwe wî helbestvanî nas dikî û zanî ew xet çawa xuliqîne, ku ewî çiqas xebat kiriye bona gel û pêşketina lîteratûrê, mirovêkî çiqas paqij, maqûl, comerd û înternasyonalîst, şîrhelal bûye, bona mirina wî dubare ber xwe dikeve. dibêjin ku qewm – pismam bona mirina mirovê xwe ber xwe dikevin, ku giva xelqê xerîb haqasî ber xwe nakeve, ku "xwîn nabe av." Lê na, kî çî dixwaze bira bêje, bona mirina Cigerxwîn ev gotina pêşiya jî bêtaqet e. Çawa dibêjin, "hetanî kevir-kuçik ji digiryan." Dêmek şîna wî bû şîne gel, lema jî gotine: "Serxweşî li gelê wî dikeve."

Belê, ser helbestên Cigerxwîn îdî ên nû wê zêde nebin. Lê çik u ewî pey xwe hiştiye, ew jî bes e, ku mirov her ro bixwîne û jê têr nebe. Mirov dikare ev herdo xetê wî bixwîne, demke dirêj ser bifikre û heyrî bimîne.

Ev ne dîn e, ev dîntî ye
Dîn serxwebûna millet e

Lê çiqas û çiqas xetêen wî yên yek ji yekê çêtir hene. Û çawa ku em demeke dirêj dikarî bona wê helbestê şabin, ew jî ewqas wext ser wan şabûye û bawer im ewqas we7de, hela zêde, ser wan fikirîye hetanî ewana xuliqîne.

Belê, serxweşî gelê wî dikeve, ji berk u ew ewledê gelê xweyî şîrhelal bû û hetanî dawiya jîyana xwe jî bona gel xebitî. Ew ji nexweşiya dilik çû. Û ew mirov jî dilik dimre, kubî qefesa wî da dilik heye. Dilkê wî nexweş bû û ewî zanibû, ku eger îro ban gel hinekî kêm bixebite, dibe hinekî derêj bijî. Zanibû, ku filan xebat dikare navbera sehetekê da jî bike, lê nava sê sehetê da dikir. Zanibû, ku kesekê bona wê yekê wî ra tiştê nebêje, lê ew ya xwe dikir, zanibû ku dibe tiştê pêra negihîne, ji vê dinê here û deqa kutasiyê ji xwe ra bêje... "çima ez filan rojê du sehetê kêm xebitîm."

Gava bersiva mirina Cigerxwîn mezin ji min re hat, ew bersiva nebixêriyê, bersiva reş dilê min hingavt û wek wê bersivê dilê min jî reş bû û çilmisî. Û min benêde awa nivîsî:

"Ew bû du sehet min qelem hildaye destê xwe, dixwazim gotina xweya serxweşiyê bi dilekî kovan û xemgîn binivîsim ser mesela mirina Cigerxwînê mezin, lê qelema min nage-re, destê min naçe, ku ez ser vê meselê we ra binivîsim. Vê demê ku ez ji we ra dinivîsim, li mala xwe da me, nava zarokan da. lê der-dorê min mirov tirê vala ye, xalî bûye, her tenê dengê Cigerxwîn di guhê min da ne. (Min sala 1982 a, li bajarê Lênîngradê hevpeyvîneke bi 75 deqe bi Cigerxwîn ra çêkir û niha guhdarî dikim.) Sûret û demê wî ber çavê min e (me ew wêne dema hevdîtina me tevayî kişand), nama wî ya bona mirina bavê min ser textê min yê nivîsarê ye, ewî bi destê xweyî nazik, bi destên helbestnivîs xebêrên serxweşiyê derheqê bavê min da aha nivîsibû."

Heval Xelîlê Çaçan Mûradov, stêrke geş û ronî bû, şevreşa me de ji ezmanê torevanî qu-rîjî û bi carek wînda bû; lê hîvdar im, ku tarîxa jîndariya heval Xelîl dîr û dirêj binivîsin û ji me ra bihêlin, ku tarîxa tore û torvanên Kurdistan di rojekê da fireh û payedar û bilind bibî. Ewê di nav dilê gelê Kurdistanê da

jîndar û payedar bimêenî. Bira serî te û bira-dostan xweşbe.

Haval û dilxwazê we Cigerxwîn, 1.2.1982

Cihan îro bona min teng bûye, bûye dojah. Mirina Cigerxwîn wek mirina bavê min ez hingavtim. Min jî wek hemû kurda navê wî bihîstûbû, helbest û nivîstên wî xwendibûn, ezber kiribûn, lê xwezil min bi çavan ew ne dîta, ku îro tengezar, reben û bêçare nemama. Hevdîtina me ez anîme ser wê bîr û bawerîyê ku bi rastî herî her tiştî ew mirovekî bi dilê mezin û fire bû, paşê hozanekî mezin û hiş-yarkirê gelê kurd bê.

Ez mirovekî biçûk im, ku Cigerxwîn qîmet bikim. Gelê me bi xwe ew qîmeta mezin daye wî. ez jî lawekî gelê kurd im. Lê tiştek diyar e, ku pey mirina hinek mirovan ra malek, an gundek sêwî û stûxar dibe, lê îro bi mirina Cigerxwîn welatek –Kurdistan û gelek- gelê kurda ziyar û zirarê ket.

Me gelekê dilê xwe da difikrî, ku emê hê gelek cara di şayî û şayînetê da rastî Cigerxwîn mezin bîn. Lê îro em şîna wî dikin. Belê emê ji bîmrîn, lê xwezî wî mîrî, ku wek wî bi-jî, bixebîte, ku miletek heyra wî da be, hewce-darî dengê wî. nûr-nedera wî û qelema wî adan be.

Sala 1982'an da, gava ez berpirsyarê pêl-weşa Yêrêvanêye kurdî bûm, min cara pêşîn gotareke pir mezin ser Cigerxwîn nivîsî, parçekî dengê wîyî li hevpeyvîna me xiste navê û di radyoyê da weşandinê. Parçek ji wê hev-peyvînê, ku Cigerxwîn gotiye, mirov dibêje qe bona roja îro gotiye. Ewî aha gotiye :

"Bi bawerîya min, jiyana wî mirovî, ku ji gelê xwe ra bi paqîjî, bi dilpakî xebitiye, bîm-re jî sax e, nemiriye, wê jîndar bimêenî, Tê bî-ra min, wextê Bêkes mîrîbû, bûrjûwazê kurdê Îraqê pere li ser tirba wî bela dîkin. Îcar ke-çekê rahişte perê wan û qetand, got: -Wextê Bêkes mîriye, ne mohtacê dînar û derhemê we ye, Bêkes niha dilê xort û mîra da, dilê keç û jina da cîkî bilind girtiye, îcar bizanîbin, ku ewê bimêenî û namirî.

Eger ez jî layîq bim, eger ez jî hêja bim weke Bêkes di dilê xort û keça da, jin û mîra da bimêenî, ez tim jîndar im, ez tim sax im. Ez bîmrîm jî ew hestî, goşt û çerm hemû herin, qîmeta wan tuneye, bira herin, lê ezê di dilê

miletê xwe da bimênim."

Payiz e. Zûtîrekê zivistanê ser kurda da bê. Û çawa zivistanê gelê Kirdistanê di hêla aborî da dikeve rewşeke teng û giran, niha jî we-ha ye. Lê vê carê ser rewşa aboriyê da rewşa kurdaya di hêla edebiyetê giran jî zêde bû. Gelê kurd sê lawên xweyî pir hêja wînda kirin – Cigerxwîn, Yilmaz Güney û Tofîq Wabî.- Em ber mezinaya wan û xebata wan temene dibin û serê xwe ditewînin.

Cigerxwîn ji nav meç û, ku heta-hetayê di nav me da bimîne. Wê bimîne bi zên û mera-mê xwe va, bi deng û reng, bîn û buxa hel-bestên xwe va. Ji xebata di kovara kurdiye de-lal "Hewar"ê girtî hetanî beşdarbûna di civîn mîtingen kurdî va, bi paqîjayî û bawermendi-ya xwe va.

Helbestên wî wê wek berê di nav gel da wek agir bela bibin, ûsa, çawa ku agir lodekê dikeve û pêşî lê nayê girtin, wek agirê Newro-zê ewanayê nava dilê gelê me da çiqas here pêl bidin û geş bibin.

Gelê kurda hîç cara bawerîya xwe ya bona rojên aza wînda nekiriye. Û çawa ku pey zi-vistanê ra bihar tê û çawa ku helbestvanê me-zin – Cigerxwîn dibêje, "pey şevê timê dibe ronahî", çiqasî jî şereş be, dîsa sibe safî di-be, ûsa jî gelê kurda wê ji bindestiyê aza be. Çawa dibêjin, dijmin wê nava xwîna xwe da bê xeniqandin, çawa ku mesela kurda dibêje, wê bextê bêbexta lê welgere. Vê yekê da wê rola Cigerxwîn jî hebe û helbestên wî wê go-tinên xwe bêjin, ji bere w helbest wê bibin çavkaniya bawerîya Kurdîstaneke aza.

Weşanên DENG



Weşanên DENG

Navnîşana Xwestinê:

Tarlabası Cad. No: 95/1 Beyoğlu/ İSTANBUL

TEL: 0.212 292 66 27 Faks: 0.212 292 66 35



BI KURTÎ JÎNA MIN

Sala hezar û nahsed û sê ez
 / hatim dinya yê,
 Bi navê siltan Şêhmûs ez çêbûme ji dayê

Heta bûm sezde salî li
 / gundê mey Hesarê,
 Jîna xwe min diborand paşê
 / ji me da rê.

(...)

Dîya min a belengaz pêncî salî dilovan,
 Salek piştî bavê min ew jî
 / li wî bû mêvan.

(...)

Xweşka min a xwendewar bê
 / însaf û bê wijdan,
 Ez reviyam hatim cem
 / wê jî ez kirme şivan.

(...)

Min dest bi kurdîyê kir peyda kirim
 / çend mirîd,
 Bi xweşxwan û reşbelek xesma
 / piştî Şex Seîd.

(...)

Berî sala rehmetî bi çar salan dilbirîn,
 Di şî' rê de navê xwe min datanî
 / CEGERXWÎN.

(...)

Ev cihana xapînok heta me jê
 / xwe nas kir,
 Çi b' kim fêde ne maye
 / emrê xwe min xelas kir.

Çima rastî dibêjim li nav dîna
 / bûme dîn,
 Heta bimrim ji nû ve xelk ê bêjin
 / CEGERXWÎN

Dîwana Yekan-1945